أزمة المثقف المعاصر هي أنه يراوح مكانه ضمن ثالوث السلطة والأيديولوجيا والمصالح، كما أن الوظائف التقليدية للمثقف لم تبرز بالشكل المطلوب في التحولات التي تجري في المنطقة.






فعاليات ثقافية متنوعة في شمال وشرق سوريا

على المثقف اليوم، أن يعيد مراجعة نظرياته وأفكاره، وبناء تصوراته، وتكييف أساليبه، وتجديد خطابه، ويعيد النظر في مفهوم المثقف ورسالته، ليتمكن من المساهمة بفاعلية في إنشاء نظام ديمقراطي. وإعادة الروح إلى علاقة المثقف بالجماهير، كي يمارس وظيفته الأدبية والأخلاقية، وتجديد شرعية المثقف بحفاظه على استقلاليته، وتحلّيه بالنزاهة وبالضمير والأخلاق.

الخاتمة

وباء الإرهاب المنتشر اليوم في العالم وفي الشرق الأوسط بشكل خاص جزء من منابعه الرئيسة يكمن في الفراغ الثقافي في المجتمعات واستطاعت بعض التنظيمات المتطرفة ملئ هذا الفراغ لصالحها، وهذا الفراغ لا يقل تأثيره عن تأثير السياسات الفاشلة التي لم تستطيع استيعاب جميع مكونات المجتمع، ولم تنجح في حل مشاكلهم الأساسية.

إن الوقائع، ومجريات الأحداث، تقتضي منا الاعتماد على قوة لا تعزز سياساتنا وتوجهاتنا الخارجية فقط، إنما تعزز مكانتنا الداخلية بين مكونات المجتمع عامة من خلال تعزيز ثقة مواطنينا بأنفسهم وبتوجههم السياسي وبمستقبلهم وشكل الإدارة المتبعة. لذلك نحتاج إلى تطوير قدراتنا الناعمة، خاصة وأن منطقتنا تواجه تحديات خطيرة، وتمر بتغيرات حقيقية، وتواجه عملية إعادة التشكيل في مختلف النواحي السياسية والاقتصادية والاجتماعية–الثقافية وإزاء هذا الوضع الحرج بات من الضروري إعادة النظر في الاستراتيجيات والسياسات القديمة التي أثبتت فشلها، على أن يكون هناك استعداد لتبني استراتيجيات وسياسات جديدة تنسجم مع حاجة الشعوب والمكونات وحجم التحديات التي تواجهها، وسيكون الجمع بين قوة صلبة ناضجة، وقوة ناعمة جاذبة احد الخيارات الصحيحة لرسم معالم الطريق نحو مستقبل أفضل لجميع مكونات وشعوب المنطقة.

قـرية بينيـه (BÊNÊ)

شريف محمد– وليد رمزي بكر



تتبع قرية بينيه إدارياً لناحية شيراوا التابعة لمقاطعة عفرين، حيث تقع على مسافة ١٨ كم شرق بلدة الباسوطة و٢٧ كم جنوب شرقي مدينة عفرين، كما أنها تبعد ٤ كم عن بلدة دير جمال التابعة لمقاطعة شهبا و٣٥ كم تقع شمال مدينة حلب. واسم قرية بينيه باللغة الكردية تعني (الهواء المنعش) لأنها تقع مقابل فتحة (بيلان) الجبلية.

قرية بينيه هي إحدى قرى الروباريين والذي هو اسم لعشيرة سكنت منذ زمنٍ قديم هذه المنطقة، فهناك سبع قرى للروباريين في تلك المنطقة، وهي: «بينيه وباصلحيا وجلبر وعقيبة والزيارة وخربة وكشتعار».

يبلغ ارتفاع قرية بينيه عن سطح البحر ١٣٠٠ متراً، حيث تتميز تلك القرية بهوائها الكثير لوقوعها كما أسلفنا قبالة فتحة بيلان التي تقع في أراضي شمال كردستان، هذا يجعل الجو لطيفاً في الصيف وبارداً في الشتاء.

وقد انتشرت عوائل قرية بينيه في أربع قرى في كل من كوكان السفلى وعبيدان وموسانكه وكورزيله. ففي عهد الأيوبيين كان هناك شخص من الروباريين يسمى «شريف» كان يحكم قلعة الباسوطة، وقبل حوالي ٢٥٠ عاماً حدثت معركة بين الروباريين والعثمانيين بقيادة عيسى آغا أحد وجهاء الروباريين وذلك بسبب مطالبتهم بالاستقلال الذاتي عن الدولة العثمانية، حيث تعرضت القرية لحصار خانق فرضه العثمانيون مما أدى إلى هروب الكثيرين من أهالي القرية واعتقال العديد منهم.

تعتبر قرية بينيه قرية قديمة، وكباقي قرى شيراوا تحتوي على الكثير من الأوابد الأثرية، حيث تحوي عدة أبراج قديمة وقلعة أي قصراً أثرياً قديماً ما تزال بعض الآثار شاهدة عليه والتي يعرف باسم (حساري) ويوجد بجانبه نبع ماء صغير.

تتألف القرية من إحدى عشر عائلة، وهي: عائلة كوتا وجعفر ورشا وموساج وروباري وبركات وكورخليل وكمكشي وكبلانا وميرزو وأخيراً عائلة نجار، حيث تنحدر معظم العوائل من الروباريين.

أما من الناحية الجغرافية، في شمال القرية تقع قرية التنب وفي الشمال الشرقي تقع قرية كشتعار وفي الشرق يقع سهل كفر هلي وفي الجنوب الشرقي تقع بلدة دير الجمال وفي الجنوب تقع قريتي الخربة والزيارة وفي الجنوب الغربي تقع قرية عقيبة وأخيراً في الشمال

الغربي تقع قرية جلبر.

توجد ثلاثة مزارات دينية في القرية: مزار الشيخ بركات ومزار الشيخ محمد ومزار الشيخ سعيد.

يعمل معظم سكان القرية بالزراعة من زراعة الحبوب بما فيها القمح والشعير والعدس وكذلك زراعة بساتين الخضار بأنواعها، وكباقي قرى شيراوا هناك قلة في أشجار الزيتون مقارنة مع النواحي الأخرى في مقاطعة عفرين.

وهناك عدد كبير من أهالي القرية موظفون لدى دوائر الدولة، ونسبة المثقفين والدارسين عالية جداً، فيوجد حوالي ٣٠٠ شخصاً من الحاصلين على الشهادات الجامعية بمختلف اختصاصاتها، ومنهم ١٠ أشخاص حصلوا على الشهادات العليا من ماجستير ودكتوراه.

وتسبب قرب القرية من مدينة حلب بهجرة العديد من أهالي القرية إليها والتي بدأت منذ عام ١٩٧٠، واستقروا هناك والعمل كموظفين مدنيين في الدوائر المختلفة، ولكن بعد الحرب الأهلية السورية عاد معظمهم إلى القرية.

هناك البعض من أهالي القرية يعملون في مدينة عفرين في الأعمال الحرفية المختلفة وفي التجارة. ويعمل الآن أكثر من ٥٠ شخصاً من الرجال والنساء في الدوائر والهيئات التابعة للإدارة الذاتية الديمقراطية في مدينة عفرين وباسوطة. وتم إحداث أوّل مدرسة في القرية عام ١٩٤٩.

يوجد سبعة شهداء من القرية ضحوا بدمائهم في سبيل الحرية والكرامة للشعب الكردي، وهم: الشهيد زكي وبيدار وأحمد وشير جوان وعكيد وجلال وعمر حسن الذي كان عضواً في حركة الثقافة والفن.

وسمي كومين القرية باسم الشهيد بيدار، بينما سمي كومين المرأة باسم الشهيدة زنارين. ويوجد في القرية العديد من الشخصيات المشهورة، من بينهم:

. زكريا بكرو، وهو أحد وجهاء القرية حيث عمل على تقديم العديد من الخدمات لقريته من خلال المساهمة في تعبيد الطرقات وإحداث المدرسة وإيصال شبكة المياه.

. عزيز كدرو، وهوفنان تشكيليّ قدير، اشتهر عالمياً من خلال المعارض الفنية التي أقامها في العديد من دول العالم.

. الشيخ رشيد كدرو، الذي يعتبر أحد علماء الدين الإسلامي.

. الكاتب رشيد كدرو، عمل مدرّساً جامعياً في برلين بألمانيا، وكان قد ألّف كتاباً عن الكرد لكن لم يُطبع بسبب وفاته.

. سعيد سعدو، حاصل على شهادة الدكتوراه في الفيزياء، يعيش الآن في ألمانيا.

. عبد الحميد غباري، ضابط برتبة رفيعة (عميد ركن) في الجيش السوري، وبعد تقاعده أصبح عضواً في مجلس الشعب السوري بين أعوام (١٩٨٨ – ٢٠٠٢).

. الحقوقي محمد عزت غباري، من أوائل الكرد في مقاطعة عفرين الذين حصلوا على الإجازة في الحقوق، عمل ضابطاً رفيع المستوى وقائداً للشرطة في عدة محافظات سورية، ولكن بسبب كرديته مورست عليه ضغوطات أدت إلى نقله إلى السجل المدني في محافظة الحسكة، حيث كان شاهداً حيّاً على مشروع الحزام العربي العنصري الذي طبق في منطقة الجزيرة.

ومن المغنيين الشعبيين الذين كانت لهم مشاركات في إحياء الحفلات وحفظ الأغاني التراثية كل من: حاج ناصيف وعبد حسو كلتوو، وصالح أوسنو.

تعرضت قرى الغباريين في ناحية شيراوا لهجمات مجموعات المرتزقة الذين كانوا يسيطرون على القرى المجاورة لهم في أعوام ٢٠١٣ و٢٠١٤. ففي ٢٠١٤/١٠/١٧ قامت مجموعات المرتزقة التابعة للجيش الحر بهجوم عنيف على القرية، فاضطرت النساء والأطفال الخروج من القرية بينما بقي الرجال والشباب حاملين السلاح وتصدوا لتلك القوات المهاجمة، حيث استمرت المقاومة ٢٤ ساعة تراجعت على أثرها القوات المهاجمة واستطاع المقاومون وبمساندة قوات الـ YPG والـ YPJ من تحرير القرية ودحر الغزاة، وبذلك سطروا صفحة جديدة بفخر واعتزاز في صفحات التاريخ.

عندما أصبحتُ سلطاناً



آرتيش الحسيني

لِقَاعِدَ الحُكْمِ سلطانها ومَمَاتِئُها، والحاكم إنما يخلّدُ بِمَحَاسِنِهِ ويكتبُ اسمه بحروفٍ من ذهبٍ في صفحات التاريخ.

ذات يوم راق خيالي؛ رأيت نفسيَ الحاكم المُتَصَرِّفَ في هذه المدينة طليق اليد؛ حيث كل الإدارة ما أعلمها وما لا أعلمها تَمُرُّ تحت إمضاءِ قلمي وَخَتْمِ حاكميّتي.

حقيقة للوهلة الأولى استمرأت الأمر كثيراً؛ حين تراءت لي صورة مقعدي الدوار وهالة الرهبة التي ستحيط بي، وفي طريقي للجلوس عليه ورغم قصر المسافة التي بيني وبينه أصبحَتِ الأخلاق والأطماع تتناطح في حرب شديدة وخاطفة لِعَظيمِ التناقض بينهما.

لا أخفيكم سراً أن الفوز في المعركة كان يميل في غالبيته نحو الطمع، وكان ما يؤازره في ذلك الفوز تلك الأموال المكدسة الكثيرة التي كانت تتراءى له في الخزائن المتراصفة، وفيما هذه المعركة ما تزال دائرة وقائمة على أشدِّها تسللتُ من بينهما وتمكنت من الوصول إلى المقعد الدوَّار فجلستُ عليه حيث رهبة السلطة وسلطانها والقول النافذ، والأمر، والنهي، وتحقيق العدالة، والبطش، والسطو، وغير ذلك من منافذ السلطة وأذرعها.

أمضيت بضعة أيام للفَصْلِ في الصراع القائم بين الأخلاق والأطماع؛ أقولها بصدقٍ إنَّ العبْءَ كان ثقيلاً على كاهلي والحياة كانت رتيبة ومضجرة بعض الأحيان بالنسبة لي.

وعلى غفلة مني دخل علي شخصٌ فسألني أوَّل ما سأل: عَلامَ تبدو مهموماً شاحب اللون أصفره. اطمأنت نفسيَ له كثيراً فدعوتُه إلى الجلوسِ بجانبي وصارحته ما يدور في خلدي فشهق شهقة عميقة أدركت منها أنه عارف بأمور الخلق وما يدور في المدينة؛ فطلبتُ منه الحديثَ عنها بأفراحِها وأتراحِها.

فقال: أمَّا الأفراح فلأهلها وهم قلائلُ،

www.arsiyakurdi.org

وأمَّا الأتراح والمآسي والكآبة ففيهمُ أقوال وأحاديث وحكايات يا (سيدي السلطان).

مددتُ يدي إلى ربطةِ عنقي واستقمتُ في جلوسي عندما سمعتُ منه قول (سيدي السلطان)، وأخذ الرجلُ يُعَنّنُ ويُبوّبُ حديثه فيقولُ: أمَّا بابُ الغِشّ ففيه فصول، وأما باب الفساد والاختلاس فمدعاة للعجب العجاب والذهول، وأما باب الالتفاف على القوانين، والرّشى، والمحسوبيات، والعملاء، والمندسين والمتسلقين فهم كالنهر الفائض الذي يلعق جدران البيوت المَبنيَّة على ضفتيه ويستدعي أن تقرع له الطبول قبل أن تبدأ شمس المدينة بالأفول...

حتى انتهى إلى باب المآسي، وبدأ من نفسه فقال: أنا شخصٌ من هؤلاءِ الأشخاصِ وقد كان لي بيت يأويني وأُسرةٌ أتدثر بها عندما تتكالب عليَّ مُزعِجاتُ الليالي قبل أن تقع الفاجعة عليَّ وتنتهي المسرَّات من قلبي وتزوُلَ إلى الأبد، وأصبَحَتِ الكآبة ترافقني كظلي، وأحتضنها في حلّي وترحالي، وفي مثلِ حالتي الكثير من القصص والروايات التي تُدمِي القلوب؛ فرأيتُ من الواجب أن أُبدِيَ لك النصيحة وأجهَدَ في ذلك لِئلاّ تكون على هامش التاريخ أو من المَنسيّينَ؛ فالحاكم إنما يُخلّدُ بِمَحَاسِنِهِ ويُكتَبُ اسمه بحروفٍ من ذهبٍ في صفحات التاريخ.

فقلتُ: فِيْمَ مأساتُك إذن؟؟

قال: أنا أعلم أن لِمَقَاعِدَ الحُكْمِ سلطانها ومَفَاتِنُها وغرورها وقد كانت مأساتي ـ وأنا القليل الحيلة والتدبر ـ مع مُتصَرّفٍ صغيرٍ في مدينتكم؛ بيده الأمرُ والنهيُ وهو أقل منك شأناً وأدنى درجةً، ولذلك تبتَّلتُ لهذا الأمر لعلّني أستطيع منع ذلك مع أسَرٍ أخرى تحت وارف ظلال حُكمِكُم الذي آملَ فيه أن تتغلب الأخلاق على الأطماع؛ فلا تتعجب إذا قلتُ لك كُنْ حاكماً صَنَعَهُ الشعب، ولا تَكُنْ حاكماً صَنَعَتْهُ الأطماع حتى لا تنحَازَ إليها على حساب الشعب؛ فالطُّغاةُ تُتَعتِعُهم سَكَرُ الكرسي وتُثمِلهُم سُلافَةُ النفُوذِ فإمّا أن يَحرِقُوا أنفُسَهُم فيكونوا بِتَفَاهَةِ البَعُوضَةِ، وإمَّا يدمرون بُلدانهم فيكونون بقذارة الذُّبابةِ وتِيْهِ الخُلْدِ، وأنا إذْ كنت من الوافدين إلى مدينتكم لِمَا سمعنا عنها من استتباب الأمن والأمان ورَغَدِ العيشِ هرباً من ظُلمٍ حاقَ بنا فتجشمنا وَعثاءَ السَّفر وأهوال الطريق وأمضينا الليالي متسللين متسربين من بين الأشجار راكضين في الصحراء حُفاةَ الأقدامِ عطشى وجياعَ تاركينَ وراءنا ما عزَّ وطاب؛ نلتمس في بلادكم العيش من كدِّ أيدينا، وحين حطّت بي أقدامي في هذه الديار مع جمعٍ غفير من بني قومي؛ تَزَاحَمْنا على استكراء البيوت لتدرأنا من قرّ الشتاء وقيظ الصيف؛ فرأينا من الجَشَعِ في ذلك ما يشيب له القَذالُ وكلٌ مُطلَقُ اليَدِ فيما يَضعُ من الإيجار دون رادع من القوانين والمُحاسَبَةِ، ومررنا بفنون الاختلاس مما شابه ذلك، وعلى الرَّغم من هذا كله طوَينا ذكريات الفرار من مدينتنا في مطاوي النسيان وكل من هذه الجماعة ذهب إلى حيث حطت به الأقدار في مدينتكم وانقطعت عنيَ أخبارهم!! أما أنا فأمضيتُ وقتاً طويلاً بين الأحياء والأزِقَّةِ في رحلةِ بحثٍ طويلةٍ عن دارٍ تأويني حتى استدللت بأطراف مدينتكم على دارٍ وطيئةٍ أشبهَ بكوخِ دجاجٍ فاستكريتها، ونالني من أهل المعروف (وهم نُدُرٌ إلى أبعد الحدود) ما نالني من كِساءٍ وقُوْتٍ أنقذني من هلاك محتَّمٍ، وبعد أن استقر بيَ المُقامُ يا (سيدي السلطان) كان لا بد لي من السعي وراء عَمَلٍ لِأقتات منه وأسدَّ به جوع أهل بيتي.

فتَّشتُ كثيراً وطرَقْتُ الأبواب كثيراً وتعرفتُ على الأرصفة وعَلِمتُ أماكن الوَهْدَاتِ في الطرق إلى أن أتى عليّ حين مِّن الدهر فاهتديت إلى حانوتٍ كبيرٍ، وبعد أخذٍ وردٍّ تملكتني الشجاعة وسألتُ أحد الرّجال المتحلقين بمائدةٍ مستديرةٍ على باب حانوتٍ كبيرٍ، وفي أيديهم ورقٌ ملونٌ ودفاترَ وفواتير منها ممهورة ومنها بيضاءَ ناصِعةَ البياضِ فرفع أحد الجالسين بَصَرَهُ على مضضٍ؛ فشذَّرت قولي وأعَدتُ على مسامعه السؤال ـ هل أَجِدُ عندكم عملاً لي؟؟ـ

ولعلَّ هذا اليوم كان يوم سَعدي حين رأف بحالي وقال: نعم ستكون أجيراً لدينا في هذا المركز (وكان المركز أو الحانوت الواسع مخصصاً لبيع أسطوانات الغاز)، لم تسعني الدنيا من الفرحة حين قَبِلني عاملاً لديه، وأحسست بأن كرامتي ارتدت إليَّ فجرى الاتفاق بيننا لبدْءِ العمل في الغد، فاستعجلتُ الخُطى وطويتُ المسافات فوصلتُ إلى البيت وكانت امرأتي تترقب قدومي فبشَّرتُها فتوهَّجتْ أساريرها فرحاً.

في تلك الليلة كان الزمن يسير ببطء شديد، انتظرت كثيراً ثورة فوران إبريق الشاي لتنضج من فوق الأثافي التي كانت تنوب عن موقدنا الغازي، تقلبت ذات اليمين وذات الشمال كثيراً حتى اشرأبت الشمس بأشعتها الذهبية وغطت السماء، أسرعتُ الخُطى، بدأتُ العمل وأنا مغمور بنشوة كبيرة، مَضَتِ الأيام والأسابيع سريعة اقتحمت أسرار العمل وما يدور على هذه القطعة من الأرضِ.

كانوا أربعة شركاء وكل منهم متصرف على سجيته يبدون للرائي إليهم في ظاهرهم أنهم متحدون ملتئمون إلا أنهم عند الغوص في أغوارهم تجدهم مجزَّئين متناحرين لا يهتدون على رأي صائب فيما بينهم، لم يجتمعوا يوماً على تلك الطاولة المستديرة ليتفقوا على طريقة تُعالَجُ بها شكاوي القوم وما كانوا يعانونه أو يحققون أمانيهم ـ من مثل الاختلالات التي كانت تصيب صمام أسطوانات الغاز ـ.

في أحيان كثيرة كانوا يقتربون من تلافي هذه المشكلة العصِيَّة فيما بينهم؛ إلّا أن الشريك الذي كان يملك أكثر الأسهم يبادر إلى النقض في اليوم التالي، ويستمرُّ في إفراغ الأسطوانة من كميَّةٍ من محتواها الأساسي، ويتنصل من مسؤولية الخلل في الصَمَّامِ؛ فكان الأمر الذي يصيبني بالذهول والحيرة هو ما ينطوي عليه هذا السؤال الذي يتبادر إلى الذهن عنوة من غير استئذان.

أَلَا يُفكر هذا في ما يمكن أن تصيب أيَّة أُسرة جَرَّاءَ هذا الخلل وعدم إصلاحه ولربما كانت أُسرته من بين هذه الأسر؟؟.

لَعِبَ المالُ والطَمَعُ دورهما واستمر الأمر على هذه الشاكلة ودامت هذه المناكفة.

في أحد الأيام قُيِّض لي أن حُظيتُ بإحدى هذه الأسطوانات فسُررتُ بها كثيراً رغم معرفتي السابقة بأخطارها، لكنني ـ وكما يقولون إن الفرحة العظيمةَ تُذهِبُ الألباب ـ لم أَحْتَكِمْ إلى العقل أو لعلني لم أكن مرغماً لأكون خبيراً في هذه الأعطال والاختلالات فهذه من مسؤولياتهم وعلى عاتقهم تقع ترشيدي إلى الاستخدام السليم، وبعد أن استكملت إجراءات تركيب الأسطوانة وانتهيت منها؛ عمدتُ إلى فتح صمامتها لنُشنِّف آذاننا بصوت النار الهادئ الوديع المنبعث من طبَّاخ البيت (بابور الغاز) بعيداً عن سُخَامِ الأسمال التي كنا نستخدمها في طهي الطعام.

خيَّم علينا الليل ونحن فرحون بالضيف الجديد ولم نكن نعلم أنه سيغدر بنا حين تسرَّب الغاز من جوانبه وفوهته، وامتلأ البيت به وبدا كقنبلة موقوتةٍ مهيأة للانفجار في أية لحظة وما إن أومضت الشرارة من الولّاعة (القدَّاحة) في يد ابنتي التي كانت كزهرةٍ جَنيَّةٍ حتى التهمت النيران الدار بمن فيها يا (سيدي السلطان).

حين سمعت كلمة السلطان؛ انتبهت من شرودي واستيقظت من غفوتي والتفتُ يميناً وشمالاً ولكن الرجل اختفى دون عودة، واستطاعت الأخلاق أن تتغلب على الأطماع فأصدرت الفرمانات المشدَّدة التي تقضي على الفساد ليعيش الشعب في بُلهنيةٍ ورخاءٍ وأتربع عرش التاريخ.



Biharîn Sîno - بهارين سينو

www.sersivakurdi.org



جوان عطو - Ciwan Atto

www.arsivakurdi.org



Nadîya Hesen - ناديا حسن

www.arsivakurdi.org



Dilo Heso – دلو حسو

Her tişt tê ragirtin, her zorî û nexweşî tê jibîrkirin, lê bêbextî û xinizî nayên daqurtandin..
Ya pitir zora min dibe, ku hêza tolhilanînê têra min neke, destê min negihe bêbextan û talan bimîne revandî..
Guvişk têne min. Kînek min digre, yek min berdide. Çawe biteqim û çi şape û lehiyê rakim!! Çawe vê tevna pîrhevokan biqetînim û henasekî zelal bikişînim..
Kutkuta dilê min, berê min dide vî alî, wî alî, dîsa bi tinê me Dîsa ez û bêdengiya şevê, ez û jana giran, ez û kovan û keser û ez canê binakok..
Gumênî ji guhê min naçe. Bêhna barûd û xwînê, kolanên hêjî toz û dûman jê radibin, şewta dil.. dilê min, dilê pîrejinan, dilê ciwaniya peritî..
Pêlên oxirkeran ku bi dîtina wan hest ditevize, xatirxwestina bişewt û hêstir, nalîna bêdeng a siwarekî û sonda mezin..
Di xewnerojê de winda dibim, sirûşek li min dide:'' jiyan diherike, sebir, sebir, bibe Eyob, bibe derya, bibe çiya, bibe birûsk û ji dîrokê hîn bibe.. zindana xwe hilweşîne, tevna xem û hejariyê biçirîne, berê xwe bide rojê û tîna xwe berde.. ''
Qolinc min bernade. derûnek westayî. jan û kovanan hêlîn di damaran de kolane, zû bar nakin, dermandar û bijîşkek dilmezin divê..
Dengê nihênî bang dike: Guvişk bes in. Vereşe sanc û qolincan, vereşe tenêtî, vereşe bêdengî, vereşe hêvîkuştin... dûrbîna xwe zelal bike, guleya te dibe gul û zeviya te geş dimîne..

Şewata dil

Dengê nihênî bang dike: Guvişk bes in. Vereşe sanc û qolincan, vereşe tenêtî, vereşe bêdengî, vereşe hêvîkuştin... dûrbîna xwe zelal bike.



Ciwanê Dêrikê

Guvişk têne dilê min. Sergerdan bûme. Dîwar li min têne hev. Nema dikarim bihizirim, bûme kesatiyek hejiyayî, di tenêtiya xwe de sergêjekî bûme..
Çi bû, çi nebû!
Çi bobelat e ez dîl û bende kirim!
Xewnên min di şev û rojekê de firîn û ji min bar kirin, û kelha min herifî..
Gulîstana dilê min pehîzeka nexêr bi ser de hat û.. ez mam bi tinê...
Lêvên min nema dizanin bikenin. Çavên min geravî bûne. Ewrekî jehrîn li ezmanê min sêwan vegirt..
Dilê min giran bûye, dixele, dikim vereşim...
Çi bûye, çi nebûye!
Çi qirdik û qeşmer dikarin min bikenînin êdî û ez xencerdayî!!
Bextewariyê ji banên min bar kir. Ne werz mane ne bênder, ne bax û ne mîştax, war û warkoz bûne kavil..
Cergê birîndar, dilê şkestî û melûl, xemgînî serdest..

www.arsivakurdi.org

ama mayîna xwe li Dîmeşq karibû pirtukek bi zimanê Erebî li ser tevgera rizgariya Kurd û armancên wê di sala 1957'a de biweşîne, û heman salê de pirtukeke di bin navê ((Kurdî bi tîpên Latînî)) deli Bexdayê weşand. Gelek pirtuk li ser zimanê Kurdî weşand, û gelek berhemên wejêyî wergerand zimanê Kurdî, jê berhemên Şekispîr û Gogol.

Pirtûkên ku hûnandine:

1- Wergerandina pirtuka ((The Tempest)) Bager ya helbestvan Şekispîr ta zimanê Kurdî li Bexdayê sala 1955'an.
2- Romana ((Lalo Kerîm)) bi zimanê Kurdî , sala 1956'an li Hewlêrê hat weşandin.
3- Pirtuka ((Xwêndewarî be zimanî Kurdî)) di derbarê perwerdeyê û dibistanê û şêwazên çareseriyê, di sala 1957'an de li Bexdayê hat weşandin, û di sala 1987'an de careke din hat çapkirin.
4- Pirtuka ((Nusînî Kurdî be Latînî)) ji çapxaneya El-Me'arêf li Bexdayê 1957'an.
5- Pirtuka ((Wergêran Huner e)) di sala 1958'an de li Silêmaniyê hat weşandin, ji weşanên çapxaneya Jîn e.
6- Romana ((Palto)) ya nivîskarê Sovyêtî Nîkolay Gogol, ji zimanê Erebî û Ingilîzî hat wergerandin. Li Bexdayê sala 1958'an hat weşandin.
7- Pirtuka ((Seretay Mîkanîk û Xomalekanî Made)) – Beda 1960.
8- Pirtuka ((Kurdische Schriftsprache. Eine chrestomathie moderner Texte, Hamburg, Buske Verlag,1969)), komeke ji nivîsên nûjen e, ji weşanên (Buske) li Hamburg 1969'an.
9- Pirtuka ((Sprichwörter und Redensarten aus Kurdistan)) Bend û Pend ji Kurdistanê , ji weşanên Yekîtiya Netewî ya Xwendekarên Kurd li Ewrupa. Sala 1970 li Miyûnîx.
10- Pirtuka ((Der Kurdische Fürst Miri Kora (Rawandizi) im Spiegel der Morgenländischen und Abendländischen Quellen)) Mîrê Kurd Rewandozî, nivîsin di dîroka Kurd de – Hamburg 1970, ji weşanên Akademiya Zanist û Hunerê li Stokholm 1972, piştre li Hewlêrê sala 1994'an hat weşandin.
11- ((Kurdische Märchen und Volkserzählungen,)) Çirokine Kurdî di derbarê periyan de û çîrokine gelêrî – ji weşanên Yekîtiya Netewî ya Xwendekarên Kurd li Ewrupa 1972'an.
12- Pirtuka ((Zimanî Yekgirtûy Kurdî)) ji weşanên Yekîtiya Xwendekarên Kurd li Ewrupa 1976án li Almaniya. Carike din li Mehabadê 1979'an ji weşanxaneya Sîdiyan hat çapkirin.
13- Pirtuka ((Hendêk le Kêşe Binretêkanî Qutabxaney Kurdî Sosyalîzm)) li Stokholmê 1984'an hat weşandin, piştre sala 2001 li Hewlêrê hat çapkirin.
14- Pirtuka ((Govarî Komonistaway 'Yekêtîy Têkoşîn' (1944-1945) û Îdyolojîy Xurdeborjuway Marksistî Kurd)) ji weşana Akademiya Kurdî ya Zanist û Hunerê li Stokholmê 1988'an.
15- Pirtuka ((Rojanî Awareyîm le Swêsre)), tê de nivîskar li ser rojên ku li Cinêv sala 1962'an dipeyive, li Silêmaniyê 1999'an ji aliyê saziya Gelawêj a Ramanû Wêje ve hat weşandin.



Ewrupa digel herdu hevalên xwe yên rojnamevan : Birûsk Îbrahîm û Letîf Elî bû. Di sala 1985'an de digel hinek koçberên Bakurê Kurdistanê ji akademisyen, wêjevan, zanyar û hunermendan beşdarî danîna bingehên Akademiya Zanist û Huneran li Swêdê (Stokholm) bû.

Di salên heftê de û destpêka 1980'ê, Cemal Nebez ev erk û poste hilgirt ser milê xwe:

1- Semînervan di salên (1971 – 1972) li zanîngeha Berlîn a Azad, fakulteya Zanista Nijadan û Irfên Mirovî.

2- Semînervanê zimanên Îranî de li zanîngeha Berlîn a Azad beşê Zimanên Îranî de.

3- Di salên (1971 – 1976) xwedî erkeke zanistîn di warê (rojhilatnasiyê) de li ((Saziya Almanî ya Lêkolînan)).

4- Di salên (1978 – 1982) posta (Mamosteyê Alîkar) di perwerdekirina zimanên Farisî û Îranî de.

5- Di salên (1978 – 1983) posta çavdêrê wergêrên zimanê Farisî li peymangeha Berlînê (Staatliches Institut für Dolmetscher und Übersetzer) û çavdêr û tekûzkerê wergêrên ji zimanê Kurdî li Berlînê (Saziya Bafriya ya Zanist, Çand û Wêjeyê).

Pirofesorê Kurd û zimanzanê navnetewî ê bi navûdeng Cemal Nebez di 8/12/2018'an de çû ser dilovaniya Xweda.

Berhemên wî:

Cemal Nebez gelek gotar di rojnameyên Erebî de li Bexdayê nivîsand ên di derbarê karûbarên siyasî, civakî, yasayî û mirovî yên gelê Kurd de.

Di heyama herdu salên ku li perwerdeya li dibistanên Kerkokê derbas kiribû, bingehek ji yekemîn pirtuka fîzîk û bîrkarî bi zimanê Kurdî afirand. Di sala 1956'an de pirtukek cebir amade kir, di sala 1960 de karibû yekemîn pirtaka Fîzîkê bi zimanê Kurdî di bin navê ((Pêşgotinek di mîkanîk û taybetiyên madeyê de)) weşand, tê de xişteyek ji peyvên Kurdî di fîzîk û bîrkarî de hatine şîrovekirin. Di hey-

Rewşenbîrê kurd Cemal Nebez (1933 – 2018) Z



Serbest

Pirofesor Cemal Nebez di 1/12/1933'an de li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê ji dayîk bû. Digel xwendina xwe li dibistanên fermî de, wî derfet dît ku yasaya Îslamî jî (zanista şerî'etê), felsefeyê û zanistên olî (Lahot) bixwîne.

Di heyama sala 1950 de Fîzîk û Bîrkarî li fakulteya Zanistan a amadekirina mamosteyan li zanîngeha Bexdayê xwend. Ji meha Kewçêrê 1955'an ta sala 1961'an herdu madeyên Fîzîk û Bîrkarî li dibistanên amadehî dida xwendin. Wî sê salan li Başûrê Kurdistanê karê perwerdeyê kir ((li Kerkûk û Hewlêrê)) û sê salan jî li herdu bajarên Besra û Bexdayê kir. Di havîna 1956'an Cemal Nebez berê xwe da Sûriyê û Libnanê, li wir rastî hinek ramyar, helbestvan, wêjevan û nivîskarên Kurd hat, digel kedên wan, berhemin bi zimanê Kurdî (Kurmancî) derxistin. Di havîna 1957'an de serdana Rojhilatê Kurdistanê kir, û her wiha serdana Tehranê jî kir. Li Kermanşahê digel nivîskarine din civiya ji wan; nivîskarê Kurd Fatih Elî Heyderî, û li Sine (Senendec) digel wêjevan û nivîskarê Kurd ê navdar Ayet Ellah Mihemed Merdoxî Kurdistanî (1885 – 1975) û herduyan soza xizmetkirina ziman û wêjeya Kurdî dan.

Di sala 1962'an de koçî Ewrupa bû ji bo temamkirina xwendin û lêkolînên xwe di zanista rêbazên perwerde û fêrkirinê de, bi zanîngehên Miyonîx û Werzbêrg re di salên 1963 – 1966'an têkildar bû, û di salên 1967 – 1970'an de jî li zanîngeha Hamburgê. Her wiha Zanistên Siyasetê, Çapemenî û Qanûn li zanîngeha Berlîn a Azad di sala 1970'ê de ta 1979'an xwend.

Di sala 1965'an de dema ew hîna xwendekar bû li zanîngeha Miyûnîx, beşdarî avakirina ((Yekîtiya Netewî ya Xwendekarên Kurd)) li

www.kurdistivakurdi.org

cihên dîrokî rastî gelek talan û diziya alîgirên rêjîmê û komên çete hat. Girê Sikir El-Hêmir jî di nav de, gelek xerakirin û wêranî di cihên dîrokî de hate kirin. DAIŞ jî di nav de komên çete û hevkarên rêjîmê jî beriya wan kolan û lêgerîna bê ser û ber di wan cihan de pêk anîn. Gelek parçeyên dîrokî ji wan deveran hatin derxistin û li dewletên cîran û di serî de Tirkiyê hatin firotin. Girê Sikir El-Hêmir, Til Helef û gelek deverên din hatin paşguhkirin.

Desteya Şûnwaran a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk niha bi derfetên kêm di nava hewldanan de ye ku parastina van cihên dîrokî û şûnwaran bike. Di gelek cihan de xebatên tamîrê hatin kirin û hîn jî têne kirin. Lê Girê Sikir El-Hêmir ku hîn lêgerîn di beşek mezin de nehatiye kirin, xebatên tamîrkirin û parastinê tê de tune ne.

Rêveberiya Desteya Şûnwaran û Turîzmê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk niha ji aliyê xwe ve ji bo parastina wan cihên dîrokî çavdêriyê dike, li gorî derfetên xwe hewl dide rê nede tu kesî ku ziyanê bighîne gir û dîroka wî ya veşartî. Deste di vê demê de derbarê xebatên lêgerîn û lêkolînê nikare bidomîne, ji ber rewş ne alîkar e. Li gorî NY'yî hîn herêm di rewşa şer de ye û qanûnên wan ên ji bo parastina şûnwaran, di rewşên şer û awarte de lêgerîn di cihên dîrokî de sûcekî mezin e.

Her çiqas rêjîmên desthildar ên di herêmê de serdest bûn, siyasetên tunekirin û pişaftinê li ser gelên herêmê dan meşandin, lê Girê Sikir El-Hêmir û girên din ên wekî Til Helef, Girê Mozan û bi dehan cihên din girêdana vê herêmê bi nîştecihên wê yên kevnar re dide nîşandan. Di wan şûnwar û dîrokan de koka kevnar a gelê kurd û hin pêkhateyên din wekî asûrî, suryanî, ermen û kildan diyar dibe. Dibe li gorî lêkolînên heta niha derketine, dîroka herî kevin a herêma Cizîrê Girê Sikir El-Hêmir be, lê divê em ji bîr nekin hîn zêdeyî 99 % cihên dîrokî yên herêmê, lêgerîn û lêkolîn li wan nehatiye kirin. di demên pêş de dema lêkolîn were kirin, dibe ku şûnwarên dîroka wan ji ya Sikir El-Hêmir kevintir be. ji ber dewlemendiya herêmê ya bi çem û rûbaran, derfetên jiyanê ji her kesî re vekirî bû.

Hin lêkolînerên şûnwaran dibêjin ku herêma Cizîrê bi taybet û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî bi cihên xwe yên kevnar û şûnwarên xwe gelekî dewlemend e, heta asta berhemên wê yên dîrokî û şûnwar ji patrol û berhemên din zêdetir in.

Girê Sikir El-Hêmir di dema niha de: Niha jî li ser gir û derdora wî bi dehan mal hatine avakirin. Şêniyên wê hemû ji eşîra Begara ya Ereb in. Şêniyên niha wekî cotkar di destpêka salên 70'yî de ji herêma Dêrazorê hatine û li herêmê bi cih bûne. Dema li gund bi cih bûn, wan jî nedizanîn di bin girê wan de ewqas dîroka kevnar heye. Dema şandeya Japonî di gund de lêkolîn da despêkirin, beşek ji gundiyan di hin xebatan de bi wan re xebitîn, wê demê naskirin ew li ser dîroka hezarên salan jiyan dikin.



yên lawiran hebû. Di beşekî wê de jî bermehiyên çem hatibûn komkirin, ew jî ji bo parastina ji heriyê dihate bikaranîn. Welatiyan wê demê ava Çemê Xabûr bikar tanîn.

Di encama lêkolînê û astên derketine de, hate zanîn ku dîroka gir vediger serdema Kevirî ya nû bi herdû cûreyên xwe. Serdema kevirî ya berî û piştî fexarê ku dîroka wê vedigere di navbera salên 8 hezar û 4 hezar û 500 beriya zayînê. Di heman demê de dîroka serdema kevirî ya nihasî ku di navbera salên 4 hezar û 400 beriya zayînê û 3 hezar û sed beriya zayînê ye.

Lêkolîner û psporê şûnwaran Dr Yûsif Kinco di pirtûka xwe ya "Ji sed cihên dîrokî yên Sûriyê" behsa Girê Sikir El-Hêmir kiriye. Nivîsa xwe jî dispêre lêkolîna şandeya Japonî ku di gir de lêkolîn kiriye. Kinco balê dikşîne ser dîroka Girê Sikir El-Hêmir û dibêje: ku çanda gir ya wê demê, ji çandên herêmên din ên ji Sûriyê hatine derxistin cuda ye. Dida zanîn ku ji bermahî û dîrokên hatine derxistin diyar e ku çanda di gir de, heman çanda li rêze çiyayên Torosê ye. Ev jî dîroka herêmê û girêdana wê ya bi dîroka Kurdistanê ve nîşan dide.

Hin çavdêr jî dibêjin: ku ji ber vê yekê Wezareta Şûnwaran a Sûriyê ji bo rastiya dîroka herêmê ji holê rake, xebatên lêkolînê di cihên dîrokî û şûnwaran de pêş nedixist. Tevî beşekî pir biçûk ji cihên dîrokî di hermê de hate lêkolînkirin, lê hejmarek mezin ji parçe û peykerên dîrokî ku derdiketin dibirin mûzexaneyên herêmên din ên Sûriyê. Li herêmê mûzexane çênedikirin. Raporên şandeyên biyanî jî li gorî xwe didan weşandin.

Di dema Aloziya Sûriyê jî



wî ji deşta derdora xwe ve 11 metre, bilinbûna wî ji ser rûyê deryayê jî 300 metre.

Ev gir di sala 1991'an de ji aliyê şandeyeke Firansî ve dema li herêmê lêkolîn dikirin, hate dîtin, lê di wê demê de lêgerîn û vepexirandin di gir de nehate kirin. ev xebat di sala 2000'an de cara yekem şandeya zanîngeha Tokyo ya Japonî bi serokatiya Dr. Yahaşîro Nahkî di gir de dest bi lêkolînê kir.

Şandeya Japonî 7 salan li pey hev di gir de xebatên kolandin û lêgerînê kir. Di wan 7 salan de şandeyê di beşekî bi qasî 30 ji sedî di gir de lêkolîn da destpêkirin. Hîn jî beşê mezin ê gir kolan tê de nehatiye kirin. Di encama lêkolînê de tevir, balte, zerik, qehfik û miqdarek alavên din ên ji kevir û parçeyek ji fexar hatin dîtin. Di heman demê de peykerek ji kevir ku dîmenê jinekê nîşan dide, hate dîtin. Her wisa tifikên ji kevirên reş û hin kevirên tûj ku wê demê li şûna kêran dihatin bikar anîn, hatin dîtin. Civaka wê demê ew alav di jiyana xwe ya rojane û nêçîrê de bikar tanîn. Di gir de gelek odeyên ku ji heriyê hatine çêkirin, hene. Erd û dîwarên wan odeyan bi hostetî hatine seyandin û xemilandin.

Kolana hatiye kirin di aliyê bakurê gir de ye. Di heman demê de kortaleke ku wekî firne dihate bikaranîn heye. Tifika agir di bin keviran de jî hate dîtin. Şopa şewat û ariya wê demê jî hebû. Di nav de jî hesti-

Kevintirîn cihê dîrokî li herêma Cizîrê nas bike



Dilyar Cezîrî

Di encama lêkolînê û astên derketine de, hate zanîn ku dîroka Girê Skir El–Hêmir ê vediger serdema Kevirî ya nû bi herdû cûreyên xwe.

Serbest

Li herêma Cizîrê bi sedan cihên dîrokî yên kevin hene. Di wan cihan de dîroka kevnar a berê û bermahiyên şaristaniyên li pey hev ên di herêmê de jiyan kirin hene, li bin hev di bin erdê de veşartriye. Piraniya cihên dîrokî di girên li seranserî herêmê de hatine çêkirin de ne. Li gorî rayedarên Desteya Şûnwar û Turîzmê ya Herêma Cizîrê zêdeyî hezar û 200 girên dîrokî li herêmê hene. Piraniya wan li ser çem û rûbarên herêmê ne. Çemê Xabûr para herî zêde ya van giran girtiye. Hîn baş lêkolîn û vepexirandin di herêmê de nehatiye kirin, heta niha tenê derdora 30 girên herêmê ji aliyê şandeyên biyanî ve hatine vepexirandin û lêkolîn di wan de hatiye kirin. Di bermahî û alavên di wan herêman de hatine vedîtin, dîrokên serdemên cûda hatine derxistin. Di piraniya giran de di qatên jor de şaristaniyên nûjen û her lêkolîner ber bi jêr ve dadikevin, şaristaniyên kevintir derdikevin.

Her çiqasî di encama lêkolînan de gelek serdem û dîrok derketine û lêkolîn di wan de hatine kirin, Heta niha di Girê Skir El-Hêmir ê 7 kîlometreyan rojavayê bajarê Til Temirê ye, di hindirê xwe de dîroka herî kevin a derketiye nîşan dide. Dîroka vî girî vedigere 8 hezar sal beriya zayînê. Firehiya Gir derdora 300 metrî ye û dirêjahiya wî jî 180 metre ye, bilindbûna

www.arsivakurdi.org



Tirbespiyê difroşin. Nêzî 20 kes di sazî û desteyên Rêveberiya Xweser li Tirbespiyê û Qamişlo dixebitin.

Niha hemû xelkên gund Kurd in, lê berê Ermen û Suryan jî hebûn. Xelkên gund ji gelek eşîran pêk tên, mîna:

Eşîra Dermemika, Batika, Erebiya, Durika, Seyîd û eşîra Dumene.

Gund ji derdora 100 xanî pêk tê û nêzî 1200 kes lê dijîn. Nêzî 15 malbat li Qamişlo, 15 li Tirbespiyê û 15 li bajarê Dêrikê dijîn.

7 pakrewan ji gund hene :

Ş. Mihyedîn, Emîn, Cûdî, Cembelî, Ruha, Ridwan û Ş. Silêman.

Komîna gund bi navê Ş. Emîn e.

Xelîlê Silêman, Elî Murad û Osibê Haco ji rûspiyên gund bûn, roleke sereke di rêvebirina xelkên gund de û çareserkirina pirsgirêkên wan de lîstin.

Mamoste Xelîl Kalo, nivîskarekî navdar ji gund e, di sala 1958'an li gundê Dêrûna Qulinga ji dayîk bû, û beşê Jîyolojî li Zanîngeha Şamê bi dawî kir ye. Wî xelata endamtiya rûmetê ji YPGê wergirt ji ber ked û karê wî di xizmeta doza gelê Kurd de, û her wiha bû endamekî rûmetê di rojnameya Ronahî de ji ber beşdarbûna wî di nivîsîna mijaran di rojnameyê de. Dibistaneke seretayî û yek navîn li gund hene.

Rêjeya xwendinê li nava xelkê gund bilind e û hezkirina wan ji zanistê re zêde ye, nêzî 80 kesî bawernameyên zanîngehê di beşên curbecur de wergirtine.

Gundê Dêrûna Qulinga





Şerîf Mihemed – Welîd Bekir

gundekî kevnar e, nayê zanîn kengî ava bûye. Tê gotin ku navê gund ji navê eşîra Qulinga û Şimxalkî hatiye.

Gundê Dêrûna Qulinga li dora girekî hatiye avakirin, li herêma Aliyan dikeve, girêdayî navçeya Tirbespiyê ya kantona Qamişlo ye. Nêzî 10 km li bakurê bajarokê Tirbespiyê dikeve.

Ew bi xwe gundekî kevnar e, nayê zanîn kengî ava bûye. Tê gotin ku navê gund ji navê eşîra Qulinga û Şimxalkî hatiye.

Di navbera salên 1950 – 1963'an de gund dikeve bin serweriya malbata Haco de, ku ew weke malbateke axe bû gelek gund pê ve girêdayî bûn. Piştî wê dewleta Ba's di sala 1975'an de ev herêm desteser kir û pirojeya Kembera Erebî li ser sepand bi riya radestkirina zeviyên xelkên gund ta Erebên Xemir ên ku ji derdora Reqayê anîn û li gundên sînorî bi cih kirin.

Li bakurê gund, sînorê Bakurê Kurdistanê, li rojhilat, gundê Şîtka û E'tbê li başûr, herdu gundên Me'şoq û Bebesî û li rojava gundên Ele Reş û Kêl Hesenak.

22 bîrên neftê li derdora gund hene, ango gund di nava zeviyên zêrê rêş de ava bûye, lewma rawestgeheke petrolê li bakurê gund heye.

Kaniya Ela Reşa di nîvê gund de ye, ta niha ava wê heye, li ber wê baxçeyên sebzeyan tên çandin. Her wiha kaniya Mêran û ya Jinan li rex hev in, lê, ava wan kêm bûye, berê xelkê gund ava vexwarinê jê dibirin û cilên xwe li ber dişuştin. Ev kanî dever kiribû cihê seyranê, xelkê ji dûr serdana wir dikirin û bi taybet di rojên werza biharê de.

Xelkên gund debara jiyana xwe bi çandina dexlan dikin, digel çandiniyê hin malbat sewalan ji mih û çêlekan xwedî dikin û berhemên wan li bazara

Pırtûkxaneya Waşokanî

Ku em li dîrokê binerin her dîrok û çanda kurdan rastî êrîş û qirkirnê hatiye, ji ber ku bajarê Serê Kaniyê jî xwedî taybetiyeke dîrokî û çandeke kevnar e, dîsan rastî heman pilan û êrîşê hat, lê bi saya şorşê dijmin negihişte armanca xwe. Da ku ew dîrok û çanda resen di çavekê de hîn zindî binîme, navendên çand û hunerê di vî milî de rolek girîng lîstin. Yek ji van navendan jî navenda çand û hunera Waşokanî ye ku di 2013'an de hate vekirin, sê komên mûzîkê û gelek beşên din di hundirê navendê de hatin avakirin.

ji destpêka avakirina navendê de pirtûkxane hate sazkirin. Bi hejmareke kêm ji pirtûkan dest pê kir, lê niha nêzî 6 hezar pirtûkên cûrbecûr bi zimanê Kurdî, Erbeî, Sûryanî û Turkî jî hene. Ev pirtûkxane bûye wesîleya xurtkirina têkîliyan û danûstsandinê, ku her endamê navendê dema pirtûkekê dixwîne û bi dawî dike, ew endam semîrekê ser mijara ku xwendinye ji hemû endman re vedibêje û wiha ser mijara pitûkê nîqaş tê kirin. Bi vê awayî endam fêrî çanda xwendinê dibin û hem jî nîqaş û nerînên cuda derdikevin, her wiha hêzê dide endman ku pirtûkan bixwînin û fêrî gelek mijar û çandan jî dibin.

Amara... Yekemîn Pirtûkxaneya Navendî

Bi armanca pêşxistina çanda xwendinê li herêmê Qamişlo hate vekirin, Komîteya Wêjeyî ya Rojavayê Kurdistanê yekemîn Pirtûkxaneya Navendî bi navê Amarayê li bajarê Qamişlo vekir.

Di pirtûkxaneyê de bi sedan pirtûkên çandî, dîrokî, felsefî, bîrdozî û wêjeyî bi zimanê Erbeî û kurdî hene. Di pirtûxaneyê de kafêyek jî heye û deriyê pirtûkxaneyê li pêşiya hemû hezkiriyên xwendinê vekirî ye, her wiha rêveberiya pirtûkxaneya Amara pirtûkên taybet ji bo lêkolîn û lêhûrbûnê anîne, da ku xwendekar, lêkolîner û heskiriyên xwendinê lêkolînên xwe bi rihetî bikin.

Di encamê de tê diyar kirin ku çanda xwendinê pêşdikeve lê hîn negihîştiya asta ku tê xwestin.



Pırtûkxaneya Amûdê



Pırtûkxaneya Amara


Pırtûkxaneya Waşokanî

beşên wekî zanist, felsefe, aborî, jin, civak, dîrok, erdîngarî, şano, helbest û bawerî, her wiha beşeke taybet ji bo zimanan jî heye ku zimanên Kurdî, Erbeî, Sûriyan, Tirkî û Ingilîzî jî himbêz dike.

Di vê pirtûkxaneyê de bêtir xwestek ser pirtûkên kurdî, wekî roman, sînema, helebest û ol heye.

Gelek Xwendekarên tên serdana pirtûkxaneyê dikin û pirtûkan digirin, ji bo xwendina pirûkê jî heftiyek heta du heftiyan muhlet ji wan re tê dayîn û şûn de vedigrînin.

Ya grîng ku dema xwendevan pirtûkê digre hem agahiyên xwe zengînin dike û di heman demê de ew xwendevan û bi taybet endamên navendê dema kuxwendina pirtûkê bi dawî dikin li navendê ser mijara ku xwendiya semînerekê dide û nîqaş tê kirin. Bi vê awayî jî çanda xwendinê di civakê de pêş dikeve û hêz dide kesên din ku bixwînin. Di hundirê navendê de hola wêjeyî hatiye vekirin, ji bilî semînerên ku endam li ser pirtûkên ku xwendine didin, li vê hol jî mehê carekê semînereke çandî tê dayîn ku di encamê de guftugo û nerînên cuda derdikevin holê ev jî dibe mîna perwerdeyek biçûk. Di wê holê de her sal xwînerên zedetirîn xwendibin tên xelat kirin, 8 xwîner 4 jin û 4 mêr xelatê werdigrin, bi vî rengî hêz didin ciwnan ku pirtir bixwînin.

Hejmareke mezin ji xwînerên ku pirtûkan ji vê pirtûkxaneyê digrin derketiye, di encamê de guhertinek balkêş avabûye, ku di mehê de zêdeyî 100 pirtûkî ji vê pirtûkxaneyê derdikevin û tên xwendin ev jî diyar dike ku çanda xwendinê di Amûdê de heye astekê pêşketiye. pirtûkxaneya Amûdê yekemîn û mezintirîn pirtûkxaneye di Kantonê de, di heman demê de di vê pirtûkxaneyê de şevbuhêrkên helbestî û çandê jî tên lidarxistin.

www.arsivavakfi.org

Xwendin hunera guhdarkirinê ye

Asta pêşketina civakê bi asta zanist, çand û xwendina wê tê naskirin. û bi armanca pêşxistina çanda xwendinê, gelek pirtûkxane hatin e vekirin.



Melek Demîrtaş

Asta pêşketina civakê bi asta zanist, çand û xwendina wê tê naskirin. Ji bo wê Pirtûkxane di pêşxistina çiavk û çandê de xwedî roleke pir girîng e, Ji ber her tişta ku mirov dixwîne jê sûd digre; lewma em dikarin bibêjin ku pirtûkxane nîşaneyeke çandî y. û girîngiya pirtûkxaneyê ji girîngiya xwendin û çandê ye. Taybet ku di demên dawî de teknolojî pir pêşketiye. pirtûkxane ji bo pêşxistina civakê gelek girîng e, di vê raporê de em ê roniyê bavêjin ser çend pirtûkxaneyên ku bi vê rola mezin radibin û di pêşxistina civakê de xwedî rol û misyon in.

Pirtûkxaneya Amûdê: 7 Hezar Pirtûkên Cûrecûr Dihewîne.

Bajarê Amûdê bi nivîskar û rewşenbîrên xwe tê nasîn, ji bo wê jî dema ku em bêjin çanda xwendinê li Amûdê heya astekê pêşketiye normal e. li Amûdê pirtûkxaneya çand û hunerê piştî ya Dêrikê rêza duyemîn e di Herêmê de, ye ku 7 hezar pirtûk bi hemû cûreyan û zimanan tê de heye, ku rojane bi dehan kes serdana pirtûkxaneyê dikin. Pirtûkxane cihê ku rewşenbîr û hezkiriyên xwendinê hembêz dike ye, bi armanca teşwîqkirina civakê ji xwendina pirtûkan û zanakirinê re, ev pirtûkxane di sala 2012'an hate vekirin.

Li Amûdê gelek nivîskar derketine, ji bo wê jî ev pirtûkxane ji destpêka vekirina navenda Hûrî ya çand û hunerê ve heye, lê di sala 2014'an de ji nû ve hate rêxistin kirin, di pirtûkxaneyê de pêtir bi awayekî sîstematîk û rêxistinkî niha 7 hezar pirtûk ji hemû

www.arsivakurdi.org

Gazin nema ji kesî dibe



Fîxan Hîmo



Xwezî êşêm bi reng biba
Her dem li ber çavên te ba
Mîna gulîstana te ba
Wê çaxê tê bawer bibe
Destek li ser pora te ba
Destek ji helbestan re ba
Ji bêriya te wê dil kul neba
Ji koran re wê rengek heba
Li buharê wê bersiv heba
Wê ne li zivistana te ba
Mîna şima wê zer neba
Hişk bû ye dar hew şîn dibe
Wê çav li rê hêvî heba
Ne li nav tarîstana te ba
Ew xak ji peşkan şil biba
Ma wê peyal tînê bibe
Ji mestan re wê çolek heba
Wê hiş li warê xwe bima
Wê mey li ser masê neba
Ji niv re wê çi koçber biba
Dermanê êşê wê çiba
Bi ser wan riman de wer neba
Fîxan wê ne li benda te ba
Gazin nema ji kesî dibe

www.arsivakurdi.org

4

Kalikê zarokên min
Navê sê zarokên min li sê berxikan kir-bibû
Ev serê çend hezar sal e, tebata wî nayê..
Temenê xwe yê mayî dipîve,
Ev rojek, dudu, sisê…
damarên min di wê axê de kevnar bûne..
min têra vegerê jî roj û şev berhev kirine..
ez ê vegerim

5

Yên helbest van
Ji niha ta wê çaxê
Ji niha ta ku stêra gelawêjê rêyên vegerê nîşan bide
Dê her ji nava tiliyên min xwîn bibare…
Dê her ji te re binivîsim ``bajarê min``
*****
Ji niha ta ku êş di destên min de kesk bibe..
Ez ê her ji xwedayan bipirsim;
We di kîjan ayînan, di kîjan ayet û sûretan de
``Zeytûn Sor e`` xwendiya !!???

6

Ez…
Xwîna sê zarokên min di damarên kal û pîrên çiyayê kurmênc de digere
Helbesteke min jî li wir ji derdê evîn û şoreşê bi çolan ket..
hemjiyana min jî ahîneke kûvî ya çiyayê kurmênc e
Ji wê rojê de bi nîv canî derdikeve pêşberî ronahiya xwedê..
Em ê rojekê ji sibê zûtir
Vegerin…….

www.arsivakurdi.org

Efrîn… A dinî rojê..!!!
(Çîrokên vegerê)



Kemal Necim

1
Yekî şervan
Birînên xwe yên germ, li ser rûpelên lênûseke biçûk nivîsîn.
Birînên sar û nasnameya xwe, lênûsa birînên germ û bêhna xwêdana xwe, radestî dareke heftsalî kir.
Di guhê darê de got; navê min Salan e, Salanê xwînî, hin birînên min germ in, hin jê sar in, lê ez ê vegerim….!!



2
yekî şêwekar
her sibe ku çavên xwe li salnameyê vedike
Tiliyên xwe dihijmêre, û zarokên xwe,
rengên mayî, berî ku reş bibin ezbere dike,
ev kesk e, ev sor e, ev jî zer e..
ez ê vegerim

3
Dayika Şehîd
Ne çûye ne jî hatiye
Gewdê wê mîna pûtê xwedawendekê li wir maye..
Dê sibê, yan rojeke ji sibê zûtir kulîklên binefşê li ber lingên wê bibişkivin,
Ji xwe ew ne çûye ne jî hatiye,
Lê sibê yan rojeke ji sibê zûtir ku hûn vegeriyan,
Dê li ber serê her şehîdekî xwedawendeke bi binefş bibişkive..

www.arsivakurdi.org

Babelîskeke xeydok



Fatma sîdo

Babelîskeke xeydok
Li tenişta sînorê paytexta min hilat
Û xwe li biskên porê min gerand
Ez bi xwe re zîvirandim
Bê hay û lewaz kirim
Birim dûr li esîman gerandim
Û her ez zîvirandim berve jor
Ji bo xweda min siza bike bi pêlava xwe ya dirêj
Û ya bêtixûb
Ji bo ez bêjim min kiriye bêdadî
Min kiriye karesat
Ez dikujim
Ez goştê însan dixwim bêwijdan
Û zileta xwe dixe berîka min
Destên min di xwînê de nimandin
Ku ne ew e
Ew ez im ez dikim
Çendî bêzilete
Dê dostaniyê bi xweda re jî bike bi heq
Ji bo xweda jî min di bin lingê xwe de biçewisîne
Ew jî dikene lingan davêje ser hev
Dest û lingên min jî bi xenceran dike kilîl
Qey tu bêjî ew şalyarê xweda ye
Dê min dad bike bisûc
Û qirêjbûna xwe di paş çavên min yên bêguneh de veşêre
Û mohra xwe li ser rûpela sexte binivîs
Ji bo bi şadî bigere bêxem
Çendî lewaz e polîtîkaya wî
Çendî xwe di ferhengoka xweda de dibîne ê heq
Lê nizane ku axê ji bo xwe dikole û dike serê xwe
Babelîskê radike û qirêjbûna cîhanê dipêçîne li xwe



Gul



Qasimê Xelîlî



Barek kul
Li ser mil
Arek hil
Bû di dil
Hêstir bûn
Xul bi xul
Herder bûn
Şil û pil
Di dil de
Min yek gul
Heye bes
Ya esil
Dil li ser
Geh zingil
Dixwîne
Geh bilbil
*****
Tev riste
Û helbest
Û evîn
Hemû hest
Amûr in
Ew di dest
Ji bo min
Tek mebest
Şev û roj
Dikim qest
Çi li herk
Weke best
Dixwazim
Bi serbest
Vexwim jê
Bibim mest
*****

Qafiye
Redîf û
Movik hem
Terazû
Kilasîst
Rabirdû
Modernîst
Dahatû
Ekol tev
De hemû
Hêncet in
Û xem û
Kula min
A xwerû
Gula min
A mehrû
*****
Bare jî
Bahane
Barê min
Ziman e
Pirsgirêk
Xuya ne
Man e an
Neman e
Yê ku pê
Dikane
Nake ew
Maxane
Lê meyzê
Ji can e
Yê dibên
Nezan e
*****

Hema ew
Ne hîç in
Hestên wan
Ne pîç in
Weke we
Ne xîç in
Ne gêj û
Devqîç in
Dilgemar
Û lîç in
Ew karker
Beşîş in
Bo zimên
Di pîş in
Nefer in
Çawîş in
*****
Qaşo hin
Xwende ne
Azad in
Qure ne
Mixabin
Bende ne
Nizanin
Ehsen e
Gula min
Rûken e
Dewlemend
Maden e
Kurdî hem
Beden e
Ruh û can
Û ten e

Helbest

www.arsivakurdi.org

zivistana 2012 an



Ciwanê Qado

Berfê jî nema wek berê ji ber
xwe fedî kir.
ro li nîvroyê li ber çavên zarokan
dibare
û kuliyên xwe bi hostayî bi ser
zimanê êşê yî çetelî yê zivir de û
di şewtara stiranên qereçiyên
yogoslaviyayê ya berê de wer
dide.
wek niha berî çend salan
di nîv şeveke zivistanî de,
ji şevbestekê şiyar bûm.
di banê xênî de dilopan dirûtina
qenewîça xwe ya gêrok
didûmandin.
û li binî sênîk wek çavne tim
vekirî û xure, çavne hêsirguhêz...
hêsirxur ,diçurisîn.
kumek pûşîn ji mêrikê poz dirêj re
du berx û beytikek mirî ji lawikê yeknig re
sêvek qehwerengî û hêwî ji
sawa min re
û girêka di beştê navîn de
wek çavê ku di extîrê muşterî
ziq li çavên min dinêrî.
dawî ji kilamên çirçirkan ên çiyayî re tune ye
û rêya ber bi avdestxanê de bi
gurê Manco û cinan riqufandiye.
ji bo zarokekî wekî min xew
cinet bû, cinet.
cinetek tê de zarokan tevda bi
birncî û heftokan dilîstin û kêngî
li serê wan xistibana di ava çem
de dimîztin.



hevalên xwe temaşe kir.

Hevalên wê raserî wê sekinî bûn. Xwest hinekî cihê xwe rast bike, lê parçeyên xedar tiştek ji hestiyên lingê wê û destê wê yê rastê nehiştibûn.Tenê valahî lê hiştibû. Canê ku êdî ji bo wê ji mirarekê zêdetir tiştek îfade nedikir, lê bawerî û vîna xwe winda nekiribû.

Wê ji çemê şoreşê av vexwaribû, bi çanda xwedawendan re mezin bûbû.

Dest bi axavtinê kir, tevî ku gotin û tîp li ser zimanê wê belav dibûn, bêdengiyê birînên wê dikewand. Hinekê çavên xwe dane ser hevdu. Bahozê jî dest bi lîstika xwe kir, xwe dikir weke kêr û meqesên ku bi birînên wê dileyîst. Ew bayê sar dibû xencer û di nava hinavên wê re diçû. Weke qesabekî nû, çep û rast goştê wê dida ber kêra xwe. Parçeyên wî laşê cemidî û bêrih hûr dikir.

Ji hinaseyan bihna xwe vedida, da ku di çirkên dawiyê de aram bibe, lê wê hewaya sar nehişt ku mijangên wê bikevin ser hev. Dibîne hevalên wê lê temaşe dikin. Ew di navbera tunebûn, çavniqandin û bîranînên xwe de diçû û dihat. Çavên wê di nava bêbextiyeke kûr de dixeniqîn.

Herikîna xwînê ji birînên wê rawestiya, gelo xwîn di laşê wê de ziwa bûbû? Yan jî parçeyan di hundirê birînên wê de deriyek çêkiribûn? Wê da xwe û got:

-Ji vir biçin, min bihêlin û barbikin, ji we re serkeftin be.

Lê ti bersiv negirt.

-Çima hûn naçin? Gelo li vir in heta ku rihê min derkeve, yan jî li



benda xelasiya min in? Rast e, li benda xelsiya min in!

-Min bihêlin û biçin? Wê serkeftin ya we be, lê xizmeta dawiyê ji min re bikin, guleyekê li min bidin da ku ez ji van êşan rizgar bibim!

-Heval, tu çawa ji me tunekirina xwe dixwazî?

-Heval, min ji jan û êşê rizgar bikin, wê hezkirin û hevaltî di navbera me de bilind bibe.

-Na, na, em nikarin.

-Hevalno, dêmek ez ê razim û we ji bendewariyê xelas bikim…

Çavên xwe girt û bêdeng bû… Henaseya xwe bi hêz dîl girt û got:

-Bi xatirê we!

Çavên xwe hêdî hêdî dan ser hev.

Bi sekeratên jana birînên xwe re, raza…

-Heval, bêhna xwe fireh bike, neaxive, raze, wê razan bihênvedanekê bide parçeyên ku di canê te de cihê xwe girtine.

-Na, na ax ax, ez ê timî şiyar bim û qet ranazêm, razanê ez kuştim, bi hezarê salan e min dikuje, dibe ku mirina dayîmî bê, lê ez êdî razana demî nema dikarim tehmûl bikim.

-Tu çiqasî serhişk î, heta di birîndariya xwe de jî tu felsefeyê diwênînî, piçekê rehetiya xwe bistîne. Pêwîstiya canê te bi xwîneke nû heye. Bêhna xwe li ser canê xwe yê birîndar fireh bike.

Bi awirekê çavdêrî kir.

Wiha bersiv da:

-Rast e, em timî bêhna xwe fireh dikin, ta ku em dighêjin ziwahiyê, xwîna me ziwa dikin, paşê banî me dikin û ji me re dibêjin: "Ma xwîneke nû heye"? Ruhê gula me dimijin, cewherê me dimijin, hundirê me pûç dikin da ku em bidin pey wan û em ji wan wê pariya di bêrîka wan de winda bû ye bixwazin.

-Ez rica dikim niha bi wan meseleyan nehizire, bêhna xwe fireh bike, bawer be ku tu yê vê zoriyê derbas bikî!

Destê xwe danî ser devê wê, lê wê destê xwe yê çepê yê ku hîna bi ruh e nêz kir, destê wî dûrxist û got:

-Ez vê baldariya we spas dikim, lê xwezî we zanîba çi min disojîne! yê ku min disojîne ev bêdengî ye. Ez ti carî nema bêdeng dibim. Ez ê hemû kelhên kevneşopiyan û rezîliyan bişewitînim! Ez ê qeydan tune bikim. Ez ê bêhêvîtiyan bişewitînim, ez êdî venagerim ser wê gotina ku dibêje: "Ez lewaz im û parçe bûme." Ez ê bêjim, ez resen im, çavkanî me, ez heq im û ez vejîn im, ax, ax, ax!

-Heval, em tika ji te dikin, tu yê xwe tune bikî, birînên te hev nagirin û bêhna xwe fireh bike, hîna parçeyên di canê te de di tevgerê de ne.

Hinekê bêdeng bû û destê xwe yê çepê ber bi birînên xwe ve bir. Destê xwe danî ser nava xwe. Bi tiştê ku qewimî ye hesiya, navqendîla wê êdî bûbû newal û cihê xemên bêdawî. Destê wê kete nava wê berbextiyê de, newalên kûr di canê wê de vebûbûn. Destên wê xebera wê berbextiya kûr dayê. Wê derveyî nîv canî tiştekî din nedît. Pê nedihesiya ka di hundirê birînê de çiqas êş heye. Hinavên wê êdî kar nedikir, dema destên xwe dida birînan çavên derdora wê ditirsiyan ku lê temaşe bikin. Weke ku kevir di hinavên wê de hatibin çandin. Giranbûna hinavên wê yê ku kar nake, xeber dida. Bi birînên xwe re dest bi axavtinê kir:

-Çima tu nalivî, de bilive? Bihêle ez ji êşê bikim hawar. Destê xwe da kêlekên xwe da ku bizane çi hatiye serê wê, canê wê hemû parçe bûbû û bê êş mabû. Birînên wê bûbûn sengerên êşê, lê hîna jî dilê wê bi coş lê dida. Ji dijwariya êşa ku li ser hev kom bûye, êş bê êş mabû. Beybikên çavên wê fireh bûn, di xeleka xwe de ber bi hişkbûnê ve diçûn. Dixwest tiştên tên bîra wê bibêje, wan çîrok, helbest û hemû gotinên ku mirovan hunandine bêje. Nedixwest tiştekî bi xwe re bibe, dixwest bi hizir û ji dil re biaxive. Li

Êşa sekeratê

Fexredîn Ismaîl
Wergera ji Erebî: Fehîma Deştan

Her kes bi baldarî li benda livîna kurtepist û gotinên wê bû. Wê rêwî dinasin. rêwiyan bi çavên matmayî lê temaşe dikirin. Gelo ew serjêkirî ye? Yan jî zayîna bihezaran pirsên di nava bêhêviyê de kûr bûne, niha zeman giran tevdigere, da ku wan êşên dubare bide fêrkirin. Xilaskar li hemberî vê bûyerê hiltê û serê xwe tewandiye û lêvên wî li hemberî vê êşê xwar bû ye. Rûmet li beramberî berbextiyê serê xwe tewandî ye, li hemberî canekî ku ti carî mirinê bi erzanî qebûl nake. Ti carî baweriya xwe bi tinebûnê weke çawa yên din bi wî rengî dixwazin, bi dirêjiya wê xeta beyom re wiha mirovan dinasîn, lê wê baweriya xwe bi vê yekê neanîbû. Ew ji gund, bajar, text û malê koçber bûbû. Ber bi hezkirin, jiyan, dîrok û ruhekî nû ve diçû. Tevî hemû têkoşînên çînî û wijdanî bi xwe re jî, ew bi zêhniyet û ramanên ber bi asoyan ve hilkişiya.

Ew li ser milên xwe rakiribûn, hêdî hêdî westandinê hêza wan dikişand hundirê xwe, westandinê xwe li ser rûyê wan dida diyarkirin.

Gotinên wê, hevalên derdora wê ditirsand, wiha digot:

-Mirin nêz e, ji mirinê jiyaneke nû dest pê dike!

-Na, na, bêhêvî nebe, rizgarî nêzîk e, tu yê vegerî û em ê bi hev re biçin çalakiyan û bi hev re bikenin.

-Gelo ez baweriyê bidim xeyalan, an jî ez ji dîmenan bawer bikim? Ma hun birînên min nabînin!?

-Netirse, wê birîn çêbibin, ma ne te digot: “Birînên me xweşkbûna me ne, di nava wan birînan de azadiya me şîn dibe, bi bêhna çiyayên me wê birîn tune bibin. Tu li birînên min yên kevin temaşe bikî, pênc guleyên xedar li canê min ketine. Ez hîna jî dijîm, canê min tijî parçe bû ye û bi min re dijîn, ez bi wan serbilind im. Ez jî tevlî gotina te ya berê te gotibû, “Bi xweşikbûna birînên xwe em hêlînên xwe ava dikin”. Heval! Aram be, wê her tişt bi selametî derbas bibe.

-Ax ax em ê bijîn, rast e ez ji we hez dikim û dixwazim bi we re heta dawiyê bijîm, lê birînên min dixwazin vê carê jiyanê ji min bistînin.

www.arsivakurdi.org

her ez diçûm deng dibiliya, dibe ku ji ber latên kevir hildihat, mîna çirçirkan dûr be deng tê, nêzîk bim deng datê, weha hetanî sibê diçim û têm di nav kerî de, hedan tune ye li min, hedan tune ye li wan, rabû min du beranên din kuştin û laşê wan avêtin newalê da birçîbûna lawiran têr bikim, ji ber ku ew sedema vî kerî li min har dikin, li min qoş dikin.

Her wiha me bûrandî rojên payizê bi keftlefta min û wan derbas bû lê tu çare nebû, ji ku tê ev derd ji ku tê ev merd, li min hedan tune bû, ne xew ne razan ne jiyan, her wiha min jî bi rekiya xwe kêm nekir, min kuştin min hiştin li wê çolê di nav lepê lawiran hiştin, û di nav kaniyê de vemiştin, heger xwediyan pirsîn kanîn terşên me, ez ê bêjim lawiran xewarin ez şiyar bûm ne raketî bûm, di ava şêlû de vehiştin, ne ji min bû qet, lê ez ê maf bidim ji kîsê xwe.

Ya rast wek hûn dizanin gava min kerî êvarî dikşand bêriyê ez di çûm malê serî di xist xewê, ta bêrî xelas be ber çêrê. vê hingê ev deng di guhê min de dilîze min ji jina xwe re got, min ji diya xwe re got: Di serê min da deng û qêrîn dizume bê hedan û ev tevde ji keriyê pez e, jinê got: tiştekî hesan e, û diya wî got: Ber xwe bide, ev jiyana te ye, ne bi erzanî gihaye te, min got: jîn abûra me tê de ye.

Gava min ji rîsipiyê gund re got: Ez ê dev ji şivantiya kerî ber dim û kêmaniya serên pez yên winda bidim, got: Na tu şivanekî çak e û em dev ji te bernadin, vê daxwazê ji bîr bik, vê gotinê bes bêje.

Çare nîne, rojek û dudo , û her wiha ta dawî çare nîne, deng ilor dibe, hiltê û datê guhê şê, barîna keriyê pez tê bi awazeke reş hiltê.. dema duh min ji jinê pirsî: Ev çi deng tê? got: Tu deng tune ye maleve, dengê tê ji te tê, tu di xew de dike barîn: maaa, hirrrr, û ji xwe re dibêjim ev dengê şivane li nav keriyên xwe ye. lê piştî du rojan got: Haho ji barîna te, tu çiye ji vê barînê?

Her weha derdora min tev bû barîn, bi şev bi roj, li jor li jêr.

Haho barîn ji min e, ez dîn kirim van mirovan, an ez berê dîn bûm, bi çolan ketim, bi xwe ketim xwe bixum.

qey hûn çi dixwazin? kê we bi ser min de şandiye? em bi hevre aşt û aram bûn, çima gilî û gazin di vê demê de?

qey kûçikê min hene, direyin û nareyin, bi bilûra min re, bi gengeşa beranê serkêş dimeşin..

Gundî dibêjin, rêwî dibêjin; ku Raşdan dibînin li qefa û qefa dibeze û her dibare maa û maaa.. li wê rastê, di tarîka şevê de, dizûre, dikewite: (mee.. hiir). (mee.. hiir).

Belê, karê şivantiyê divê çêre li herêmê be, li deşt û çolan, li qefa û zozanan, bi şevên tarî diparêzim ji teba û lawiran, ji ber weha em wan dixin şkeft û berqefan, çi dinya sar be, çi germ be, çi sayî be, çi mij û baran be.

Ez keriyê pez her danê sibê dibim çolê ji bo çêriyê û ber êvarî tînim bêriyê dotinê, dîsa dibim çêrê, şevder dimînim li derdora gund, li tenişta berqefa.

Ev ez im, lê ne ev e mebesta min ji vê serdanê, belê ev îro demeke ez dibînim pezê min barîn bi wan ketiye, nizanim çawa ji nav vî keriyî deng hiltê: meee û maaa, tu dibêjî qey nuh zengelok û gewrî di qirika xwe de dîtine û ziman di devê xwe mêtine. Bi rastî min tiştekî pêwistî nedît, lê sibeha din min dît barîn bihtir bû, dirêjtir bû, nizanim çawa ez ê vî kerî bikşînim gund bêriyê, wê gelê gund pirsan bikin, rexnan bikin, çilo, çawa bû ev bûyer? Min rabû kerî kişand ser kaniya avê ku ez wî têr bikim, da belkî deng kêm bibe. qey tîn e an birçîn e, ez nebawerim.

Gelo piştî heft salan ku barîn ji van ajalan tê, ez nizanim çiye, divê vê babetê binasim, gelo gîyayekî taybet xwarine û bi jehrî ketine, yan ji wê toza berî du rojan ji hêla başûrê rojava ve hilat, yan nexweşiya halê raperiya ye, nizanim ez nizanim.

Belê piştî avdanê jî barîn ne rawestiya, rabû min yeka yeka girt û daxist nava avê, min ew şuştin û dûv re min ji tûrikê xwe nan û mewîj, gwîz û hungiv jî derxist û da wan, min dît hinekî barîn kêm bû, min rabû kerî êvarê kişand bêriyê.

Lê tiştê min dît û ez lê matmayî mam ku bi şev ango di tariyê de, di mij û ewrê vê payiza paldayî de, barîn bihtir dibû, dirêjtir dibû, bilindtir dibû, tu çar nîne li vê awaza rêş lêdide, dizume di guh û mejiyê min de, ne jiyan dibe, ne xew dibe, û mirna bi tenê tewş e.

Bi qewlê menî pêşîn, daxwaza me ev bû, mercê me abûra mala me bi du çewal genim, du elb nîsk, hîzek rûn tevî ker û kurtan û kurkekî jî di ser re. Hinek pere jî dibere mercên şivantiya salê ne, ev qewlekî giranbuha ye, çimkî ez şivan lawê şivan im, jîr im, şehreza me, zana me bi çêrên herêmê, li ajalan miqate me ji hêla parastin û çêrê ve û nexweşiyan dizanim derman bikim.

Lê qewlê cara duyemîn min kêm kir, ji ber ez ji karê xwe hez dikim, min ne diva ez ji dest xwe berdim, ez razî me bê we çi da min, heger bi nanûzikê be jî ez razî me, bi mal hazirî jî, we çi da yan çi ji destên we hat baş e.

Wê sibehê barîn kûr bû, min dît yek ji wan beranan barînê dişopîne, gelo ev sedema barînok kerî ye, min yek nekir didu û min ew kuşt ku belkî barîn qut bibe, bi rastî barîn rawestiyaî, heger pirsî ka ew beran? Ez ê bêjim qey gurekî xwar û eger wan bawer nekir ez ê mafê beran bidim xwedî çi be bera bibe.

Lê gava min kerî ji bêriyê vegerand barîn dîsan bi nav kerî ket, her tarî bi erdê diket, ta min kerî kişand berqefê, rabû ez geriyam li cihê deng,

Şivano

Ciwanê Abdal



Gelî hevalan weke hûn dizanin (an hûn nizanibin ez ê ji we re bêjim) ez şivan im , ev kar ne şerm e ji kesan re, heger dek û kone tê hene, fen û fût jî tê hene, lê kên û dexsî û nakûkî ji hêla şivanan de bi xwe tiştekî awar e.

Ez bi xwe navûsere me, navê min Raşdan e, dibêjin min Bişo, bi jin û zarok im, li gundê hawîr bû me dijîm, geh li vir û geh li wir, çimkî karê şivantiyê giring e ji civakê re.

Ez bi peyîmana heft salan ve girêdayî me, ev kar min ji bavê xwe girtiye û ez pê payedar im, ku ez şivantiya gundekî tevayî dikim, her mal û malbat çend mih û bizinên wan hene an terşê mêşinî hene, ez diçêrînim bi qewlê xwedê, qewlê xwedê heft salan bi şûnî, lê ez ne gavan im eger ez carnan dewaran jî di yek demna re diçêrînim.

Stranên kurdî

Şev çû



Gotin: **Cegerxwîn**
Muzîk : **Aram Tîgra**

Şev çû ma tu êdî hew têyî lo
Ez ranazêm kengî bêyî te xew tê lo
Xanî buye zîndan, tê de renazêm
Tev seher qîr û nalîn tew tê lo
Tenê hiştim ay dil îşev çima çû
Wî ez kuştim ay dil îşev çima çû
Rabe pey kev ay dil zû wê werîne
Tez biriştim ay dil îşev çima çû
Ay dil ay ma kes nîne mîna wê \na welle\
Ji boyî çi tim dilxwazê dîna wî
Ax dema destâ wê li bin serê min
Bi min xweş tê gelek hilm û bîhna wî
Te ji min dil bir carek min ji ter nedgo na
Te rû kûl kir carek min ji ter nedgo na
Çima îro tu ji min xeyidî ye
Te bi min çi dikir carek min ji ter nedgo na
Dilê min jî te dixwazê bibîne
Ti bi dûr ketî çavê min te nabîne
Çima roja eşqa hevqa kin bûne
Lê ev şîna dil jî her tim namîne

www.arsivakurdi.org

Stranên kurdî
Pêşkevin



Helbest: Ehmedê Namî
Muzîk: Mihemed Şêxo

Pêşkevin em serfiraz in miletê Kurdî
Yan mirin em dê bibînin, yan jîna Kurdî
Wa miletê Kurdî

Ala rengîn bo te deynim, ger ser bi derd im
Ger nekim vê tu bizane ku ez ne Kurd im
Wa miletê Kurdî

Kurdistan êdî menale lawê te hatin
Xwendevan xwînfiroşê axa welat in
Wa miletê Kurdî

Xwendevan û xwendegeh im bê al û leşker
Dê bijîn paşî bizanin rêçê bibin ser
Wa miletê Kurdî

Mal û dil û can bi carek bo te fîda kim
Xwîna xwey paqij dirêjim bindestî nakim
Wa miletê Kurdî

www.arsivakurdi.org



berî ku her û her pesnê Mîr û şahan (Desthiladaran) Bidin an jî wan bikenînin.

Di dema ku di welatên pêşketî de guhdaneke bê sînor ji şanoyê re tê kirin, bi hezaran lêkolîn, kors, peymangeh, deste û mihrîcanên taybet bi şano ava dikin û lidardixin, li welatên ku têne naskirin bi navê (Welatên cîhana sêyem) Hîna siyasetmedar vê hunerê li gorî zanebûna xwe bi rê ve dibin.. tevî ku di salên dawî de gelek milet û neteweyan hewl didan şanoya xwe û desthilata siyasî ji hev cuda bikin mînak: (Desteya şanoya Erebî) Bi serperiştiya Mîrê Alşarîqa.. (Şanoya şaredariya Bajarê Amedê) û… hwd. Ji bo wê jî pêşketina wan sal bi sal xuya û xurt dibe.

Di dawiya salên «70›î de Ji sedsala bûrî – Despêka Şanoya kurdî li Rojava- rewşeke nearam an jî nexweş di navbera şanoya kurdî û

desthiladaran de peyda dibû û ta îro berdewam e, ji ber vê yekê şanoya kurdî lawaz bû û nikarîbû bûba xwedî nasnameyeke taybet, ev destildariya ku em tînin ziman ne rêjîm an jî dewlet e, ji ber ew zext û fişara wê gihabû asta qedexekirinê, eşkere û bi her awayî şerê wê dikir, lê desthilata ku (Serperiştiya) Komên şanoyê dikirin, partî, rêxistin, tevger û komele. Her yek ji wan bi rengekî gunehkar e, hinan ji wan dixwestin siyasetên partiyên xwe bidin pêş, an jî nameyên rêxistinên xwe bighînin cemaweran di rêya şanoyên ku naveroka wê li gorî berjewndî û siyasetên wan bin. Tevî rola wan ya sereke di avakirina wan koman de, lê ne kul û meraq bû ji wan re ku vê hunerê pêş bixin yan jî tovên wê di nava civakê de biçînin ku kat bide û rehên xwe kûr brede nava civakê.

Di sedsala «21» ê de û di rewşeke wiha de ku derfet û imkan pir in, gava yekem gerek e em şano û partîtiyan (Siyasetê) ji hev cuda bikin, paşê em deste û sazîyan aktîv bikin. Êdî bese, nan xweş e ji destên nanbêjn.

www.sermola.org

Şano û desthilatdarî

lê desthilata ku (Serperiştiya) Komên şanoyê dikirin, partî, rêxistin, tevger û komele. Her yek ji wan bi rengekî gunehkar e, hinan ji wan dixwestin siyasetên partiyên xwe bidin pêş....



Abdulrehman Îbrahîm

Vejîn, huner e.
Şoreş, huner e.
Şaristanî, huner e.
Azadî, huner e.
Nasname; kultûr û huner e.
Hebûn; ziman, kultûr û huner e.
Şano bavê hunerê ye.

Şano sîwana ku hemû huneran li ber siya xwe kom dike û ciwantirîn huner diafirîne, hunera herî bi bandor di civakê de, hunera ku mîna ilktirîkê ye, her û her rivînên agir jê belav dibin, bi taybet dema ew û civak bi hev re têkildar dibin, û rehên xwe kûr berdide nava civakê, ronahiyê li tevahiya derdorê belav dike, lewma ji mêj ve di civakên ne demokrat de û civakên ku desthladar tê de ji avakirina civakê dûr in, yan jî navê demokrasiyê bikar tînin bi tenê ji bo berjewendî û mana xwe, sarbûn û dijîtî di navbera desthladaran û şanoyê de derdikeve, carnan bi rengekî eşkere û xuya û carnan jî bi rengekî veşartî. Ji dema «Girîk» Yewnaniyên kevin de di sedsala 6›an b.z û piştre bi navê «kenîsê» û «misilmantiyê» û ta roja îro berdewam e li ser destê desthilatdarên nû, di baweriya me de wê berdewam be jî.

Dîrok zengîn e bi nimûneyan: «Abû Xelîl Alqebanî» Dema agirê êtûna «Hemdî Başa» û «Sultan Ebdulhamîd» bi navê misilmantiyê şanoya wî şewitand, û «Meyrhold» Çawa li ser destê «Stalîn» Hate kuştin ji ber nêrînên wî yên ciyawaz û pêşverû, ev herdû nimûne ne yên pêşî bûn û wê neyên dawî bin jî, wê ev sarbûn û dijîtî berdewam be ta desthlatdarên dijî nerînên azad hebin.

Weke ku helbestvan û dengbêjên mîr û şahan hebûn, wilo jî şanogerên wan jî hebûn, hemû derfet û imkan ji wan re vekirî bûn Beram-

Di piyê gumlekê min de,
yê bi têla cilan ve
daleqandî
du pelên payizê xwe veşartin.
*****
Zuxurê
ku ji quntara çiya gindirî,
li ser morîstanê bixwe
bi cih bû.
*****
Ji salan ve, dehên kilîtan
berdayî ne,
tevî ku bê feraş in jî
ez newêrim wan bavêjim.
*****
Ji dilopek mey
serxweş ketim,
bawer nekin.
*****
Ji dilopa xunavê
min têr vexwar,
bawer nekin.
*****
Di odeyeke nîvtarî de,
dawiya xwe
di lênûsa xwe ya rojaneyan de dinivîsim.
*****
Matmayî me,
çawa evqas bîranînên belawela
di hişê min de
civiyan.

www.arsivakurdi.org

Gurekî xwevedayî

Ebbas Kiyarustemî
Wergera ji Erebî: Qadir Egîd

Xêzkeke sor
li ser spîbûna berfê ye,
nêçîreke birîndar
dikule.
*****
Li paş her pêleke bilind
sê pêlên kin in,
li paş her sê pêlên kin
pêleke bilind e.
*****
Di yekem êrîşa bahozên
payizê de
komin ji pelê daran
xwe avêtin odeya min.
*****
Di xew de dibînim
ku di bin pelên payizê de
binaxkirî me,
ku laşê min
bi xunçeyan dipişkive.
*****

www.arsivakurdi.org

Têkoşerek

Mihemed Seyîd Alrîhanî
Wergera ji Erebî: Ibrahîm Xelîl



Ji bo ku bihêlin ew navên hevalên xwe bide û wî bi tiştên ku nekirî mukir bidin, rê lê teng kirin û zarokên wî birin.
Milê xwe hejand û got:
-Bila, ma ne ew ê wisa fêrî tolhildanê bibin.
Mala wî wêran kirin, rabû got:
-Bila, ma ne gora dinyayê ye... gor e!
Trimpêla wî ji dest birin, dîsa got:
-Bila, ma ne qalikek e, lîstikek e...
Wan ew daleqand û bi qamçiyan lê da heta ku iyarê wî diriya.
Ji nişka ve, Gandî ji nava gewriya wî qîr da:
-Çermê me ji we re lê hûn tu car nikarin bigihêjin giyanê me.

www.arsivakurdi.org

Navê pirtûkê: Qîrên Me
Naverok: Helbest
Nivîskar: Ehmed Mistefa - Xemgîn
Hijmara rûpelan: 253
Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê
Nivîskar: Eqîde Tok
Cildê Yekem
Hijmara rûpelan: 257
Çapa yekemîn: Dibistana Wejeyê Ya Şîlan Baqî 2013
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Di Siya Mirinê De Pişkivên Jiyanê
Nivîskar: Eqîde Tok
Cildê Duyem
Hijmara rûpelan: 323
Çapa yekemîn: Dibistana Wejeyê Ya Şîlan Baqî 2013
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



www.arsivakurdi.org



Navê pirtûkê: Birînên Min Nema Têşin
Naverok: Helbest
Nivîskar: Fîxan Hîmo
Hijmara rûpelan: 269
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Hemû Berhem- Şano
Naverok: Şano
Nivîskar: Mihemed Bîlal Yûsiv
Hijmara rûpelan: 132
Ji Weşanên Yekîtiya Rewşenbîran – Kantona Efrîn
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Gurî
Naverok: Şano
Nivîskar: A.Gafur Dogan (Hêvî Şanoger)
Hijmara rûpelan: 88
Çapa yekemîn: 2009
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr-Qamişlo 2017

www.arsivakurdi.org

Navê pirtûkê :Çirûskên Nû
Nivîskar: Fehîma Deştan
Hijmara rûpelan: 155
Weşanên komîteya wêje ya rojavayê kurdistan
Çapxaneya Şehîd Herkol 2017
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo



Navê pirtûkê: Dema Gelan
Nivîskar: M.Cîhad Çobanoglû (Şagîn Dogû)
Werger: Yekta Şoreş
Hijmara rûpelan: 365
Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Sînor
Naverok: Roman
Nivîskar: Menaf Osman
Hijmara rûpelan: 250
Çapa yekemîn: Weşanxana Aram
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



www.arsivakurdi.org

Pirtûkên derketî



Navê pirtûkê: Ziman û Çalakiya Rastiyê
Naverok: felsefe- raman
Nivîskar: Abdulah Ocalan
Wergera ji Tirkî: Nusret Kurt-Reyhan Îke
Hijmara rûpelan: 411
Weşanên YRD
Çapa yekemîn: Çapxaneya Ronahî 2006
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Bênav
Naverok: Roman
Nivîskar: Husên Engîzek
Hijmara rûpelan: 224
Weşanxaneya Şilêr- Qamişlo 2017



Navê pirtûkê: Berfa Germ
Naverok: Çîrok-Pexşan
Nivîskar: Polat Can
Hijmara rûpelan: 143
Weşanên komîteya wêje ya rojavayê kurdistan
Çapa yekemîn: Mezopotamiya 2003 Êrîvan
Çapa Duyemîn: Çapxana Roj 2009
Çapa Sêyemîn: Aram 2016
Çapa Çaremîn: Çapxaneya Şehîd Herkol 2017
Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo

redkirin.

Di vê sedsala dawî de jî yên ku car bi car nivîsên wan derdiketin, bêhina jina kole jê dihat, bi serbestî nedinivîsand ji ber ku jinê dizanîbû ku heger ne li gorî kêfa civakê be wê were redkirin, lewma wêje di astekê de sekinî ma û tu pêşketin û zêdekirin bi xwe re çênekir, tevî ku gelek nivîskarên kurd şoreşên wêjeyî kirin û gelek berhem derketin, lê ji ber ku jinê cihê xwe tê de negirt û ya rastir cih jê re nehiştin û li himber wê sekinîn, şoreş seqet ma. Hin jin jî hebûn ne wêjevanbûn jî, lê li wêjeyê xwedî derketin û mînaka ku heta niha keda wê zindî maye, Nazilî Xelîl ya ku piştî mirina helbestvan Hamid Bedirxan wê hemû berhemên wî ên Erebî yên ku nehatibûn çapkirin, berhevkirin û aboriya wê li ser xwe girt



û bi destên xwe belav kir û ew berhem niha li pirtûxaneya kurdî zêde bûn, lê zêde li ser keda wê nehat sekinandin û helbestvana kurd Dîlan Şewqî di destpêka xebata xwe de werger dikir û pirtûka Cegerxwîn ya bi navê ``Jiyana Min`` bi Se`dûn Eyo re wergerand zimanê Erebî, vê jin gelek xebat di zimanê kurdî de jî kir û niha dîwanên wê yên helbestan jî hene, lê mafê xwe di nav civakê de nedît. Ku em bên van çend salên dawî yên beriya şoreşê, hin jin li ser lingên xwe sekinî man, ew jî berhemên wan di civakê de bêbaldayîn man, piştî şoreşê jinê xwe isbat kir û bingeheke xurt di avakirina civakê de danî û roleke girîng lîst, bi taybet di aliyê zanist û rewşenbîriyê de, êdî bi serbestî berhemên xwe derdixîne, her wiha pênûsa jinê xurt û li pêşketiye û niha gelek berhemên wê li ser êşa jinê, nexweşiyên civakê û azadiya jinê bi hemû cinsên wêjeyê ji helbest, çîrok, gotar, pexşan û roman derketine, netenê jin li ser jinê dinivîse, lê mêr jî bi gelek awayan û di berhemên xwe de behsa êş û mafên jinê dikin, lê çiqasî jî hawil bidin nikarin êş û hestên jinê bidin nasîn, ji ber ku bi çavên xwe li mijarê dinerin, tevî ku hîn jî zilamên civakê çavnebariyê dikin.

Rest e di hin aliyan de pênûsa jinê qels e, lê xwe isbat kir. Nivîsandin û berhemên bi ramanên jinê wêjeyê xurt dike û ji seqetiyê xelas dike.

Jixwe berhem bi kîjan zimanî bibe bila bibe, ziman ne girîng e, lê ya girîng ew e ku berhem di xizmeta civak û wêjeya kurdî de be.

Jin û wêje



Botan Ednan Hoşê

piştî şoreşê jinê xwe isbat kir û bingeheke xurt di avakirina civakê de danî û roleke girîng lîst, bi taybet di aliyê zanist û rewşenbîriyê de, êdî bi serbestî berhemên xwe derdixîne.

Ku em bala xwe bidin dîrok û wêjeya kurdî û tê de baş kûr bibin, em ê nas bikin ku ya heta niha wêjeya kurdî li ser lingan hiştiye, wêjeya devokî ye, jixwe wêjeya devokî jî jinan nifş bi nifş domandiye, xurtir kiriye û bandor li civakê kiriye, hewiha jin di gelek qadan de sermiyan bû, netenê digotinê de,lêbelê di mal, gund, pevçûn, şer û di evînê de jî xwedî rol û amadebûn bû, li gorî dadmendiya xwe civak dimeşand, weke em dizanin di dîroka kurdan de û heya niha jî gelek dayîk û jin li kêleka mêrên şoreşger sekinîn û heya piştî ketina wan mêran di şoreşan de jî, jinê ew şoreş berdewam kiriye û ya ku nikarîbû çekê hilgire bi hemû alîkariya wek xwarin, moral, paqijî û dermankirina birîndaran radibûn, ya herî ber bi çav di şoreşa Mele Mistefayê Barzanî de hevjîna wî tim li ser hespa xwe bû û tifinga wê li ser milê wê bû, tevlî şoreşê dibû,her wisa hevjîna Elî Şêr jî piştî girtina wî, wê şoreşa wî berdewam kir, lê ew jî hate girtin û bi Elî Şêr re hat darvekirin,lê mixabin mîna gelek jinan dîroka wan hate windakirin. Di wêjeyê de jî, ji ber ku wêje huner, bedewî, hest, raman û xeyalên di nav jiyana mirov û civakê de afirîne, jin afrînera herî mezin e, ji ber ku di xwezaya xwe de bedew û derhêner e, çi bi mîtolojî, çîrok û pêkenokan, çi bi lorîk û stranên xwe civak, dîrok û exlaqên kurdan da pêş, lê tevî ku ewqasî xwedî çand û wêjeyeke berfireh bû, di dîrokê de kêm par e.

Em dizanin bi sedên salan jin hatibû kolekirin û ji gelek mafan bêpar mabû, gelek caran jî nivîsên wan ji aliyê civak û desthilatdaran ve dihatin

www.arsivakurdi.org

nirxandina helbesta heyî û tîran an jî pesnan bavêjim. Helbesvanî li ser du Sitûnan avakiriye, heyîna helbestvan wek heyberkî civakî û suruştî bandor dibe, ya dudwan xwedan şêwaz be di hevgirêdan û zarvekirinê de ku ev sitûn, çavkaniya wê ji pêmayê civaka wî û ya cîhanîn e.

-Pirsek kilasîkî heye ku ji hemû helbestvanan tê kirin, tu di kîjan demê de helbestê dinivîsî?

wek min berya niha bi bîrxist, ku helbest pêşî di dil û giyan de wek dilnazî (atîfe) şîn tê, piştî kêferatek hundirîn di navbera dil wek xwestek bi mejî re dibe hizrek, mîna hevîrê ku tirş bibe, êdî gerek bibe kulor û li tenûrê bikeve, ji ber ku bûyîna helbestê pêşî di malzaroka giyan û dil de zîl dide, ev herdû aliyên mirovî hezkiryê derdorek aram û atmosfereke bêdeng in, ku bi alîkariya benga ezmûneya helbestvan, dil, giyan û mejî bi hev re wî berî derxin himberî roka jiyanê. Di baweriya min de şev guncawtirîn deme ji bo zayîna helbestê, kengî bibe sibeh îcar helbestvan li wê zayînê dinere û aliyê wê yê gerek dide hev ji bo hêjayî şanîdan û xwendinê bibe. Ji xwe di qolinê helbestdayînê de helbesta ku pir tirş bû be li demê napirse, helbesta ku suruştî hatibe ew xwe datîne û xwedanê xwe mecbûrî danînê dike. Ji bo min bi giştî helbestên min bi şevê zane û deqên şano bi sibehan re tên

-Ji ber ku tu xwedî tecrûbeyeke dirêjî di warê şanogerî û helbestê de, şîreta te ji bo nifşên nû yên ku berê xwe didin nivîsa helbestê û şanogeriyê çi ye?

helbest û şanonivisî, heman metryal in di zarvekirinê de (qalkirinê de). Şano û helbesta serkeftî ew e ya ku qala tiştên hîn kesekî qal nekiry vebêje û vedîtina paradîgmaya ku ji pêşketin û bilindkirina bedewyê bibin malê mirovahyê ku sînorê xwe yê neteweyî derbaske, ev jî kedek mezin dixwaze ji xwendin, tevger û gera ji bo rastiya di qermîçok, koşeyên jiyanê û dîrokê de windayî ne.

-Projeyên te ji bo paşerojê çi ne?

Pir berhemên min hîn reşnivîs in, dikim ku wan bidim ser hev, ji helbest û deqên şanon e. hewil didim kû evîna Derwêşê Evdî bikim deqeke şanoyê .

-Gotina te ya dawî.

Derketina kovara Şermola pirozdikim, navê girekî bajarê Amûdê ye, sax û miryên bajêr himbêz dike, nisbetî min serenavekî tirajîdya jiyana zindî û xeyla miryan e, ew ên ku di jyana xwe de rastiya xwe nedîtin di himbêza şermola de bi rastiya dîroka xwe ve razayîne. hêvya min mezin e ku nifşê ciwan wê li wê rastiyê û li ked û nirxên miletê xwe xwedî derkevin. Demên tên ji ber qada kurdistanî qadek e xam e ji her alî ve, wê ji giyanê mirovahyê re bibe berhemdêriyek zirav. banga min ji nifşê ciwan re ew e hest û mejiyê xwe li ser vî esasî xwedî bikin.

bên derê, rê li ber wan were vekirin. Aliyê din jî, wek pêşbirk dibe qada pêşketina şano û şanogeriyê,di mihrîcana ku li ser bingehekî rêkûpêkirî hatibe amedekirin,mirov dikare ji vir asta şanoya kurdî û ciyawaziya wê binirxîne. Sê miherîcan hatin li dar xistin ji sedemên ku aliyên têkildar nikare xalên hêja di mihrîcanan de bike tevna avakirina şanoyê sal bi sal şewq û teşeya mihrîcanên paşveçûnan himbêz dike. Di her sê mihrîcanan de ez bi tekest û deqên xwe beşdar dibûm. Sala yekê deqa bi navê «Êdî bes e» ji derhuneriya Hesen Remo, baştirîn xelat ji hêla tekest û lîstikvaniy ve wergirt, sala didwan bi şanoya di bin navê «Gemardank» wek mîlodrama ya nivîskarê sûrî Memdûh Edwan, min lîstikvanek lê zêdekir û hin aliyên wê ji hêla hizir ve zengîn kir, ev şano jî bi derhuneriya Hesen Remo yekemîn xelat wergirt. Ji bo mihrîcana sisiyan jî tekesta bi navê "Kurtasya cengê" ya nivîskarê Îraqî Mêhdî Ebdilhadî, ku min wegerandiye kurdî, hem jî hin aliyên hêja bûn zedekirinê di çarçova heman hizrê de min giftûgo jê re danî, vê deqê jî bi derhênerya Hesen Remo û heman koma bi navê Şehîd Yekta Ya bajarê Amûdê, xelata baştirîn şano wergirt. Di baweriya min de ew qonaxa şanogeryê ji bo amedebûna newrozan ji pir hêlan ve watedartir bû û çêjeya berhema wan xweştir bû li gel hemû astengiyan, ku îro ji hêla teknîkî û şanogehan de pir derfet çêbûne û zemînek azad li dar e, rewsa şanogeryê ne bersivdar e.

şano hunereke komînal e bi sazî û dezgevanyê saz dibe, pir alî tê de beşdar dibin. Mîna avakirinê ku pêşî ji cem endezyarekî hizir û xeyala xwe datîne ser pelikan û her mesref û pêdivyaun dest nîşan dike û dide destê hostayekî û bi dehan xebetkar, hosta heta wê avahiyê saz dike û bedew radike. Ji vê hêlê de şnogerya kurdî li Rojava neketiye van war û şaneyên zanisitî de. Di dema ku dever û neteweyên dîtir xwedan pirtûkxane û bi bingehin ji her hêla berhemdayînê ve,temenê şanogerya kurdî nisbetî wan nayê pîvan, lê nayê vê wateyê ku asoyê tevgera şanoya kurdî bi yekcarî nediyar e.

-Bêguman tu rojname û kovaran dişopînî, gelek helbest di wan de tên weşandin, gelo tu wan helbestan çawa dinirxînî?

Bingeha guftûgoya şanoyê ji helbestê ye, li gel ku helbest ji bal kesekî tê hûnandin, bêhin û şewqa derûn û henaseyên wî lê mor kiriye, lê dibingeha xwe de ji civakê, zargotin, afsane û bîr û baweryên wê vegirtiye. Hêmanên avekirina helbestê di pileya yekê de, xwe dispêre dilnazyê, ev diyardeyeke mirovî ye, ne tenê helbestvan xwedanê vê xelatên e, lê ji bo helbestvavan dibe kevirê bingehîn ku mijar û hizra helbestê li ser tê avakirin. Helbesta serkeftî xwedan ev hêmane ji hêla giyanî ku bandora xwe li xwîner û guhdarên xwe bike, lê ji bo ku ev dilnazî, xeyal û nîgaş werin zimên û bibin metryalek niviskî yan dengdayînê, rola şêwaz herî sereke ye ku ew dilnazî bikeve qalikê helbestê de. Ez naxwazim yekser bikevim

rola xwe bilîze û qonaxa xwe ji dahatûyê re bi gewde bike, çendî civakek ji hêla siyasî û ragihandinê li pêş be û bi azîneyên herî pêşketî jî nikare teşe û paradîgmayên heyî civakê şîrove bikin. Ev peywera roman, helbest, şano û muzîkê ne. Ji bo pirsa we, ne şano û ne beşên dîtir jî xewdan hêz û bersivdêriyên civakî ne ji bo yekbûna hestyarî, dilnazî û bîra netewî re.

-Tu asta şanogeriya li Kurdistanê bi giştî û bi taybet li Rojava çawa dinirxînî?

pirsa huner û civakê di hev re derbasbûyî ye, ne gengaze mirov karibe civakekê binirxîne û asta pêşveçûna wê binase dûrî rewşa wêje û hunera wê civakê. Bitaybet ji bo şano, ku hem hunerê û hem jî wêjeyê hildigire. derbasbûna hunera Şanoyê ji bo Rojhilata navîn di nîvê sedsala 19›an de bû, hersê netewên kurdistan dagirkirin xwedan derfet bûn ku ji şanoya xwe re hinekî bixebitin. Ji vê hêlê ve miletê kurd rû bi rû bi qirkirina candî, giyanî û komkujiyan re ma bû. li ser asta bakurê kurdistanê di pêvajoya 1918›an de tenê yek deqa şanoyê ‹Memê Alan› ji bal Evdurehîmê Hekarî ve ta sala 1959›an deqa ‹›Birîna reş›› ji bal Mûsa Enter ve hatibû nivîsandin. 41 sal para miletekî ji vê hunerê di du deqan de hatibû gewdekirin. Bê guman wê asta şanogeriya îro ji bo tevaya kurdistanê di asta berhemdayîna serdema borî de bersivdar be.

-Di van salên dawî de gelek mihrîcanên helbest û şanoyê tên lidarxistin, tu van mihrîcanan çawa dibînî?..berhemên we jî di van mihrîcanan de dihatin pêşkêş kirin? Û Çi kêm e ji şanoya kurdî ta ku bigihêje asta şanoya derdorê?

Ji pêngava 19›ê Tîrmehê de û destkeftiyên bi cih bûn, yek ji van destkeftiyan şanogeh û navendên çandê li tevaya bajarên Rojava vebûn. ku gelê me bawer nedikir rojekê ji rojan şano, sitran û dîlanên gelêrî di van navendan de werin şanîdan. Hêjaye ku ev navend peya-pey bi aheng û çalakiyan avaker be. Mihrîcan di bingeha xwe de dualiye, aliyek ji bo piyesekirina berheman bi temaşevanan re,wek tê nasîn ku cemawer û temaşevan hêmana bingehîn e ji şanogeryê re. Da şanogerî û cemawerê wê ava bibe û têkilya wan zindî bimîne, wek fektorek ji fektorên tevgera şanogeryê li dar be. Tenê rojên mihrîcanan têra vê pirsê nake, ji ber mihrîcan encameke ji çalakiyên berhemdayîna giştî ye, girînge rêbaz û derfetên heyî ji bo vê





Berya ku bi şanoyê ve mijûl bibim, hezkiryê helbestê bûm û ezberkerê sirûdên seydayê cegerxîn bûm, dibe ku sedêmên vê jî ku bavê min helbestên cegerxwîn mîna feqeyan carcaran dixwend. Hem jî malbat û dostên wê di nava gengeşe û guftûgoyên siyasî de bûn di qonaxa yekemîn ji perçebûna partiyan, lewma ez jî pê bandor bûm. Li alyekî dîtir ez li ber himîn û dîlokên dayîka xwe ya ku heta roja dawî ji jyana xwe yek kêlîkê nuxwiryê xwe yê ku di şewata sînemayê de şewitî ji bîr nekir, bi sitranî û himînî tirajîdiya şewata zarokan vedigot. Yekemîn helbesta min hunand ser ritim û kêşeyan, lê tu carî nediket bîra min ku ez ewê bextewer bim û wê helbestê ji Seydayê Cegerxwîn re bixwînim, ew jî di sala 1978›an de bû.

Nivîsandina şano û pirsa şanogeryê di qonaxên Newrozan de pê mijûl dibûm. ji ber diyardeya şnogeryê û hunera wê ne mîna helbest û romanê ye, şano gerekdarî şanogeh û lîstikvana ye, ev pirs bi rewşên siyasî û demokrasiyê ve girêdayî ye, jixwe ev atmosfer li her çar perçên kurdistanê ji bo piyaseya şnogeriya kurdî tune bû. li Rojavayê kurdistanê tenê ji bo 365 rojan, yek roj bi derfet bû da çend kêlîkan wek şano were pêşkêş kirin ji milet re. ji bo vê hunerê ne jêderek hebû, ne jî danerek ku em xew bispêrinê. Tenê di xeyala me de ku em çîrokekê, mijarekê bi guftûgo bikin, bê ku hêman û rêgezên zarevekirin û diramatîka avakirina şanoyê zanibin. Ez dikarim bêjim pediviyê ez ajotim ber bi afrandina, çêkirin û hevgirêdana şanoyê ve.

- Mamoste hinekî ji me re behsa şanoyên ku te nivîsandine bike û kîjan ji wan tu dibînî ku bandoreke mezin li cemaweran kir? Û Gelo şano di roja me ya îro de bi rola xwe ya pêwîst dilîze yan na?

Di qonaxên piyaseyên Newrozan de, lîstik bi giştî di çarçoveya sikêtşan de bûn û deqên min dinîvisandin, min rewşa dikê û tunebûna ronahiyê û eksiswaran di berçavan re derbas diki. ji bo temaşevanan tişta dihat amedekirin, bi baldarî û hestyariyeke bilind dihate pêşwazîkirin, li gel kêmaniyên wê yên hunerî û tevin û girêdanên wê. Ji hêla hizir û mijaran ve jî bê qapax û bi morên siyasî yekser nasnam û dumahya xwe şîrove dikir.

pirsa şano li ser asta cîhanê tevî aloziyekê jiyan dike ji ber hin sedemên ku niha ne qada mijara me ne, ji bo tiştek bi bandor û roldar be, ev bi asta serwextî û bingeha ezmûneya xwe ve girêdayî ye. Sedemên lawaziya hunerî û wêjeyî ji nêz ve bi rewşa çewisandina civakê ji hêla siyasî ve girêdayî ye. çawa ku şoreş bê şoreşvan ava nabe, wêje û huner jî bê hunermend û wejevan ne gengaze ku karibe

Hevpeyvîn li gel şanoger û helbestnivîs Beşîrê Mele Newaf

Hevpeyvîner: Aram Hesen



Beşîrê Mele Newaf di sala 1956›an de li bajarê Amûdê hatiye dunyayê, ji maklbateke kedkar e ku di qonaxa rewşên tarî de ji bakur (Serxetê) bi hezarên malbatan re ji ber zulm û setema cemhoriyeta Tirk, daketine binya xetê, malbata wî jî li bajarê Amûdê bi cî bû.

Di sala 1964›an de dibistana seretayî ya suryniyan a ku di bin serperiştiya kenîsê de bû qedandiye, qonaxa amadeyî jî li bajêr bi dawî kiriye. ew jî yek ji wan kesên ku ji nasnameyê mehrûm bûn, ji lewre derfeta wî ya berdewmkirina xwendina zanîngehê nebû. ji bo debar û pêdiviyên jiyanê ew niha Elktrîksazê dînamoyan e li heman bajarî, bavê çar zarokan e. Ev du sal in wek wanederê waneya şanoyê ye di beşê ziman û wêjeya kurdî de li Zanîngeha Rojava.

-Helbestvan û Şanoger Beşîrê Mele Newaf, despêkê em spasiya te dikin ji bo vê hevpeyvînê.

Ez jî hemû xebatkarên Kovara ŞERMOLA spas dikim.

-Te pêşî dest bi helbestê kir an şanoyê û di kîjanê ji wan de bêhtir dikare hest û ramanên xwe bîne ziman? Û Kê te ber bi şanogeriyê ve ajot, şanogerên ku tu bi wan bandor bûyî kî bûn?



Quran daketiye ser Elî.

Bi vî rengî, bi vê piropagendayê, kurdên Hekarê, Mûşê, Bedlîsê,Wanê û Agirî bûne henda sultan Selîm. Dijberî û nakokî di navbera Osmaniyan û Sefewiyan de gur û giran bû

Sultan Selîm karê xwe ji cengê re tekûz kiribû rabû hezên giran yên topên Bîzentiyan bi wan re ajotin ser leşkerê şah Ismaîl û li devera Çildêrê herdû artêş hember hev rawestiyan.

Şerekî giran û xwîndar di navabera wan de çêbû bi hezaran term li ser xaka kurdistanê hatin raxistin, ez dibêjim û gelek dîrokzanan gotiye: leşkerên Osmaniyan kurd bûn ango serê kurdan li hev dixistin (îro ji vaye kurdên Elewî û yên Sinî ne li hevin û şoreşa şêx seîd jî bi vê sedemê şikest).

Di cenga çildêrê de sultan Selîm biserket û leşkerê wî derbasbû Tebrîzê jî stand, piştî bihîst ku Qanso Xorî ji Misrê tê bi hana şah Ismaîl ve rabû vegeriya û berê xwe da Misrê ji bo armanca xwe ya sereke bi cih bîne, li devera Merc dabiq –li ser sînorê Sûrya û Turkiya îro- leşkerê Misrê û yê sultan Selîm pêrgî hev hatin û bi hesanî lîderê Misrî Qanso hate kuştin û leşkerê wî radest bû, piştre sultan êrîş berdewamkir ta ku giha Misrê jî dagirkir.

Peywerê Fatimî rabû herdu kilîtên pîrozgehên islamê radestî sultan Selîm kirin, û navê wî kire peywerê islamê, hêjayî gotinê ye: piştî vê serkitina Osmaniyan bi saya leheng û pakrewanên kurdan, kurd bûne navmalî û gerdevanên mizgeftan.

imperator Rûmanos şikeşt û Rûmanos bi xwe dîl hate girtin, şervanên qehreman ew anîn li ber destê Alperselan danîn, wî jî li gor yasa û rewiştên cangê ew nekuşt, lê fedekariyek giranbuha ji Bîzentiyan xwest.

Bîzentiyan şert û mercên Alperselan qebûl kirin, fedekariyeka ku xwestibû dan û polîpoşman vegeriyan û xaka kurdan radestî Selcoqiyan kirin.

Gelî xwendevanan, gelî kurdan da em ji hev re bibêjin: Qezenc û sûda kurdan çi bû?

1- Kurd bindestî Bîzentiyan bûn, piştî vê serketina Selcoqiyan di canga malazkurdê de ketin bin destê Selcoqiyan û ta îro.

2- Kurdan bi sedan şehîd danîn û ziyanên mezin li welatê wan bû, bese kurdo ma heta kengî bi navê islamê tê bê xapandin.

Cenga sêyemîn

Beriya ku ez vê çîrokê bêjim, dixwazim kurte nerînekê di derbarê kurdan û ola islamê de bêjim.

Gelek miletên cîhanê bûne misilman weke: Pakistaniyan, Turkan, Daxistanî, Emazîxî, Endonîsî, û... hwd. van miletan keya û zimanê xwe parastin, raste hinekan zimanê Quranê ji xwe re xweştir dîtin, lê welatê xwe, xaka xwe nekirin qurban ji birayên xwe yên misilman re.

Tenê miletê kurd roja bûye misilman û heta îro xwe kiriye canfeda ji ala islamê re, û xaka xwe, welatê xwe yê bi xêrûbêr kire qurban ji misilmanan re.

Vaye çîroka sêyemîn wê nerîna çûyî ji wer diçesipîn piştî ku Holako (Nifira dîrokê) Bexda dagir kir di sala 1091'ê zayînê de, peywerê islamê reviya çû Misrê, li wir tîreya malbata peyamber Mûhemed bi rêxist û xwe kire peywerê Fatimî ango ji nijad û reha Fatime keça peyamer e, navê wî Mihemed Elmutewekil bû.

Di wê demê de islam bûbû du perçe (weke îro) peywerek islamê li Misrê û yek li Baxdayê, wisa jî şahê farisî Ismaîlê Sefewî bi tîreya fatimiyan girtibû -vaye Iran vê serdemê Elewîne- û sultanê osmanî Selîmê yekem helbet Sinî bû.

Herdû şah û sultan gelek gef û zirt li hev dikirin, herdiwan jî dixwestin kurdan ji xwe re bikin heval, wan dizanîbûn ku şer çêbibe wê li ser axa kurdistanê be.

Sultan Selîmê yekem zanyarên olê, şêxine sexte û melane zîrek,berdane nav kurdan ji wan re digotin : ev Sefewî dijî ala islamê ya rast in, ev ji zavê pêncan e, ev di mizgeftan de dibêjin: Elî weliyê xwedê ye,



kê êrîşî Rojhilata Navîn bikin, ew êlên mêrxas û şerxwaz bi gelek navan dihatin nasîn, ji hinekan re digotin êlên zêrîn û ji hinekan re digotin Ertoqî, ji hinekan re digotin Selcoqî.

Di sala 1037'an de serokê vê êlê Ertuxril Beg berê xwe da rojava, di kurte demekê de bajarê Rey (Tehrana îro) dagir kir û di sala 1040 de peywerê Baxda elqayim neçar bû ser mil û singa wî xemiland bi paye û nîşanan û navê wî kire Sultanê Iraq û Îranê.

Dîrokzan dibêjin:

peywerê islamê yê li Bexdayê keçek xwe jî diyarî Sultanê selcoqî kir, piştî mirina sultan Ertuxril biraziyê wî Alperselan şûna wî girt, vî sultanê xort û xwîngerm çavê xwe berda welatê rojava, wî zîrek û çavnasî di serê miletê kurd de xwend, ji wan re got:

Ew gawirên Bîzentiyan berhem û xêra welatê we dixwin, û welatê islamê lewitandine gereke hûn bi min re rabin em herin wan gawiran ji welatê islamê derxin wan bajon heta Yûnan û Romayê, wê çaxê bi sedan lehengên kurdan tev leşkerê Alperselan bûn û bi hêzeke cekdar û giran berê xwe dane rojava.

Di sala 1070 yê zayînê leşkerê Alperselan pêrgî leşerê Bîzentiyan bû, li devera Melazkurdê şer di navbera herdû artêşan de destpêkir, şer di navber sultanê Selcoqî û imperatorê Bîzentî de giran bû, kurdên çiyayê Xelatê û çiyayê Sîpanê û Agirî bi hana islamê ve hatin, bi sedan canfeda bûn, şervanên kurd di welatê xwe de, li ser xaka xwe şer dikin, leşkerê Bîzentiyan berbat kirin, ew tarûmar kirin, leşkerê Bîzentî bi serokatiya

de leşkerê Îranî paşepê vegeriya, di baweriya wan de wê leşkerê iskender bixin darikan,lê Mixabin dolaba wan çep geriya, leşkerê Mekdonî yê pehlewan û şerzan ew Şikandin û pişt ji wan sitandin û leşkerê Dara di cenga Esûs (Ersûs) de Şikeşt û berepaş vegeriya û cengê li ser axa kurdistanê berdewamkir ji Esûs li ser deriya spî, heta kermenşahê jî derbaskir.

Em karin bêjin:

Hezar û heşt sed kîlo Metre ceng û şer li nav kurdan bû bi hezaran kurd hatin kuştin, welatê kurdan berebat û wêran bû. Dîrokzan dibêjin: Raşte Dara şikeşt û xwe hemberî Iskender negirt û hate kuştin, lê lîderekî wî ew kuşt û çû ji Iskender re got: waye min Dara kuşt û ez û leşker em radeştî te ne, em di bin deştê te de ne, rabû Iskender ew lîderê bêbext û xiniz kuşt û bi lez cû di ser serê Dara re sekinî û berya ku canbide jê re got: Ey qiral kurê qiralan ne min tu kuştiye ji lewra şerme ez qiralekî weke te bikujim, û min kujerê te kuşt û bibêje tu çi ji min dixwazî?

Darayê sisiyan ji Iskender re got:

Ez bi hêvî me tu xwişka min Roksenê mehir bike û li miletê Iran û Tûrkan bi xwedî be.

Piştî van çend gotinan qiral Dara bi dilovaniya xwedê şabû, Iskenderê qehreman şîreta Dara bi cih anî, û Iran û Tûrkan dagirkir û berê xwe da welatê Hindê, lê mixabin li ser sînorê Hindê nexweş ket, û hinek dibêjin:

Hevalekî wî jehir dayê, rabû ceng rewestand û vegeriya heta nêzîkî Hewlêrê bû, bê hêr bû rabû wî jî çend şîret ji fîlozofê xwe re gotin, û li ser axa kurdistanê Iskenderê mezin sala 323 B.Z mir, temenê wî 33 sal bûn, piştî mirina wî Siloqiyan hukim li kurdistanê kirin.

Weke encam û nerxandin ji wê demê re:

kurdan seranserî welêt cangorî danîn, ziyan û gosirmetên bê hemta dîtin, bi taybetî kurdan êş, azar, kuştin û zirar di dema Iskender û cengên wî yên bê rawestan de dîditin, Kurd piraniya wan cengan êzingê şer bûn.

Lêkolîn

Cenga duyemîn

Di çîroka yekemîn de, me gotiye ku Rûmên rojava, yûnanî û mekdonî evîndarên tund bûn ji rojhilata navîn re, û her û her jî guhdarî li nûçeyên qiral û artêşa farisî dikirin, wisa jî dixwestin wî leşkerê serhişk û qehreman bişikînin, bi saya Iskenderê Mekdonî hatin armanca xwe bi cihkirin û Rojhilata navîn dagirkirin.

Bi vê dilgermiyê êlên turkan yên ku li rojhilataî deryaya Qezwînê bûn, karê wan qewxe û şer bû, beyabanên Sîn û Hindê meydana hespên wan bûn, wan çavnêrî dikirin ku roje-



Îskenderê Mezin û hespê wî Bûsefal li şerê Îsosê. Kitekita Mozaîka Îskenderî ya Pompeiyê ya ku îro li muzexaneya arkeolojîk a Napoliyê tê dîtin

de bike. bi xwe re razîne wê kurê wê çawa mezin bibe?

Iskenderê Mekdonî, û Iskenderê Mezin û Iskenderê du stiruh di mala du Lehengên balkêş de mezin bû, wisa jî li ser destê fîlozofekî bi nav û deng wekî Eristo perwerde bû, ew hînî felsefeya jiyanê û fermandariyê dikir.

Filîp mir kurê wî Iskender şûna wî girt, bû fermandarê mekdonya yê, vî xortê kelgerm û serserî gelek ceng li welatê Yûnan û Mekdonyayê li darxistin, carnan têk diçû, carina biserdiket, lêbelê her û her çavên wî û fîlozofê wî li welatê Rojhilat bû, ji lewra Eristo jê re digot: li Rojhilat şaristaniyeke pêşketî heye, li Rojhilat miletê Iran û Tûran heye, imperatorê wan pir payebilnd e, yek caran jî êrîş Yûnan û Rojava dikin dixwazin Esîna dagir bikin, Eristo û çend lîderên mekdonî Iskender sorkirin, handêrkirin ji bo ku berê xwe bide Rojhilat.

Iskenderê du stireh leşker û hêzek giran û çekdar amade kir, fÎlozofê xwe Eristo bi xwe re karkir û berê xwe da Rojhilat li devera Esûs yan Efsûs (iskenderon û Ersûs) Li ertêşa Darayê sisiyan rast hat şerekî xwîndar û dîrokî di navbera artêşa Iskender û Darayê Îranî de li dar ket.

Di wê cengê de, di wî şerî

Çîroka sê cengên giran li ser xaka kurdistanê

piştî vê serkitina Osmaniyan bi saya leheng û pakrewanên kurdan, kurd bûne navmalî û gerdevanên mizgeftan.



Abbas Ismaîl

Cenga yekemîn



Împeratoriya Îskenderê Mezin

Sala 356 b.z kurek ji fermandarê welatê mekdonya Filîp re çêbû navê wî kire Iskender. jina Filîp diya Iskender navê wê olîm bû, jineke mekdonî sinc sosret û qehreman hewesa wê mar di himbêza xwe xwedikirin bû, ma jineke ku dinanê maran rake, wan perwer-

Lêkolîn

www.arsivakurdi.org

Jêder:

1- Arya kevnar û Kurdistana maynde -R 47- Selewat Gulyamo.
2-Neştecihên kevnar ên di navbera du çeman û li Sûriya bakur de –R76- Can An Kilod MAGRON.
3-Kurd û Kurdistan-P1-R99- Mihemed Emin Zekî.
4-Koka Ereban –R30- D. Cewad Elî.
5- Malpera fermî ya êla zarwên Eqîl.
6-Malpera iliktronî pirtûkxana burca çavdêriyê.
7- pêşiyên (bavikên) Kurdan –R 149- D. Ehmed Xelîl (Sozdarê Mîdî).
8-Rehên Kurdan . Piroto Kurd û Mîtanî – R 80 – Nazim Kok.
9- Kurd û Kurdistan – B2- R20- Mihemed Emîn Zekî.(11)
10- Mîdiya- R 107 – A.M.Diyakon.
11- Kurd û Kurdistan – B2-R24 – Mihemed Emîn Zekî.
12- Dîroka welatê Ereban – R 269- D. Fêsel Evdele û D. Îd Mer'ê.
13- Xuyakirina Kurdan di dîrokê de – D. C emal Reşîd – ji gogel.
14- Horî: Dîrok û şehristaniya wan – R 19- Cirnot Vîlihlim.
15 – Kurd û Kurdistan – B1- R 108 – Mihemed Emîn Zekî.
16– Dîroka welatê Ereban – R 294 – D. Fêsel Evdele û D. Îd Mer'ê.
17 – Kurte dîroka Sûriya kevnar – R 146 – Mihemed Herb Ferzat.
18 – Horî - Dîrok û şehristaniya wan – R 83- Cirnot Vîlihlim.
19 -Manîfisto , doza Kurdî Q 5-R 95 – Ronakbîr Abdullah Ocalan
20- Pêşiyên Kurdan – R 210 – D. Ehmed Xelîl.
21– Mîdiya– R 209 – A.M . Diyakonov.
22– Jêderê borî – R 260 – A.M.Diyakonov.
23 – Kovara dengê Kurdistan – Hijmara 70 – Evdele şikakî (Qerman).
24 – Mîdiya - R 173 – A.M. Diyakonov.
25 –Manîfisto , doza Kurdî Q 5-R 94 – Ronakbîr Abdullah Ocalan
26 – Mîdiya – R 187 – A.M. Diyakonov.
27 – jêderê borî – R 319 – A.M. Diyakonov.
28 – Kurd û Kurdistan – R 113 – Mihemed Emîn Zekî.

www.serkurd.org



ferehbûna xaka wan a ku digiha ta Filestînê. Berya ku ew şer ragihîne dijî Sîtiyan û Aşûriyan wî xaka dewleta Manayê ya kurdî rizgar kir û ew bûne hêz di şoreşa wî de.

Keyexsar dest bi êrîşên leşkerî dijî Sîtiyan kir û xak bi ceng li dûv cengê rizgarkir. Piştre berê xwe da dagirkerên Aşûrî, lê wî zanî bû ku divê hêzeke mezin hebe dijî wan, lewra wî têkilî û dostanî da dijminên berê û konfederasyona Medan ava kir(25) ji serok û mîrekên Mîdî, Sîtî û Kildanî. Keça xwe Omîd (Omîdsa) da Nibûxiz Nesir ê kildanî, xwedya gulîstanên Babil ên hilawîstî. Keyexsar peyman bi Kildaniyan re muhur kir dijî Aşûriyan, Kildanî Babil, ji başûr ve êrîşî paytext Nînewa bikin û Mîdî ji rohlat û bakur ve. Mîdiyan karîbûn bi cengên giran ji 615-612 b.z bikevin Nînewa de û desthilatdariya padîşahê Aşûrî Zîn Hak Îşkom (Zihak) bi dawî bikin di 21 Adarê de, wê rojê bixin Newroz û sersala Kurdî.

Ewan miletan xwe kirine yek dijî Aşûriyan ji bo xwe ji êrîş û stemkariya wan li herêmê xilas bikin(26) . Keyexsar piştî dewlet rizgar û xurt kir, nakokî mane ne sererast kirî di navbera wî û Lîdiyan de, lewra şerekî giran 6 salan ji 590 -585 b.z berdewam kir. Ew şer rawestiya dema ku Roj xirabû û wan got nexwe Roj ji me xeydiye, Şer rawestandin. Piştî wî şerî têkilyên aştiyane di navbera wan de ava bûn, dema ku Estiyax kurê Keyexsar bû zavayê padîşahê Lîdî Îlyatis ji keça wî Arînasê.

Piştî mirna Keyexsar 585 b.z kurê wî Estiyax bû padîşah, lê neviyê wî Korş ê Exmînî yê ji keça wî Mendana bi alîkariya serokleşkerê wî Xorpak dewleta Mîdî herifand û dagir kirin 549 b.z.

Di rûyê Exmîniyan de sê şoreş rabûn: Ya Kaomata 522 b.z û ya Xoşrîta Firaorta û ya Gotran Tixoma, lê padîşahên Exmînî yên weke Daryos bi serkutkirin ew tune kirin.

Di dema Iskenderê Meqdonî 333 b.Z de, herêma Mîdiya hinek mafê xweser bi dest xist.

Mîdî di sînorên xwe de gihabûne ta Derya Spî li Sûrî û navê Sûrî hingî bû welatê Sûrmîd (27). Ji layê Rojhilat ve gihabûne Evxanistanê.

Di wan deman de navê Kurdan diyar dibû bi Kardox. Efserê Yonanî Ikzanfon di pirtûka xwe ya dîrokî Anabazîz (28) de dibêje: Dema em ji zindanên farisiyan derketin di şerê bi navê Mîdî - Farsî de, em di xakekê re derbas bûn 401 b.z, jê re digotin Cezîretayê Kardo.

niha) dijî Aşûriyan û giha ta Mereşê.
3- Dema qelsbûn û herifandinê: Di şerê navbera Serdorê dyuemîn û Toglat Bilaserê duyemîn ê Aşûrî de, di encamê de Kaltî şkestin.

Dema ku padîşahê kaltî Rosa kurê serdarê duyemîn dît ku Aşûrî mijûl in bi şerê Mîdiyan re 734 -714 wî paytext vegerand û karîbû ku 33 mîreşînan vegerîne li herêma gola Sîvanê û peyman li başûr bi padîşahê Mosasîrê re li dar xist nêzîkî Rewandozê û 22 kelh rizgarkirin ji Aşûriyan li herêma Kurdên Manayî.

Sergonê duyemîn bi artêşeke xurt berê xwe da xaka Kaltiyan û kuştin, şewtandin û talan kirin bikar tanî bi şêweyê hovane (21) Berê xwe da paytextêTorşeba û dagirkir, padîşahê Kaltî (Xaltî) Rosa xwe ji qehra bi xencera xwe, xwe kuşt.

Rosayê duyemîn 685-650 têkilî bi Sêmeryan (Kêmerî) re ava kirin û xwest ku aşîtiyê bi Aşûriyan re pêk bîne, lê padîşahê Aşûrî Aşûr Panîpal ew yek red kir.

Piştre navên van padîşahan: Serdarê (4) û Rosa yê (3) û Rosa yê (4) di demek tarî û nezalal de ji dewletê derbas dibe berya ew were dagirkirin ji layê Aşûriyan ve û ji aliyên wan ve bi nave Nayîrî Ayîrî û Orarto hatin naskirin.

MANEYÎ: 1000-580 b.z

Ev xelkên Gotî û Loloyan e, tevlî Hûrî û Mîdiyan bûn, carnan ji wan re dibêjin Mîsanan (22) Paytexta wan Ezêrta bû, 50 k.m li rojihlatê bajarê Sekizê, li rojhilatê Kurdistanê, li Şino, M ehabad, Sekiz, Zêwa, carnan jî ta bi çemê Arasê bû.

Hertim di bin destwerdana Aşûriyan de bûn. Kuştinên navxweyî çê dibûn ser deshilatdariyê, nexasim di dema padîşah Îranzo yê karî bû dewletê xurtir bike (23). Piştre di dema kurê wî Aza de, mixabin wî pişta xwe bi Aşûriyan xurt dikir dijî Kurdên Xaltî. Dema Mîdiyan gel rizgar kirin ji Aşûriyan Manî jî azad kirin.

MÎDÎ: (MAD) 727-549 b.z:

Paytexta wan Cehmezan bû, li cem yonaniya Akpatana ye(24). Niha navê wê Hemezan e, li dawiya Rojhilatê Kurdistanê ye, ew dewlet serdestê Diyako ava bû, ji van êlên Kurd: Bodî, Arîzanto, Bosî, Mîtanî, Partaktî û Moxiyan. Aşûriyan bi xinizî Diyako di mla xwe de kuştin. jêderin dibêjin ew sergonî bajarê Hemayê li Sûrî kirin, vê yekê dewlet qelis kir û bû bingeh ji êrîş û dagirkerên Sîtî re jî, kurê Diyako yê nave wî Firaorta nikarî bû dewletê biparêze ji destên Sîtiyan.

Piştî Firaorta kurê wî Keyexsar bi lehingî tol ji Aşûriyan û Sîtiyan hilda.

Keyexsar hêzeke leşkerî ava kir, ew hêz ji kom û tîm û tûgayên piçûk û mezin bû, li kêleka wan de segvanên bi tîran û tabûrên peyade hebûn. Wî şoreşa xwe ragihand dijî Sîtiyan ên ku qels bûbûn ji sedema



tatama de, Hîtî bi ser ketin û piştgirya Matîwaza (17) kirin û keça xwe danê û bû leystik di destên wan de, ta ku ew bûn xwediyê desthilatdariyê û bi demê re dewlet dagir kirin.

Padîşahên Horî-Mîtanî:

Kîrta yê yekem, kurê wî Şotarna yê yekemîn, Partarna Kîrta, Harsa Şatar, Artatama yê yekemîn, Şotarina yê duyemîn, Artaşiwara (Ariştomara), Toşrata, Artatamayê duyemîn, Şotarina yê sêyemîn, Şatwara yê yekemîn, Wazaşta, Şatwara yê diwem, Alta Tîşop û Dava Zer.

Hîtiyên ku ew jî Arî ne welatê wan dagirkirin, lê ketine bin bandora wan a Olî û Çandî de, bi taybet di milê Ziman de. Wilo Mîtiyan bandor li Kaltiyan (Ararato)(18) û Mîdiyan jî kirin.

kaltî yanî Xaltî – Ararato-1300-700 b.z:

Paytexta wan bajarê Wanê, yanî Torşeba bû. Ermenî jî vê dawiyê tevlî Kurdan bûn û bi hev re desthilatî dikrin û çanda xwe di bara Aşûriyan de paristin(19) dewlet li herêma gola Urmiyê, çiyayê Agirî yanî Araratê, gola Wanê ta çiyayê Şengalê bû, ta niha êla herî mezin a birayên me yên Êzîdî Navê wê Xaltî ye.

Dewlet di sê qonaxan re derbas bû:

1-Dema parçebûyî : Bi şêweyê mîreşînên piçûk ên nehevgirtî bû,Lewra kaltî ketibûn ber êrîşên dijwar ên Aşûriyan de, lê padîşah Aramî 860 -843 b.z ew êrîş hinekî rawestandin.

2- Dema hêzbûnê : Ev serkeftin pêk hatin li ser destê Sardor (Serdar) ê yekemîn 832-830 B.Z, ê ku paytext Torşeba xurt kir û di şerên sîmeryan de bi ser ket. Piştî wî padîşah Esponî gundê Mosasîr Bakurî Rawendozê (Micêsîr) ji Aşûriyan rizgar kir û giha Helebê, Girêsipî û derya Reş.

Dewlet xurtir bû di dema Mînwas û Argiştî yê yekemîn de. Gihane ta bajarê Mîşte li Rohlatê Kurdistanê û başûrî gola Urmiyê û ta Meletya, li Rojava û gola Sîvanê li Ermîniya û bajarê Erzircan û Erziromê. Padîşah Argiştî yê yekem(20) 786-760 b.z, pirek ser çemê Arasê ava kir û Kelih li cem bajarê Yêrîvanê li Ermenîstanê ava kirin 6600 b.z û kete berberiyê de bi Aşûriyan re, ta giha Kerkûkê (Arabxa) û karî bû ku dewleta Manayê (Mîsaniya) ji wan Aşûriyan rizgar bike, li Rohlatê Kurdistanê .Piştî Argiştî, Serdarê duyemîn serkeftin berdewam kirin dijî Aşûriyan û ew parçeyên xaka ku hatibûn dagirkirin rizgar kirin û giha ta bajarê Lobîlo li Azirbêcanê û kete hevbendiya Arpat de (Bajarê Tilrefet li bakurê Sûrî ya

www.sermolavakfi.org

desthilatdariya Kaşiyan herifandin, Lewra kaşî vegeriyan herêmên xwe yên berê. Kaşî bi zimanê xwe jî nêzîkî Êlemiyan ne (13) û dema Mîdî hatin ew mane di nav wan de xwedî rol.

Soberî - Zêbarî - Sobarto 2000 ta 1100 b.z:

paytexta wan bajarê Melazkurdê bû. Ew ji hûriyan bûn. Dîroknasin dibêjin ku navê wan ji navê Horiyan hatiye. Xor (Sor) yanî Roje, zimanê wan yek e(14)

Tiglat Bilaser ê Aşûrî ew şikandin 1110-1100 b.z Dema bajarê wan ê mezin Şirîş dagirkir, di wê demê de Kurdên kaltî xwedî dewlet bûn. Lewra li başûrê dewleta wan a li Agirî û Wanê wan Aşûriyan navên kurdan kirin Nayrî (15) .

Hêjayî gotinê ye ta îro Sobarî di Kurdistanê de hene bi navê Zêbarî.

Horî-Mîtanî 1550-700 b.z:

Paytexta wan bajarê Waşokanî bû, liser çamê Xabûrê li rex bajarê Serê kaniyê .

Horîmîtanî - ketne şerên giran de bi Ferûnên Misrê re. Wan berevanî kirin di ber Sûryê de, bi saya hevbendiya Qadiş (Tilmendo li Kêleka Himsê ye).Peymana Qadiş ji van mîreşînên Sûrî pêkhat: Mîtan, Oxarêt, Amoro, Tonîb, Niya, Nûxî û Qadiş.

belgeyên Misrî yên dîrokî diyar dikin ku Tihotimisê sêyemîn digot min hemû welat û Sûrî kiriye bin destê xwe de, lê ew padîşahê Mîtanî ew ê serserî di riwê min de radiweste û nahêle ez bighim Rojhilatê çemê Feratê, lê ferûnan piştre têkiliyên aştyian e bi wan re pêkanîn, dema keçên wan ji xwe re anîn, mîna Nefertît (Gilo Xîbad) bû hevjîna Eminhotibê çaremîn (Exnaton) û berya wê Matmaya bû hevjîna Tihotimsê çaremîn.

Horîmîtanî diketne şeran de bi Aşûriyan re û bi ser diketin ji 1550 -1250 Aşûrî mane dibin destên wan de(16) .Lê rêveberya xwe ya xweser dimeşandin. Şerên wan bi Hîtiyan re nêzîkî 1250 de hîtî bi ser ketin dijî wan, ji sedema nakûkiyên navxweyî di navbera malbatên Toşrata û Ar-



www.arsivakurdi.org

navê wî Nisêbîs bû, piştre paytexta xwe Orkêşê 2500 B.Z ava kirin a niha dibêjinê Girêmozan, rohlatî bajarê Amûdê 6 k.m, têde perestgih û avahiya padîşahê wan Topkêş hatiye dîtin, di nav wan de şêrê Qrkêş (Amûdê) ku niha di muzexana Lûver a Ferensî de heye.

Horiyan li deşta Hemkê mîreşîna Alalaxê li ser çemê Asî ava kirin 2700 b.z û gihane Oxarêt.

Ew dihatin nasîn bi navê Sobarto, navê Sûrî di dema wan de welatê Horo û carinan welatê Soro bû Horî mane bi vî navî ta 1550 b.z . Piştre hatin naskirin bi navê Horîmîtanî (8) .

Lolo yan Lolobî 2750-828 b.z:



Paytexta wan Zîmrî bû, li herêma Silêmaniyê , li Hûrîn û Şêxan û Xorato û Zihaw û Kerkûkê belav dibûn(9), bi wan re Cûdî jî hebûn, gihana ta Efrînê, çimkî şûnmayên wan li çiyayê Gewir yan Emanosê hatine dîtin, ew di dema Akadiyan de nexasim serokê wan Naram Sîn(10) di berxwedananê de bûn.

Têkiliyên wan bi Êbla re jî li Bakurê Sûryê xurt bûn. Nîşana vê yekê, dema padîşahê Êbla ji padîşahê Xomazî (Lolo) leşkerên perwerdekirî û mêrxas diwxaze ji dêla wan wê 11 perçeyên ji kelûmelên malan ên bi nirx û ji tep û bi wan re du ristikên gerdeniyan giranbuha jî bide wan.

Di dawiyê de ew li ser destê Şilîmenserê sêyem ê Aşûrî şikestin. Ta niha li Kerkûkê êla Lolo heye.
Piştî wilo ew tevlî dewleta Kaltî ya Kurdî li Wanê bûn û bi padîşahê wan Sardor (Serdar) şer û berxwedan kirin dijî Aşûriyan û têkçûnên mezin ji Şelmaserê sêyemîn re pêkanîn.

Kaşî -Kaşo 2525-1157 b.z:

Ew li van deveran bûn: Cezîra Botan – Mêrdîn – Çiyayê Toros – Çiyayê Zagiros – Beravên kendava Lor (kendava jê re dibêjin Erebî yan Farisî) 600 salî desthilatdarî kirin li Somer û Akad bi navê Kurdoniyaş(11) bi alîkariya Gotî û Loloyan, bi serokatiya padîşah Xandîş ê ku karîbû Babilê desteser bike1725-1705 b.z.
Di sala 1700 b.z Ako Kararîm di şerên giran de Hîtî şikandin û kete paytexta wan Xatoşa de, lê dagir nekir, wî peykerên xwedawendên Merdox û Xor Panîtom vegerandin.

Têkiliyên Kaşiyan bi Fer'ûnên Misrê (12) re gelek xweş bûn, kaşiyan çend keçên xwe dane wan, mixabin di dema şerê Fer'ûniyên Misrê bi Mîtaniyên pismamên wan re Kaşiyan alî Fer'ûniyên kirin.

Êlamiyên ku ew jî Kurd IN



(Têrîkan)(3)Têrîxan kuşt û dewlet dagir kir.

Êlem: (4000 – 800 b.z)

Paytexta wan li Rojhilatê Kurdistanê ye û bi navê "Şûşa" (Soza) tê naskirin.

ji wir belav bûn ta herêma kendava Lor(4) (Xelîc Erebî – Farisî) li Başûrê Iraqê û ketine şeran de bi Akadiyan re nêzîkî sala 2250 b.z.

Êlamiyan bandora xwe ya zimên li Akadiyan kir di dema serokê Êlamî şoşînak de. Wan têkilî bi Gotiyan re girêdan di dema Bozor AnŞoşînak de,û dewlet xurt bû. Vê yekê hişt ku êlên herêmê û dewletên piçûk xwe bixne bin desthilatdariya Êlem de. Serkeftinên Êlemiyan dijî akadiyan hişt ku kurdên Lolo û Gotî ber bi deşta Mezopotamiya jêrîn ve biherikin û rola Akadiyan qels û tune bikin.

Êlemiyan berê xwe dan Babil(5) û destên xwe danîn ser bajarê Or û padîşahê wê Êbîsîn dîl anîne paytexta xwe.

Wê xurtbûnê berdewam kir di dema malbata Sogilmah de, di 2000 b.z. Padîşah Xopan bajarê Ontaş û Zekûra Cogazbîbil ava kirin .

Padîşah Şotrok Naxontî çemê Olay (Karon) derbas kir û bajarên Aşnona ,Dorîkalîcarzo, Sîpa û Obîs desteser kirin û di şerê Babiliyan de serket û dewleteke herî mezin ava kir.

Di dema padîşahê Êlamî Kurdor Naxontî de şerê giran pêkhat di neqeba wî û Kaşiyan de,yên ku ketibûn Babil de û piştî wan şer qewimî di navbera wan û Akadiyan de, di dema padîşahê Êlemî Şolhak de, yê ku binket di şerê Akadiyan de.

Di sala 750 B.Z de, Êlamî û Babilî bûn yek dijî Aşûriyan(6) lê Aşûr Banîbal bi serket û Soza dagir kir,piştre Êlamiyan xwe kirin yek bi kurdên Mîdî re ta ku xaka xwe bi serokatiya Mîdiyan rizgar kirin û tevlî dewleta wan bûn.

Horî *xorî: 4000 -750 b.z

Destpêkê ew xwiya bûn li Rojhilatê Kurdistanê li Rojavayê gola Kespînê.

Rînê Labat dibêje: Horiyan girêdan pêkanîn ser pişta hespên xwe ji heremên Aşûrî, Ermenî, Enatoliya û Sûriya banî, bi girêdanek netewî çandî(7). Nisêbîn ava kirin, dema ku



Lêkolîn

www.arsivakurdi.org

Çirûskin li ser dewletên kurdî di dîroka kevnar de

navê Sûrî di dema wan de welatê Horo û carinan welatê Soro bû Horî mane bi vî navî ta 1550 b.z. Piştre hatin naskirin bi navê Horîmîtanî.



Biradostê Mîtanî

Gelê Kurd li ser xaka xwe ya Kurdistanê ye, ji dema mirovên kevnar Arktos, melyonek û nîv sal berê, û mirovê Niyandirtal 500 hezar sal berê, û mirovê Kiromayon 50 hezar sal berê . Wilo ta dema mirovê şereza (Homo Sapyans) û gemiya pêxember Nûh 6000 b.z yê (S) û kurê wî yafis ê bavkê nejada Arî ye. Ji destpêka şehristaniyê ve Gelê Kurd ev dewlet di dîroka kevn de ava kirin:

Gotî,Kortî,Kotî,cûdî,kurdî 7000-2109 b.z(1)

Kotî çiyayê Toros bûn û xwediyê herêma çiyayê Cûdî ne,li Mezopotamya jorîn xwedyê çandiniyê û lawirvaniyê ne. Çûne Somer û ew pêşxistin, bi qasî 125(2) salan, bi serwriya 25 padîşahan.

Hin ji wan padîşahan ev bûn: Îmta, Îna Keyîş Aş, Cûdya ,Serlaka, Şolma, Îlolomaş, Înîmabagaş, Înîkşom, Ayarlagap, Îpata, Ayarlankap, Koro Xapîlkîn, Layrabûm,Îrarom, Îpranam, Xaplom, Bozor, Ayar Lakand, Sê Awm û yê dawî Tîrîkom (Tîrîxan).

Kotiyan di şerê bi navê Oman Manda de imperatoriya Akadiyan şikandin û ketine paytexta wan bajarê Akad de û gihana bajarê Babilê di 2250 b.z.

Serleşkerekî Akadî bi navê Aotokeykal di 21 Adarê 2109 b.z de derbeya leşkerî li wan da di cejna Beranan de û padîşahê Gotî yê bi navê

ev jî bêguman rengekî nûjen û warekî şehrezaye ku helbesvan di van malikan de pêkanîne, ku vêre pirs û bersiv têne lidarxistin, û wêneyekî pir sipehî ji rewşa kurdên penaber û bê welat re bi zanebûn dide nasîn. Bi şewat û nalîn sedema giriyê xwe ji xelkê re dide xuyakirin, ku ew sedem jî dûrketina ji welêt e, lê mixabin kesek li biyaniyê pêre nagirî, alîkaryê di xemgîniya wî de nake, bi van gotinên tiracîdîk û bi şewat û bi bandor bi tenêtiya xwe, ku ew jî bi tenêtiya hemû kurdên bê welat dide xuyakirin û dibêje: lê wan ti ne gote min: «Kurê min!» tu zarokî ne gote min «bavo»!
Derketî li her derê bi tenê ye!

Em karin bêjin: Ku li vir Dektor dikeve nava hest û ihsasên xw yê kûr û dûr de, bi awayekî monolog êş û bêzarya di nava xwe de derdixe derve û bi firûşdan û sembol jî di vir de malikên xwe organîze dike, ew jî çaxa bi tena xwe digirî û kesekî din li xerîbyê vêre nagirî, ango dost û alîkaran ji kurda re nabîne, mîna kurd jî dibêjin: ji çiyan pêve dostên kurdan tu kes nîne.
Doktor xweşî, rihetî û serbilindya xwe li welatê xwe ne li yê xelkê dibîne. Doktor vî tiştî ji dûr ve nîşan dide, şîreteke pir di cih de li xelkên kurdistanê dike û dibêje: Heval, bav û bira, xweşî, rehetî, û serbilindî bi tenê li welêt hene.

Ango gelî kurdan…hûn li derveyî kurdistanê penaber û derketîn e, ji bilî vê kurdistana rengîn xweşî û rehetî û serbilindayî qet ji we re nîn in.
Lê Doktorê helbestvan qêrîn û girî ji kurdan re şerm û eyb dibîne û bi xurtayî doza şoreş û raperînê li wan dike, hêviyên xwe pir di paşerojê de dibîne, nav di kurda dide û wan bêhtir bi ceger û hêrz dike, lewra bi rengekî dîscurs bang dike û dibêje: Derketiyê reben! Ev girîn û zarîn besin! Pirkes ji welêt hatine dûr xistin…..Hêvîya xwe vejîne, û xwe ragire, tu jî dê rojekî bigihî miraz û armanca xwe, heke îro nebe jî…….sibê!

Bi peyva - besin – helbestvan tabloyên du pêvajoyên netewî tîne hember hev, ango cudabûnê dixe navbera du pêvajoyên ku pêwistiya wan bi tekoşîna kurdan re hene, yek jê pêvajoya girî, zarîn û bêmecaliyê ye, ku ew jî ji peyvên mîna – reben – girîn – zarîn- têxuyakirin, ya din jî pêvajoya raperîn û berxwedanê ye, ku ew jî ji peyvên mîna – hêviya xwe – vejîn – ragire – bigihê – miraz – armanc – têxuyakirin. Dektor di vê sirûda xwe de, gelek omîd û hêviyan dixe dilê miletê kurd de, ji wan re dibêje: Gelî kurdan paşeroj li hêviya we ye, rabin xwe vemalin û li hêviya tu tiştî xwe ranegirin, îro roj roja we ye rabin bi mêranî, rabin bi hewar, qêrîn û raperîn, mafê xwe bistênin. Dîsanê di van pitikên dawiya rêza helbestî de, xwînerên xwe dixe nav fikar û ramanan de û dihêle ji xwe bipirse û bêje: Gelo ev helbestvan di sirûda xwe de çi dibêje.. û ji min çi dixwaze…?. Wiha gernasê kurd siyasetmedar û helbestvan, Dektor Nûredîn Zaza, bi ezmanê kurdistanê ve hildiperike, destên xwe davêje roja ku dibin ewrên reş de mayî dadixe ser hêrik û çiyayên welatê xwe, şevên tarî li kurdan ronî dike û li ser gastînên azariyê dike qîrîn û hewar, nav di miletê xwe dide û dibêje: Rabe gazin û girî bi kêrî te nayên, rabe kurdo dest û lingan vemale, vaye roja azadiya.

Ev dar spehîn e, ev kulîlk xweşik in: Lê ev ne dar û kulîlkên, welatê min in: Tu tiştî nabêjin min. Derketî li herderê bi tenê ye! Ev çem bi dilekî şikestî li deştê Diherikê: Lê xwirina wî ne wek çemê me ye, ku min di zaroktiya xwe de dibihîst, ev tu tiştî nayinê bîra min. Derketî li herderê bi tenê ye! Ev stran şêrîn in, lê ahengên wan ên geş û zîz ne wek yên welatê min in.

Peyva /derketî/ jî peyveke bi azar, êş û dijwar hatiye bicihkirin, navnîşaneke pir di cihê xwe de hatiye, bi vê peyvê helbestvan dide xuyakirin, ku herdem li welatê xerîbyê xwe bi tenê,bi kul, êş û keser dibîne, bi dilzarî xwe bera nava dîroka miletekî perîşan û hejar weke miletê kurd dide, ew miletê ku herdem ji welatê xwe ji ber stemkariya dijminan derketiye, û herdem di welatê bav û kalên xwe de mêvan, bindest û xerîb maye. Navnîşana xweşxaneyê, wêneyê vî derketiyê çolan, mîna wêneyê wê qitika ji refê xwe qetyayî tîne ber çavê mirov, û hêsrên mirov vêre vêre tîne xwarê.

Ango D.Nûreddîn Zaza hest û rivîna cerg û dilê xwe, di vê sirûdê de derdixe, ku ew jî ji ezmûneke piraktîk ji jiyana wî ya tiracîdîk der tê, ew xwe dûrî welatê xwe penaberê derketî, xerîb û bi tenê dibîne, li xerîbyê sira bayê welêt li serê wî dixe, tê bîra wî ku welatê xelkê tucaran nabe welatê mirov, ta çiqasî dar û kulîlkên welatê xelkê xweşik û geş bin jî, lê ew kulîlk û zevî û ew devî û dar nabin zeviyên welatê kurdistana wî ya şêrîn û bi rûmet, tu watayê ji vê xurista welatê xelkê re di jiyana xwe de nabîne, û jêre diyardeyeke bêhavil vala û bê wateye. Ne bese dar û kulîlkên welatê helbestvan nabin mîna yên biyaniyan, lê rûbar, çem û cobarên wan jî ne mîna yên welatê wî ne, ku ev çem û rûbar tu tiştî nayênin bîra wî, ta bi stranên xerîbiyê ne weke stranên kurdistana helbestvan in, aheng û awazên kurdistanê jî ne mîna yên biyaniyan e. Û careke din helbestvan kul û derdên xwe wiha tîne ziman:

Derketî li herderê bi tenê ye! Ji min pirsîn: (Çima hergav bi girînî?) Gava min sebeb gote wan, tu kes bi min re negirî. Derketî li herderê bi tenê ye!Min kalin dîtin, zaro li wan hêwirîne, mîna zeytûnên kevnare ku kelem û derxil li wan hatine hev, lê wan ti ne gote min: «Kurê min!» tu zarokî ne gote min «bavo»!
Derketî li her derê bi tenêye!

Ev dûbarekirina gotina – derketî li herderê bi tenê ye- didê xuyakirin ku xerîbyê bêhawe bandora xwe li vî helbestvanê netewperêz kiriye, ku welatê wî hevqasî li ber dilê wî şêrîn e. Lê tê xuyakirin ku ev malikên ha bi warekî diramatîk hatine lidardixistin û



erên wan li ser kurda pêktînin diafirîne, ew jî di van gotinan de têne xuyakirin, mîna - nokeran - sûtî - kuştin - zindan - hîle - hiner - bêsincî.

2- wêneyên xezanî û belangazya miletê kurd, bi van gotinan diyar dike, mîna - bindestî - reben - pêxwas - birçî.

Wiha bijîjkê me, şêwe û wêneyên lêkdayî pir bi wate û di cihê xwe de ji helwesta van dagerker, xapînok û tepreşên Inglîzan re, ku Kurdistan dagerkirine û bi xwîneke sar dane destê xelkê diafirîne. Ev Inglîzên ku ji sedê salan de bûne xwedî ezmûn û tecrîbêyên tepreşî, ku ezmûnên xwe hemyan li ser kurdan pêkanîne. Ji ber ku herkes dizane, navdarya inglîzan di vî warî de çiqasî dijwar û xedar e. Van inglîzan bi hemû hawayan dijîtiya kurda bi dijwarî kirine, mîna helbestvan dibêje: Geh bi nermayî û geh bi kuştin û geh jî bi peyman û mîsaq kurd xapandine û petrola wan li xwe, kole û nokerên xwe parkirine, ku kurd ji dûv wan bêpar, birçî, reben û pêxwas mane.

Ev tabloya ku bi zelalî rûreşya siyaseta Inglîzan, ku li hemberî kurdan pêkanîne, bi van wêneyên xw yên fotografî û zelal, ji xwînerên xwe re dide xuyakirin, weha helbestvan bi awakî zanistî dîroka bindestiya kurdan derdixe holê, û bi rêbazî ji pêşgotinê ta bi dawiya wê ve diçe, ji ber wilo helbesta xwe bi şêweya helbesteke mîna narative yan vebêjiyeke dîrokî û riyalîzm rêz dike, ji ber wilo sirûd yan xweşxaneya me hinekî bê xeyaleke helbestî maye. Lê careke din em dibêjin: Ku li ser daxwaza (Ferîde Xanim), hevjîna egîtê kurd yê bi nav û deng Dr.N.Dêrsimî, çend rêzên helbestvanê me Dr.N.Zaza, li ser kêla ber serê Dêrsimî ku di goristana (Kefer Cennê) de, li hindama Helebê de hatiye veşartin hatine neqişandin. Û rêz jî evin.

Li ser vê rêya dijwar
Min jî kire pir hewar
Da ji bo we jî rojekê
Dinya bibe gulbehar

Ev kurte rêzên helbestî, bi dilsojî û bi ritim, mozîk û kêş, pir xweş û bi hest hatine rêzkirin, ew jî di peyvên – dijwar – hewar – gulbehar- de têne diyarkirin. Careke din tê xuyakirin ku helbestvanê me bi xwe jî, di nav agirê azadiyê de hatiye sûtin û armanca xwe û ya xwediyê gorê çaxa li dinê bû mîna hev dibîne, û weke mirovekî têkoşer û bi bawerî dibîne, ku wê rojekê ji rojan kurdistan azad bibe, û bi rengekî dilsojî nîşan dide, ku kurdperwerê vê gorê D.Nûrî Dêrsimî û hevalên wî yên hê li jiyanê dijîn û sax in mîna wî qehreman û şoreşgêrên welêt in, bi canfîdayî dane ser şopa serxwebûn û azadiya welêt. Lê ev canfîda bûna wan û ya xwediyê gorê jî, herdem ji bo miletê kurd de, li ser zimanê xwe û xwedyê gorê gazî miletê kurd dike, ku zanibe ev dijwariya milet tê ve derbas dibe, wê bêguman pişt re çira azadiyê li şeva kurdistanê ya reş û tarî vêkeve, wê cîhan bibe warê newroz û biharan, û xaka kurdistanê wê bi gul û çîçekan bê xwemilandin. wê cilên bindestiyê bi timametî bêne çirandin.

Derketî. Derketî li herderê bi tenê ye!

dide nasîn, ku Kurdistan bê şer û tivingê azad û serbixwe nabe. Ev têkista helbestî jî, bi şêwaza (discurs) hatiye rêzkirin. Û peyvên wê ji çirûskvedana şewata giyan û dengê ahîn û nalînên ne yên - Nûreddîn Zaza bitenê jî, lê yên miletê kurd tevan - di xwe de bi keser û hesret dicivîne. Helbestvan bi wilo tenê qayil nabe, êrîşeke dijwar dibe ser dagerkerên kurdistanê û alîgir û nokerên wan jî, ku van dagekeran mîna xwîn xwarên axir zeman dipesinîne û tewanbar dike.

Rêza helbestî /xwîn xwarên axir zeman/ du wêneyan di naveroka xwe de dicivîne.

Mirovê xwîn mij, ango wêneyeke hovîtî mîna dirakola ji dagerkerên welêt re diafirîne, û ji bilî kuştina miletê kurd jî, ev dagirker xêr û xêratên wî jî dimijin û talan dikin.

wêneyê din di peyva /axir zeman/ de dicive, ku ew jî wêneyek paşverû û bêpargêl dide dagerkeran, ango helbestvan dibêje: Heçî ev dagerker û destlatdarên Kurdistanê ne, ew li derveyî warê mirovatiyê ne, xwînmij û hefnikîn e. Lê peyva herî bi wate ku li vir cihê xwe baş girtiye, peyva/sêwlek/ e, ku helwest û rewşa zarokeke beradayî û kurtêlxur ji van dagirker û xwîn mijan re dide nasîn, mîna navê /Seîd/ ku ew jî Nûrî-Eseîd e, ku demekê serokê wezareta Iraqê bû, piştre Ebdilkerîm Qasim di sala 1958 an de, bibû serokê Komara Iraqê, û /Baes/ jî ew partiya ku piştî Qasim li Iraqê bûye destlatdar. Evna hemû helbestvan wan mîna noker û sêwlekên serokê Emerîka (Trûman) dibîne, û bi alîkarya Emerîka û Inglîzan kurdistan bi hovîtî xistine bin destê xwe. Û bi peyva – guhnadin- berê vê têkista helbestî guhertye, du wêneyên hemberhev têde têne xuyakirin

- Yek jê /sêwlektiya nokeran/
- Yê din /pêşketina kurdan e/ ango helbestvan dibêje: Ku ev navên min gotine ew sêwelek û kurtêlxurên xelkê ne, heçî sêwlekin tucaran pêşketin û mafê miletê kurd bi vê sêwelektiya xwe nabînin. Mixabin ev miletê jîr ku ji xewa nezaniyê nû şiyar bûye, ew ê ku ji berê de xwedî nasyar, dîrok, kultûr, kelepûr, û folkloreke wiha zengîn in, hayê kesekî ji jiyana wî nîne. Û ev kole û noker û sêwlekên (Trûman), in), dirakolên xwîn mij, mafê vî miletî herdem bi bêbextan re binpêkirine û bi xwîneke sar perçiqndine. Dîsanê Doktor Nûredîn Zaza, di vê sirûda xwe de, dide pey û wiha dibêje:

Bi mîsaq, bi peyman
Bi kirîna nokeran
Bi nermî, gih bi sûtî
Bi kuştin û bi zindan
Bi hile û hiner
Çil sal timam, ser bi ser
Dilxweş kirin Ingilîz
Nefta meya wek dengîz
Dan wan kesên bêsincî
Em bi xwe xistin bin dest
Reben, pêxwas û birçî

Livir jî Dektor dîsanê, bi vê tabloya xwe ya helbestî lebat, çalakî û dijberiyeke dirêj di navbera du mihrîcanên wêneyên tiracîdîk de, ku berevajî hevdûne dixemilîne.

1- wêneyên pir negetîv û bêmirês, ji zordarî û stemkariya ku Ingilîz û nok-

Lêkolîn

ku xwe bigihîne serekê şoreşa kurdî yê navdar, Mele Mistefayê Barzanî. Lê li wir ji aliyê hukûmeta Iraqê ve hate girtin, piştre, ango di sala 1945› an de derbasî Beyrûdê paytexta Libnanê dibe, li wir di fakulteya zanistên konevanî (El- Ilûm – Elsiyasiye) ya Ferensî de xwendiye, û dibistanek bi zimanê kurdî vekiriye, lê pir berdewam nekiriye û dibistana wî hatiye girtin.

Di sala 1947› an de berê xwe daye Ewrupayê û bûye (Derketî) ango helbesta xw ya bi vî navî li ser jiyana xwe ya bi felaket nivîsandiye, li bajarê Lozanê li Siwêsrayê bi cî bû ye.

Li bajêr bi çend hevalên xwe re kovareke bi navê (dengê kurdistan) derxistiye, ew jî bi sê zimanan, bi Kurdî, Inglîzî û bi Ferensî jî dihate weşandin. Li Lozanê asta doktora di fakulteya zanstên siyasî de qezenc kiriye. Ji wir çareke din vedigere Sûryê, bi serokatiya wî û bi çend hevalên xw yê kurd re, di sala 1957› an de, konfransa damezirandina partiya (Elhizbiddîmoqratî – ElKurdî fî Sûrya) li darxistine, û bûye yek ji damezrînerên vê partiya dîrokî. Dîsanê li Sûryê di sala 1960› î de, bi çend hevalên xwe re hatibû girtin, 18 meh zindan lê hatin birîn, mehên hebsa xwe di girtîgeha Mezê de li Şamê qedandine. Piştî şoreşa (Partiya Be-is) D.Nûreddîn careke din berê xwe daye Beyrûtê, lê ji ber çalakiyên wî yên siyasî, hukûmeta Libnanê di riya Urdunê re ew radestî hukûmeta Sûryê kiriye, û dîsanê 7 meh hukum lê hatin birîn.

Di sala 1970 yî de, Nûredîn drbasî Bakurê Kurdistanê bû ku here nik birayê xwe Reşo, lê hukûmeta Turkiyê cinsiyet nedayê, ji wir careke din berê xwe daye Dewleta Siwêsra, di dibistaneke wê de bûye mamosteyê zimanê Firensî, bi jinek Siwêsrî rojnemevan bi navê (Gilbert Faver) re zewicye, ji vê zewacê kurek bi navê (Şengo Valirî) jê re çêbûye û di şeva 7/10/1988 an de, di nexweşxaneyeke Siwêsrî de, vî gernasê kurd serê xwe danî, piştî ku jiyana xw ya tekoşer bi tîpên ji ronahya rokê nivîsiye, li xerîbyê dibin xaka gorîstana bajarê Lozanê de laşê wî yê paqij hate veşartin û feleka dijwar pelên dîrokeke tiracîdîk bi kul û hesret tewandin. Li vir em bi devekî tije û dilekî germ dibêjin: Ey xweşmêrê Kurd.!. Ji niha û ta roja qiyametê, bila hezar dilopên dilovanyê, bi ser giyanê te yê paqij û canfîda de bêne xwar.

Piştî vê kurtenasîna jiyana vî zanyar, siyasetmedar û helbestvanê Kurd D.Nûreddîn Zaza, em ê vegerin li ser helbesta wî ya netewî hinekî biaxivin û bidin ber rexne û şîrovekirinê, ango lêkolînek binyatî enelayzî û rexnesazî, ji van helbestan re li gorî karîbûna xwe lidarxin. Di vê sirûda xw ya bi navê: (Şerê azadiyê) de, Dektorê me yê helbestvan wiha dibêje:

Xwîn xwarên axir zeman
Sêwlekên Trûman
Seîd, Qasim, û Basî
Tev li zanînê asî
Guh nadin
Tarîx, dîrok û destan
Guhartinên van salan
Şiyarî, û yekîtî û jêhatîbûna Kurdan

Ji navnîşana şerê azadiyê tê xuyakirin, ku helbestvanê hêja li vir

Dr. Nûreddîn Zaza

Nerînek rexnesazî

gernasê kurd siyasetmedar û helbestvan, Dektor Nûredîn Zaza, bi ezmanê kurdistanê ve hildiperike, destên xwe davêje roja ku dibin ewrên reş de mayî dadixe ser hêrik û çiyayên welatê xwe.



Xalis Misewer

Mafê vî gernas û lehengê Kurd-perwer, li herkesê kurd heye ku jiyana wî nemaze ya netewyî ku bi kurtayî be jî, ji miletê wî yê kurd re bidin xuyakirin, ta ku em karibin hinekî ji wê helwêsta jiyana wî ya tiracîdîk, û tekoşîna wî ya ku di ber miletê xwe yê Kurd de buhurandiye, bidin xuyakirin û ronî bikin

Nûreddîn Zaza, ev mirovê welatparêz siyasetmedarê bi nav û deng, zanyar û şareza, di sala 1919 an de, li bajarê (Madenê) li bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, ango hatiye vê dunyaya kurdan ya bi azar, êş, dilzar û xirecir..!. Piştî şoreşa agirî ku bi serokatiya Ihsan Nûrî Paşa vêketiye, bi birayê xwe yê mezin D.Ehmed Nafiz re, daketiye bajarê Helebê yê Sûryê, piştî çendakî ji wir berê xwe daye Şama şerîf, û birayê wî D.Nafiz vegeriyaye nav kurdên Cizîra Sûryê, û li gundê/Indîwerê/ li herêma Dêrka Hemko rûniştiye. piştre diçe li bajarê Qamişlo rûdine, li wir bijîjkxanekê vedike, û mîna bijîjkekî pir navdar li nav miletê xwe, hem bi bijîjkiya xwey xurt û hem jî bi welatparêzya xw ya bi rûmet û navdar dibe, û textorya xwe bi xurtayî dixe xizmeta miletê xw yê Kurd de, êş û derdên wî derman dike, ango digel xebata xw ya siyasî de jî, gelek alîkariya tendirustî bi gelê kurd re li bajarê Qamişlo û derdorên wê jî kiriye. Yek ji kesên li ser destê wî ji nexweşîyeke xedar rihet bûye, ew jî Bavê min bû, herdem qal û behsa vî textorê jêhatî, welatparêz, hêja û zîrek bi qencî û başî tanî ziman.

Em ê li vir vegerin ser helbestvanê xwe D.Nûredeîn Zaza, ku piştî çûna Şamê bû ye beşdarê damezrandina komeleya (Hêvî), di sala 1938 an de, hin ji jiyana xwe li bajarê Qamişlo buhurandiye, û di sala 1944 an de, berê xwe daye başûrê Kurdistanê,

Lêkolîn

www.kurdi.org

mirov bikeve ferqa xwe, bi xwe re rûbirû be, fêrî cîhanên din, feraseta ziravî û estetîkê bibe.

Wêje hunera mirovên xweşikî avakirinê ye. Carê bi peyvan dilîzî, radibî dansa azadiyê, carê jî pê re şer dikî û carê jî pê re dibî heval. Dibî mêvanê şivanekî û ji çaya qaçax vedîxwî û li bilûra wî guhdardikî. Dibî evîndarek û li çol û çiyan dikevî, wekî Mecnûn bi salan li Leylayê digerî. Li ser sertapên çiyayên azadiyê diqêrî. Dibî dayîka lehengekî ku li ser ewladê xwe yê li hemberî dagirkeriyê ketî cengê dilorînî. Tu bixwe dibî ew lehengê efsaneyî, şûr û mertalê radikî û dadikevî meydana cengê.

Dîrokê ji nû ve dinivîsînî. Bi hêrs ser neyaran de diçî, dibî tirsa neyaran û dostê qencan. li ber taviyên baharê şil dibî û li ber siya darekê dirûnî. diçî serê Sîpanê Xelatê dibî mêvanê Xecê û Siyabend, di zinarê Sîpanê Xelatê de çengên Siyabendê birîndar digirî û ji nav wan dol û newalên kûr de derdixî. Li ber pêlên ava Dîcleyê dikevî. Dikevî nav rûpelên spî û li gorî dilê xwe wan pelên spî dixemlînî.

Divê em bi wêje ji nû ve felsefe û jiyanekê biafirînin, wêje bikin bingeha jiyanê, di jiyana xwe de estetîka di tama wêje de ava bikin. Çi lehengî dibin, çi rastiya gelê Kurd dibe û çi jî rastiya tevgera azadiya gelê Kurd dibe, divê em di riya wêje re li cîhanê bidin naskirin, ji ber ku çîroka şoreşê li benda nivîsandinê ye. Hîn qêrîna Bêrîtanan bi zinaran ve hilawêstiye û li benda me ye û

Lênûs û pênûsa şahidî ji berxwedana sedsalê re kirî divê êdî bikeve tevgerê û em şoreşa wêje bidin avakirin.

bandike. Leyla Qasim ji nava pêlên dîrokê de serî hilda ye û banî me dike û hîn peyvên wê di guhên me de olan dide. komkujiya Geliyê Zîlan, Dêrsim, Berxwedana Seyîd Riza, Şêx Saîd û Qazî Mihemed û rastiya gelê me li benda nivîsînê ye, divê di riya wêje re em vê dîroka bi tîpên zêrîn a bi xwîna pakrewanan ji nû de hatî nivîsandin bi cîhanê bidin naskirin.

Lênûs û pênûsa şahidî ji berxwedana sedsalê re kirî divê êdî bikeve tevgerê û em şoreşa wêje bidin avakirin. Ez di wê baweriyê de me ku dema em rastî dest bavêjin lênûs û pênûsa xwe û biceger binivîsin em dikarin cihanê bihejînin û dem û dewran jî ji vê re amade ye, lê divê em biceger bin û guh bidin dengê dîrokê. Divê êdî em bêjin; ger îro nebe kengê? Û ji bîr nekin em neviyên Ehmedê Xanî, Feqiyê Tayran û Melayê Cizîrî ne.

Wêje di xwîna me de heye, ji xwe dewlemendiya ziman û çanda me nayê pênasekirin.

tin. Ji bo wê em dikarin bêjin ku wêje amûrê herî bingehîn ê guhetin û veguhertina civakê ye. Mijara wêje ya herî giring jî evîn û heskirin e. Wêje gelek bûyerên dîrokî û pskolojîk digire nava xwe.

Di heman demê de nivîskar divê xwedî nêrînekî berfireh be û nêrîneke wî/wê ya gerdûnî hebe. Ji ber wêje divê feraseta li gorî nêrîneke cîhanî komî serhev bike û kurguya xwe çêbike. Em ji bîr nekin ku wêje awêneya civakê ye. pêşketina wêje girêdayî çand û zihniyeta civakê ye û wêjeya civakê dibe nirxê civakê.

"Pêşiyên me gotine zimanê xweş maran ji kunê derdixe" di vê peyva xweş de em têdigihêjin ku, zimanê xweş û şêrîn wêjeye. Wêje di her kêliya jiyanê de ji bo me pêwîst e.

Dema ku em xwe bilêv dikin, têkilî pêşdixin, pirsgirêkan çareser dikin, waneyekê didin, tiştekê guhdar dikin, stranekê dibêjin, pirtûkekê dixwînin, filmekî temaşe dikin û... hwd. bi kurtasî di her kêliya jiyana me de wêje heye û ji bo me girîng e.

Ji bo ku em wêje fêm bikin, wêje ji bo me lazim e. Wêje hunera nêrîn û hestên xwe gihandina mirovan e. Mirov hîn pirtir xuliqkar dibin û bi xweşbînî li cîhanê dinêrin. Di heman demê de wêje xweşikî û biexlaq, girêdana wêje, exlaq û wijdanê pir bi hev re heye. Kesekê êş û azarên civakê jiyan neke û biwîjdan tevnegere nikare berhemekî wêjeyî û rast jî biafirîne. Ji ber dema em bûyerekê bilêv dikin, divê em wê bûyerê hîsbikin û jiyan bikin. Bi wan re bigrî, bikenî û bixwe bibî navenda wê berhemê. Behrem bixwe teyîsandina nivîskare, ji ber wê her nivîskarek şêwazê wî heye. Berhema wêjeyî ya herî serkeftî jî ew e ya ku bûyî malê gel.

Belê ji bo ku em bikaribin hest, nêrîn û bûyerekê bilêv bikin, pêwîstiya me bi wêje heye. Wêje di rastiyê de hunera mirov a xweşik bilêvkirina hemû xweşikahiyan e. Di heman demê de wêje dihêle mirov xwe û derdora xwe fêm bike. Ji bo mirov xwe bide naskirin û têkiliyan pêş bixwe wêje pêwîst e. Wêje dihêle



Armanca wêjeyê



Peyman Bêrî

Divê di riya wêje re em vê dîroka bi tîpên zêrîn a bi xwîna pakrewanan ji nû de hatî nivîsandin bi cîhanê bidin naskirin.

Armanca wêje, estetîk û xweşikirine, lê estetîk û xweşikî jî li gorî xwîner û nivîskar tê guhertin. Di heman demê tişta wêje dike wêje ziman û şewaz e. Wêje teşe dide peyvan. Wêje ji bo em hest û ramanên xwe bigihînin kesên hemberî xwe amûrek e. Di wêjeyê de ji naverokê wêdetir, tu yê wê naverokê bi awayekî bandorker çawa ragihînî, ew giring e.

Di heman demê de dem û pêvajoya ku nivîskar tê re derbas be jî bandora xwe li ser nivîsê dike. Ji ber ku nivîskar wê pêvajoyê lêkolîn dike û jiyan dike, ango nivîskar hinekê jî xwe bilêv dike. Ji bo vê têkiliya wêje û zanistên civakî ji nêz de bi hev re heye. Lê ciyawaziya wê ya ji beşên din ê civaknasiyê; xuliqkariya wê ye. Wêje diafirîne û destê xwe datîne ser birîna civakê, weku: çawa şer bandora xwe li civakê dike, wêje jî bandorê li civakê dike.

Koçberî û keraset ji ber li civakê pir bandor dikin, dibin mijarên bingehîn yên wêje. Wekî şerê rizgariya gelê Kurd û şoreşa Rojavayê Kurdistanê.

Guhertin û veguhertina çandî; çand bingehê jiyana civakê ye, bi rêbazê jiyanê re zihniyet jî tê guhertin. Dema zihniyeta civakê bê guhertin wêjeya wê jî, ango zimanê nivîskar û hunermendên wê civakê jî tê guhe-

www.arsivakurdi.org

Tekoşîna ji bo welatekî azad, ji bo civakek ava, aza, têr–evîn û bextewer, erka sereke ya kesê wêjevan e.

e) Dûr ji şovenîzmê -çi bîrdozî, çi nîjadî-, divêt realist be, rastgo be..
f) Helûmercên heyî çi dibin, çawa dibin bila bibin, li hember her zordestiya çi navxweyî, çi jî dereke, divêt kesê wêjevan serhildêr be û layengîrê berjewendiya giştî ya nîştîmanî be..

Ji ber ku her berhemeke wêjeyî dibe arşîv û berew dahatûyeke berfireh dihête veguheztin, pêdiviya kesê wêjevan bi van durvên ku li silal hatine darijtin, heye. Heger na; ji her darijtineke nivîskî ya bêyî naverok ku bersiva rûdan, helûmercên zeman û mekan nade û nabe destnîşankirina çareseriyê, ew darêja nivîskî di çarçoveya wêjeyê de cih nagire..

Bi kurtayî jî be, em dikarin hindek durv û taybetmendiyên kesê wêjevan bi vî rengî binirxînin.

Erkê Wêjevan

Wekû li silal me hindek durv û nîşanên wêjevaniyê dane xuyakirin, bi kurtayî jî be, ji me dihête xwestin ku hinekî li ser erkê wêjevan jî rawestin..
Di avadankirina welat û civakê de rola sereke ya kesê wêjevan e. Kesê wêjevan, kem û kurtî, arîşeyên heyî, narewatî û zordestiya desthilatê ya li hemberî civakê berî her kesî dibîne û bi nivîsên xwe, bi pexşan û helbestên xwe narewatiya heyî dihêne zimên û bi helwesteke nîştîmanî, bi rexneyên xwe yên avaker, li rêkên çareseriyê digere, didoze û wekû pêşniyar pêşkeşî deverên peywendîdar dike.

Li dijî zordestiya fermî, bê dudilî, beravaniyê ji berjewendiya welat û welatiyan dike û heta bi dawî dakok e li ser xebat û tevgera xwe ya ji bo aştî, tenahiya navxweyî û bextewariya civaka xwe.

Tekoşîna ji bo welatekî azad, ji bo civakek ava, aza, têr-evîn û bextewer, erka sereke ya kesê wêjevan e. Ji ber van egeran, bi rastî jî barê kesê wêjevan giran e, pîroz e.

www.kursivakurdi.org

takekesî û civakê de..

Wêje, şaxekî hinerê ciwan e ku navgîna wê ziman e û gorepana wê jî jiyane. Ji bo mirov xwe, derdora xwe, sruşt û cîhanê binase, ji bo hestyarbûna bi şêweyekî herî tenduristane ya li hember erênî û nerêniyên heyî yên di jiyana rojane a civakê de, bêguman perwerdeya wêjeyî gelekî girîng e.

Di amanca bingehîn ya perwerdeya ziman û wêjeyê de, ji barkirina agahiyan ya li ser pişta xwendevanan wêdetir, di dil û mêjiyê xwendevan de, niştandina evîna ziman û bikaranîna zimanî ya bi şêweyekî herî sererast û rewanbêjî ye.

Piştî vê darijtina derbarî wêjeyê de, vêca wekû Kurd, bi me ve girêdayî hindek pirs xweber derdikevin pêşberî me. Wekû;

1- Gelo; di astekî baş de em li zimanê xwe xwedî derdikevin?

2- Gelo; ji bo paraztin û pêşdebirina zimanê kurdî, wekû kes û deverên peywendîdar, li dûv daxwazê bi vî erkê xwe yê niştîmanî ve em radibin?

3- Gelo; di alozî û neçareserkirina nakokiyên heyî de, rola neyekgirtina ziman heye an na?!

Pirsên bi vî rengî gelek in û ji her kurdekî bîrbir dihête xwestin ku li bersiva van pirsan bigere, bibîne û çareseriyekê jê re bidoze..

Durv û Taybetmendiyên Wêjevan

Helbet; ji ber pêkhatina wêjeyê ji gelek şaxan (Roman, Dastan, Pexşan, Gotarên Siyasî, yên Bîrdozî, Helbest û her wiha..), tiştekî sruştî ye ku durv û taybetmendiyên wêjevanan jî dê ji hev cuda bin. Ji bilî vê yekê jî, ji ber dabeşbûna civakê ya li ser bingeha çînatî, ji ber hebûna daxwaz û berjewendiyên ji hev cuda yên her çînekê, di nerîn û ramanên wêjevanan de, di evîna wan -çi niştîmanî, çi xwedayî, çi takekesî- de jî, ne wekheviyekê durist dike.

Derencama van egeran, ji bo her wêjevanekî durv û taybetmendiyeke cuda peyda dibe. Êdî her wêjavenek, li dûv helûmercên her serdemekê, bi armanca paraztina berjewendiyên çîna xwe -li ser astekî netewî jî be- tevdigere û bi vê armancê berhemên xwe amade dike.

Vêca; ji bo kesê wêjevan (Nivîskar, Bîrdoz, Helbestvan) bikare bi zimanekî xurt û rehwan, helûmercên serdema xwe, daxwaz û armancên civaka xwe bi duristî rave bike, şirove bike û bi armanca arşîvkirinê ji bo dahatûya gelê xwe veguhêze, pêdiviye xwedî hindek durv û taybetmendiyên gelekî taybet be!..

Hindek ji wan taybetmendiyan:

Kesê wêjevan (Nivîskar, Helbestvan), berî her tiştî:

a) Pêdiviye; di serî de ziman, derbarî nirxên xwe yên niştîmanî de jîr, şareza, serwext û zengîn be.

b) Xwedî çandeke xwecihî û niştîmanî ya berfireh be.

c) Xwedî çanda giştî ya cîhanî be.

d) Derbarî bûyer, rûdan û her tevgereke civakî, hestyar, hûrbîn, dûrbîn, bi kurtayî çavdêrekî bi rêkûpêk be..

Di Wêjeyê de Girîngiya Zimên

Yek ji hêmanên çanda civakî ziman bi xwe ye, her wisa ziman, navgîna herî girîng e ya ku ji nifşekî bo nifşên dahatû çand û danheva hemî serdeman vediguhêze. Li hevkirina mirovan, pelçîmbûna wan û pêkanîna civakê, helbet bi nirxê wanî hevpar, ango bi zimanî ve girêdayî ye.

Zimanê her netewekê heye. Bi derdora sruştî ve girêdayî ya her netewekê, wekû; Kar û serpêhatiyên wê netewê, navgînên ku ji heyamên dêrîn de bikaranîne, kedîkirin û xwedîkirina ajal û sewalan, şahî, xemgînî, cengên ku kirine, bi dirêjahiya sedsalan rûbirûmana li hember hêrişên dereke, ev hemî bi rêya zimanê wê netewê, di stran, serpêhatî, çîrok, dastan, pend, pêgotî, pêkenok, mamik, gotinên pêşiyan, nikûk, nîgar, şano, kurteşano (skeç) û di helbestên wan de dihêne tomarkirin û bi rêya van nirxan, ji nifşekî bo nifşên dahatû dihêne veguheztin.

Wêje, şaxekî hinerê ciwan e ku navgîna wê ziman e û gorepana wê jî jiyane.

Her wisa ziman, bi pêkanîna vê danheva salane, di pêşdeçûna civakê, geşedana zanist û teknolojiyê de jî roleke sereke dilîze.

Ziman temet ji aliyê jiyana civakî ve, her wisa ji aliyê jiyana takekesî ve jî girîng e. Hem ji bo takekes, hem jî ji bo civakê, berî bi du hezar û pêncsedsalan ji aliyê ramyar û bîrewerê navdar Konfuçyûs (551-479 b.z.) ve, destnîşankirina girîngiya zimên balkêş û hêjayî nirxandinêye. Ji Konfuçyûs dipirsin:

-Heger ji bo birêvebirina welatekî gazî te bikin, di destpêkê de tu dê bi karekî çawa rabî?

Konfuçyûs vê pirsê wisa dibersivîne:

-Bêguman, pêşî ez ê bi berçavkirina zimên dest bi kar bikim. Heger di ziman de kêm û kurtî hebin, ji bo şirovekirina ramanê gotin têrê nakin. Heger raman bi duristî nehête vegotin, karên ku divêt bihêne kirin bi duristî nahêne kirin. Heger spartek li dûv daxwazê nehêne bicihanîn, çand û gerdiş têk diçin. Heger çand û gerdiş têk biçin, dadwerî dê varî biçe.

Heger dadwerî varî biçe, cemawerê ku şaş û şerpeze dibe, dê nizanibe çi bike û dê nikaribe rêya çareseriyê bidoze. Aha ji ber vê yekê ye ku hîç tiştek temet zimên girîng nabe.»

Piştî vê dazanîna Konfuçyûs ya derbarî girîngiya zimên de, vêca em bihêne ser girîngiya wêjeyê ya di jiyana

her tiştekî ziman tê bîra meriv. Li navbera mirovan, di veguheztina hest û ramanan de ziman gelekî girîng e. Veguheztina çandê ji nifşekî bo nifşên dahatû tenê bi navgîniya ziman dibe. Wêje, tevaya nakokiyên zimanî di nav xwe de dibanîne. Ji ber ku ziman, afirandine û pîşeya mirovahiyê ye, carinan tevlîhev, carinan xwerû, carinan jî pîşeyeke giştî ya sruştî ye. Helbet, zengînbûna wêjeyê jî, bi zengînbûna zimanî ve girêdayî ye.

Mêjûya Wêjeyê û Giringiya Wê

Nabe meriv wêjeyê wekû şahiyeke demî, yan jî, ji derveyî jiyana rojane binirxîne. Kartêkirinên girîng yên wêjeyê li ser jiyana civakê bi rengekî dirêjxayen hene. Meriv dikare bi hindek nimûneyan kartêkirinên wêjeyê bide xuyakirin.

Yek ji gelek kartêkirinên sereke yên wêjeyê ziman e. Xebat û lebatên xurt yên wêjeyî, bi rastî jî xurtiyeke taze û hestyariyeke ber bi çav gehandiye zimanên cîhanê. Peydabûna peyvên nuh, şayîksazî û nazdarkirina van peyvan, diyarkirina cudahiyên di navbera peyvên nêzî hev de, bi tevahî derencama xebatên wêjeyî bûne.

Ji bilî vê jî, divêt bihête zanîn ku vegotina hindek hest, raman û têgehên wêjeyî, gelekî bi kêrî mirovan hatine.

Her wisa di nasîn û nêzîkbûna civakan de, roleke sereke ya wêjeyê heye. Ji bo her netewekê wêje neynika jiyanê (çi rojane, çi jî mêjûyî) ye, û her civak di vê neynika wêjeyê re xwe dibîne û ji bo dahatûyeke kûr û dûr bizanayî, bi şarezayî xwe berhev dike. Ango wêje, kurtiya vegotina rabûrî, dazanîn û rênimayiya jiyana dahatû ye.

Di serdema me de, hebûna teknîka çapemeniya pêşkeftî û pîşesaziyeke pirtûkan ya bi hêz, ji bo gelek zimanên cîhanê bûne egera wergerandina gelek berhemên wêjeyî. Ev jî bûye derencama hevnasîna civakan û hiştiye ku ji aliyê ramanî ve civakên cîhanî bêhtir hev binasin û nêzî hev bibin.

Gava em bihûrbînî dêhna xwe didin şiroveya wêjeyê û derencama kar û tevgerên wêjeyî, ji bo me xweş diyar dibe ku di avadankirina civaka me de, di pêşkeftina hest û ramanên me yên netewî de (yek ji mercên sereke yê netewbûnê ye) roleke girîng û ber bi çav ya wêjeyê heye.

Wêje; tevgera navxweyî ya civakê ji gelek aliyan ve bi rêkûpêk dixe û tevaya nirxên heyî yên niştîmanî ji bo seranserî welêt vediguhêze, li ser civakê belav dike û li ser erdnîgariyeke diyar, bûyera yekgirtina netewî pêk dihêne.

Bi kurtayî; wêje, di çareserkirina arîşe û nakokiyên civakî û di avadankirina civakeke bextiyar, bextewer û têr-evîn de, navgîneke sruştî ya herî zengîn, ya herî ji dil û ya herî miyanrew e...

Di warê jiyanê de girîngiya wêjeyê

wêje, di çareserkirina arîşe û nakokiyên civakî û di avadankirina civakeke bextiyar, bextewer û têr–evîn de, navgîneke sruştî ya herî zengîn, ya herî ji dil û ya herî miyanrew e...



Dildar Şeko

Pênaseya Wêjeyaê

Wêje, pîşeya vegotina bi şêweyekî herî ciwan û bi bandor ya hest û ramanê ye. Çanda civakî ya herî girîng ku mirovan li hev kom dike û danheva agahiyan vediguhêze jî, ziman e.

Wêje, pîşeya veguheztina hest, raman û nîgaşan ya nivîsên bi şêweyê nerm û rehwan e. Her wisa pîşeya zargotina devkî ye jî.

Wêje, şaxekî pîşeya ciwankarî ye ku navgîna wê ziman e. Ji bo mirov xwe, derdora xwe, sruşt û cîhanê binase, binirxîne û van nirxan di jiyana xwe ya rojane de pêk bihêne, perwerdeya wêjeyî gelekî girîng e.Her darijtineke niviskî di çarçoveya wêjeyê de cih nagire. Ji ber ku wêje, bi mirovî re hestê nazik û li hevhatî zindî dike, tenê ji bo nivîsînê nahête nivîsandin. Gorepaneke wêjeyê ya gelekî berfireh heye. Şêweyên mîna helbest, pexşan, drama, çîrok, çîvanok, roman û hwd..., ji şêweyên wêjeyê ne. Ji bo girêdana çand û ziman ya bi hev re, wêje mîna pirdekê rola xwe bi cih dihêne. Çand û ziman, di hebûna mirovahiyê de beşên herî girîng in, ango, şêweyek ji şêweyên sereke yên jiyanê ne.

Gava çand dihête gotin, berî

www.aramakurdi.org

Erkê wêjeyê ew e ku şoreşa mîna çirûskekê geş dibe, bike agirek gur û di dilê her mirovekî de hertim zindî bimîne, ronî û tîna vî agirî jî bighêje her deverî. Şoreş Sîstema mêtinger û xwînmij tu caran napejirîne û ji bo qetandina zincîrên koletiyê hertim lêgerîna wê ew e ku bi hemû rê û rêbazan vê sîstemê hilweşîne û bi xwe re jiyaneke azad û wekhev ava bike.

Di romanên rûsî û yên firensî de jî rastiya şoreşê, şoreşgeran û herkîna şoreşê bi rengekî baş hatiye bilêvkirine. Di roja me ya îro de jî em bi riya van roman û nivîsan re rastiya şoreşê nas dikin û ji rastiyên ku hatine jiyankirin pêzanîna me çêdibe.

wêje dema ku bikaribe bi rengekî rast cewher û giyanê civakê bîne ziman; wê gavê dikare bala mirovan bikşîne ser xwe û ji mirovahiyê re bibe çavkaniyeke dîrokî û jiyanî. Girêdayî vê yekê nivîskar, M. Gorkî dibêje; "wêje çavê gerdûnê ye, ê ku her tiştî dibîne û diçe heta kûrahiya derûniya mirovan."wê demê edebiyat gerdûnî ye û tu carî sînordar jî namîne, ji ber ku temsîla nirxên mirovahiyê û hestên wan dike. Dema em dibêjin gerdûnî ye, nayê wê wateyê ku ji rastiya gelê xwe dûr, an jî biyanî bûye. Berevajî vê, wêje û wêjevan ji bo xwe tu sînoran nasnakin û bi fikir û remanê ku vegotina wê bi rengekî sade, resin tîne ser ziman rastiya jiyana azad û bedewbûna xweza û mirovahiyê bi rengekî herî xweşik derxîne holê û vejîneke nû ava bike.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku di tevahiya şoreşên cîhanê de her tim kesên zane û pêşengên civakê di şoreşên gelerî de cihekî xwe yê giring girtine û ji bo serkeftinê heyanî hilma xwe ya dawiyê têkoşiyane, her wiha dema ku hatiye xwestin jî canê xwe fedayî gelê xwe kirine. Kesê wêjevan jî, hem mîna lehengê ku di çeperên şer de cihê xwe digre û meydanê ji dijmin û neyaran re dixwîne. Ji milekî din ve jî ew bi pênûsa xwe şahsiwarê şoreşê ye û erkê wî ew e ku bi fikir, reman, hest û xeyalên xwe rastiya şoreşê vebêje. Kesê wêjevan wêjeya şoreşê bi hest, reman û dengvedana dilê xwe kêlî bi kêlî mîna şêwekarekî dixwaze wêneya wî bedew û delal be. Mîna sazbendekî dixwaze bi mûzîka xwe mirovan sermest bike, An jî mîna hunermendekî dixwaze bi awazên xwe pêlên deryayan dîn û har bike.

Di dawiyê de dibe ku ew bibe şehîdê rastiyê, parêzvan û tekoşerê jiyana azad û canê xwe fedayî gelê xwe bike. Ji ber ku wêjevanê rastiyê tu caran bi jiyan û berjewendiyên xwe yên takekesî nahizire. Ji ber vê yekê wêjeya şoreşê û kesên ku xebatên wêjeyî dikin, di serî de ji xwe dest pê dikin û şoreşa wêjeyê di hindirê xwe de avadikin û bi hest û remanê xwe yê azad nûnertî û pêşengiya civakê dikin.

şoreşger bin, wê gevê ew xwedî wê erkê ye ku wêjeya şoreşê bi rengekî herî baş binvîse û rastiyên ku hatine jiyankirin mîna şoreşgerekî vebêje û li ser bedena dîrokê xêz bike.

Heke ne wiha be, yên ku wêjevaniyê tenê ji ber wêjeyê bikin û ji rastiya gel û civaka xwe dûr vî karî bikin ew bi zanebûn an jî bê zanebûn destekê didin sîstema serdest û pilanên wê yên teşîrkirin, berevajîkirina çand û dîroka gelan.

Serdema ku nivîskarê mezin Ehmedê Xanî Mem û Zîn nivîsandî, armanca wî teşîr û rûxandina desthilatiya ku beg û axayan li ser civakê didane meşandin bû. Di nivîsên xwe de bal dikişand ser eşqa gelê kurd ji jiyana xwezayî û azad re. Gelê hertim xwestiya ji bo ku ev yek pêk were ked û xebateke bê navber dide meşandin û mîna nûnerê civaka azad û demukrat hertim di eniya pêş de ye. Çawe ku şoreş erka xwe ew e ku vejînekî nû di hundirê civakê de avabike û jiyaneke nû birêse û dawî li desthilatiya mêtinger û serdestan bîne. Di heman demê de erkê wêjeyê jî ew e ku şoreşeke fikrî, hişmendî, çandî û dîrokî pêk bîne û ji nû ve reng û dengê azadiyê di nava civakê de ava bike û cewherê civakê yê nepenî bi şêwe û teşeya herî baş derxîne holê. Ji ber ku di hemû şoreşên cîhanê de erka hunerê û wêjeyê hertim derketiye pêş û cihekî xwe yê giring di serkeftina şoreşê de digre.

Her şoreşek jî bi edebiyata xwe tê naskirin û ger ku wêjevanên şoreşê bi hemû beşên edebiyatê vegotina şoreşê nekin, jiyan û rastiya şoreşê bi azaw, helbest, roman û hemû cûreyên edebiyatê tomarnekin, wê çaxê şoreş wê mayinde nebe û nebe malê civak û dîrokê. Ji bo vê yekê hemû wêjevanên cîhanê kêm be jî cihê xwe di şoreşê de girtine û şoreş di hemû serdemên wê de zindî hiştine û her tim xwestine ku şewqa tîrêjên wê bighêje cîhanê tevahî.

Erkê wêjeyê jî ew e ku şoreşeke fikrî, hişmendî, çandî û dîrokî pêk bîne û ji nû ve reng û dengê azadiyê di nava civakê de ava bike û cewherê civakê yê nepenî bi şêwe û teşeya herî baş derxîne holê.

Kesên ku ji xwere dibêjin em wêjevan in, ger ku li hemberî dagirkeran û sîstema serdest serî hilnedin û nebin şopdarê şehîdan û hêviyên wan ên azadiya civakê bi pênûs û hestên xwe venebêjin. Wê gavê ew karê ku ew dike ne wêjeye û ew kesê ku vî karî dike jî, mirov nikare jêre bibêje wêjevan.

kişandine bi zimanê helbest, çîrok, awaz û dîmenan dibîne. Ev hemû berhemên em behsa wan dikin, mîna şoreşekî bi hemû wateya xwe mirov dikare bilêvbike, ji ber ku ew rastiya tekoşîn û edebiyata şoreşa mirovahiyê li hemberî tarîtiyê bi me dide nasîn. Ango edebiyat xwedî kevneşopiyeke serhildêriyê ye û pêwîste ku mirov vê yekê bibîne û binirxîne. Her eserekî ku li ser kevirekî hatibe neqişandin îşaretê bi rewş û heyînekî destnîşan dike.

Di vê xalê de nivîskarê navdar Dostoyvîskî wiha dibêje:"yek ji erkên wêjeyê şîretkirina mirovahiyê ye. Ji ber ku ew mîna pirtûkeke dibistanê ji bona jiyanê. Armanca xwe naskirina jiyanê û nirxên mirovî dide çandin." Wêjeya ku rastiya civakê venebêje û nebe ziman, deng û vîna civakê û di heman demê de çand, kelepûra civakê û hemû nirxên wê li hemberî hemû êrîşên dagirkeran neparêze, wê gavê mivo nikare jêre bibêje wêjeya şoreşê, an jî ya civakê.

Hemû pêşketin, şoreş û herikîna civakê û dîrokê bi riya wêjeyê dengvedana xwe daye cîhanê û mirovahiyê.

Şoreş bi vegotina wêjeyê dikare navnîşana civakê diyar bike. Li gorî vê yekê şoreş û rastiya şoreşê bi riya wêjeyê dibe xwedî wate û nasnameya xwe digre û nasnameya şoreşê jî bi wêjeya şoreşê pêk tê û mîna avzêmê diherike deryaya dîrokê.

Ji bo ku em di warê hişmendî, hizrîn û bîrdoziyê de wateya edebiyatê û cih û giringiya wê di nava civakê de nas bikin, pêwîst e ku di warê çandî û dîrokî de têgihiştineke me ya têr û tijî ji rastiya civakê û gel re hebe. Ger ku ev yek nebe, wêjeya ku tê kirin jî wê nebe malê şoreş û civakê û wê nikaribe guhetina pêwîst pêkbîne. Heya ku wêje bikaribe şoreşeke civakî pêk bîne, pêdivî bi nêzîkatiyeke rasteqîn ji dîrok, civak, xweza û gerdûnê re heye. Her wiha pêwîst e em di ferqa wê rastiyê de bin ku ne gengaze wêjeyeke ku ji rastî û nirxên civakî dûr û ne li ser kok xwe be û ji cewherê xwe dûr be, ronahiya serkeftinê bibîne û muhra xwe li dîroka mirovahiyê bixe.

Ji ber ku qada wêjeyê qada afirandin û şopandina jiyanê kêlî bi kêlî ye û mîna civaka xwezayî wêje jî bi rengekî xwezayî di hemû beşên jiyanê de xwe bilêvdike. Lê ji bona ku ev yek pêk were pêwîst e ku mîna volkanekî wêjeya ji nava hest, xeyal û hizrîna civakê mîna çem û robaran biherike, Herwiha ji bo ku ev ked û hewildan bighêje encameke berbiçav divê ku di nava komunalbûn û di xizmeta civakê de be.

Di rastiyê de ya ku wêje û şoreşê digihîne hevdû, ked û afirînerî ye. Ev herdû jî hev temam dikin û pêşketina ku tê xwestin ava dikin û bi xwere civakeke zane û azad ava dikin. Weke çawa şoreş tenê çalakiyeke rûxandinê nîne, wêje jî tenê çalakiyeke nivîsê nîne, lewre herdû hîna zêdetir xwedî armanc û sinc in û çawe ku şoreş bi xwe re avakirineke nû û jiyaneke azad diafirîne. Di heman demê de wêje jî rastiya şoreşê ji hemû Milan ve radixîne ber çavan û van rastiyan yek bi yek zindî dihêle. Bi teybet jî dema ku kesên xebatên wêjeyê dikin

xurt dimîne.” Şoreş û wêje dihêlin ew xewnên ku têne behskirin bêne pêkanîn û civakeke etîk û estetîk pêkan be. Bi wêjeyê mirov dikare her rastiyên hatine jiyîn bi awayekî sade bîne ser zimên. wêje dihêle ziman jî pêşbikeve û çanda civakê ji kokê ve bê parastin.

Berevajî vê yekê armanca modernîteya kapîtalîst û dewlet netewan ewe ku serdestiya xwe li ser fikir, hizir û hişmendiya mirovan bidine meşandin û civakeke bê vîn û bê paşeroj û pêşeroj avabikin.

Ji milekî din ve jî derûniya civakê serobino dikin û hemû cûreyên şeran li ser civakê didine meşandin û di cewherê xwe de dixwazin civakê tevahî di nava pergala xwe de bihelînin û bi riya vê yekê hest, xeyal û hizrên azad dîl bigrin. Bêguman dema ku wêjeya şoreşê bi hest, xeyal û asoyên tijî û dagirtî xwe bilêvbike, wê gavê şoreş wê tim di hiş, bîr û dîroka gelan de zindî bimîne. Bi qasî ku şoreş gava herî sereke ye ji bo avakirin û azadiya civakê, di heman demê de wêjeya şoreşê

jî rastiya şoreşa heyî temam dike û agirê şoreşê hîn bêtir geş dike û di nava civakê de vîn û hestekî azad dide avakirin. Li gorî vê yekê çawe ku di qada şer û cengê de qehremanên şer û lehengên ku di çeperên şer de muhra xwe li dîrokê didin hene û hertim cihekî wan di hiş, bîr û dilên gelan de dimîne. Bêguman wêjevanî û wêjeya şoreşê jî mîna wî lehengê şer û cengê bi pênûsa xwe heman erkê digre ser milên xwe û rastiya şoreşê kêlî bi kêlî û gav bi gav li ser bîra mirovahiyê û dîrokê xêz dike û şûna xwe dihêle.

Tabloya şoreşê bi wêjeyê ji nû ve xwe bi reng û deng dike û mîna mirovê ku jinûve ji dayik dibe û dikare biaxive û çavên xwe li dunyayê bel bike, şoreş û wêje jî mîna av û masî bi hev ve girêdayî ne. Ango ji bo edebiyata şoreşê were vegotin, pêwîstî bi şoreşeke di warê wêjeyê de heye û ger ku ev şoreş pêk were wê bi xwe re gelek guhertin û veguhertinên bingehîn derxîne holê û dê şoreş bibe hest, ziman, awaz û wê xwe bighîne hemû deverên cîhanê.

Di hemû şoreşên cîhanê de wêjeya şoreşê hatiye tomarkirin û wêjevanên ku rastiya şoreşê bi zimanê xwe vegotine û bi pênûsa xwe xêzkirine, rastiyên şoreşê gihandine roja me ya îro û ji mirovahiyê re kirine mal.

Ji dirêjiya dîrokê û bi riya dastan, serpêhatiyên devkî û nivîskî jiyan û hebûna mirovan nifiş bi nifiş hatiye heyanî roja me ya îro. Di serî de dastanên lehengiyê yên ku dema îro jî hîn mîna tabloyeke zindî di hiş û hizrê mirovan de ma ye, xwedî cihekî taybete di dîroka mirovahiyê de.

Dema ku mirov herikîna dîrokê û mirovahiyê dişopîne, mirov wê gavê wêje û wêjevanên ku bi riya destan, çîrok, helbest û awazan xweşikbûn û sadebûna cewherê mirov, xweza û cîhana hemû zindiyan bi rengekî têr û tijî danîne hole bi rengekî herî baş dibîne.

Di heman demê de û di destanên kevnar de mirov berxwedaniya gelan li hemberî sîstema serdest û êşên ku mirovan ji vê sîstemê

helbest, qesîde û... hwd, hemû jî ji berê de hene û hêjayî nirxandinê ne. Divê xalê de Çernîşevskî wiha dinirxîne: "Miletek bê wêje, kor û nezan e. Bi qasî miletek xwedî wêje be, zana û rewşenbîr e, mirovan hîn û şa dike." Li gorî vê yekê şoreş bi rastiyên xwe dikare wêjeyeke rasteqînî pêşbixe û mohra xwe li serdema dîroka civakî bide.

Sîstema dagirker di hemû waran de dixwaze hêza wêjeyê bi tiştên ne di xizmeta civakê de xerc bike. Lewra di roja me ya îroyîn de mirov dibîne ku wêje û çand bûye amûrekî ku di riya wê hêzên dagirker kelepûra resen a civakê, ziman û dîroka wê berevajî bide nîşandan û ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe bikartîne. Ev yek jî bi destê kesên xwefiroş û yên ku ji cewher û rastiya xwe dûrketine û ji dagirkeran xirabtir dikevin xizmeta dijminê xwe û di gera xefletê de wnda bûne.

Ji ber ku xebatên çandî û wêjeyî xwedî bandoreke mezin in li ser avakirin û pêşxistina civakê, ji ber vê serdest û dagirker destê xwe tavêje van qadan û dixwazin bi vê yekê civakeke bê parastin, bê çand û vîn avabikin.

Ew gihiştina wê baweriyê ku tenê di warê leşkerî, siyasî û abûrî de ew nikarin bandora xwe li ser gel bidin meşandin, ji ber vê yekê dixwazin şerê bîrdozî, hişmendî û çandî li ser gel bimeşînin. Modernîteya kapîtalîst û dewleta netewî di riya bîrdoziya xwe ya lîberalîzmê dixwazin tevahî reng, teşe, çand û zimanên cûrbecûr di nava pergala xwe de bihelînin û tenê çand, ziman û bîrdoziya xwe li ser hemû civakan serwerbikin. Ji bo ku vê di nava civakê de pêkbîne, êrîşî çanda gelan a resen dike û roj bi roj di çav û hişên mirovan de wê çandê piçûk û bê qîmet dike. Hemû derfet û imkanên heyî ji bo pêkanîna vî tiştî xercdike, bi riya şerê taybet û derûnî, civakê dike mîna robotan û hestên civakê ziwa dike.

Di vî warî de mirov dikare bibêje wêje bê şoreş nabe û şoreş jî bi wêjeyê tê nasîn û armancên şoreşê bi wêjeyê dikarin mayend bibin û bibin malê civakê. Her netewek li gorî berhemên xwe yên wêjeyî dikare jiyaneke çawa armanc dike bide nasîn. Wêje îfada herî baş ya şoreşê ye. Şoreşek bi qasî ku xwe di milê edebiyatê de têr û tijî bike, wê gavê dibe malê civakê. Şoreş jî bi riya edebiyatê xwe ji gel û cîhanê tevahî re dide naskirin. Ji ber ku wêje erkê wê ew e ku şoreşê bi berhemên wê mayinde bike û hemû kêliyên berxwedan û tekoşîna ku şoreşê bi xwe re derxistiye holê li ser rûpelên dîrokê zindî bihêle.

Lewre şoreş xeyal û jiyaneke çawa hedef dike, wêje dikare bi awayekî sade birsiva vê yekê bide. Nivîskarekî Latîn Amerîkî, Ernesto Sabato dibêje " Heger hûn nehêlin mirovek xeyal bike, ji xeyalên wî re astengiyan derxin, ew dê dîn bibe. wêje her tim dijber û li hemberî tiştan derketin e. wêje di serê her tiştî de çalakî ye. Berxwedana mirovan ya ji astengan û ji dînîtiyê xilas kirin e. Di rewşên giran de hunermend hatine qedexekirin, lê wêje hêza herî

vakê zindî dike û di hundirê civakê de vîn, bawerî, coş û zanistiyê pêşdixîne.

Di rasteqînê de şoreşa herî mezin di hestên mirovan de pêk tê û ger ku ev yek pêk were wê gavê kesayet dikare bi rengekî azad bihizire û serkeftinê di hemû warên jiyanê de pêk bîne. Her wiha ger ku wêje di raman û hestên mirovan de vejîna xwe pêkneyîne, wê demê çalakiya xwe ya pêşvebirin û pêşengiya civakê nepêkane. Dema ku jiyan bi wêjeyê bê pênasekirin, wê gavê mirov dikare bi rengekî hîn bedewtir pênaseya jiyanê bike û hîn bêtir bi zimanê hest, xeyal, xweşikbûn û zindîbûna hertiştê ku di gerdûnê de jiyan dikin bilêvbike. Ger ku ev yek pêk were wê çaxê rastiya mirov, xweza û hemû zindiyan di kûrahiya hest û deryaya çavên me de bibe xwedî wateyeke cuda.

Ji ber ku mirov herî zêde bi xeyal, hest û asoyên xwe dixwaze cîhana nepenî nas bike û xwe bighîne deverên ku tu kesî xwe nigihandiyê. Dema ku em van rastiyan li ber çavan bigrin, wê gavê mirovê ku ji xwere dibêje ez wêjevan im, pêwîst e ku bi erkê xwe rabe û xwediyê wê têgihiştinê be ku ji bona gelê xwe pêşengiya herî rast bike. Herwiha xwediyê wê hêzê be ku di hemû şert û mercên giran de û li hemberî hemû êrîşan xwedî li civaka xwe derkeve û wê biparêze. Ji ber ku dijmin û neyarên gelan ji bona ku pişaftin û qirkirinê li ser gel û civakê pêk bînin destê xwe tavêjin hemû nirxên civakê yên pîroz û ji bona ku armencên xwe pêk bînin hertiştî ji bona xwe serbest dibînin.

Di serî de ji bona ku dagirker armanca xwe pêk bîne û li pêşiya pêşketin û guhertinên ku di civakê de rû didin astengiyan çêbike, civakê di qirkirineke çandî re derbas dike û dixwaze bi vê yekê civakê tarûmar bike.

Di vî warî de hertim serdest û dagirkeran xwestiye ku civakê dîl bigrin, li gorî berjewendiyên xwe bikarbînin, reng û teşeya ku dixwazin didine civakê û li gorî vê yekê di nava pergalê de dihelînin û li gorî berjewendiyên xwe bikartînin. Ev yek li hemberî hemû civakên blindest tê meşandin û dema ku mirov romanên ku hatine nivîsandin dixwîne mirov van rastiyan bi rengekî sade tê de dibîne. wêjeya gel, bi hemû beşên wê mîna stran, lorîk, çîrok, serpêhatî,

pêwîstiya civakê bi şoreşa edebiyatê jî heye. Ji ber ku wêje giyan û hestên civakê zindî dike û di hundirê civakê de vîn, bawerî, coş û zanistiyê pêşdixîne.

Herwiha wêje di heman demê de dibe çavkaniya pêşxistina ziman û ji milê çandî ve jî bi xwe re çandeke resen, têr û tijî derdixîne holê.

Dema mirov bala xwe dide berhemên wêjeyî dibîne ku ew ji bona lêkirina bîra/hişê hevpar a gel pêwist e/gereke. Hemû berhemên wêjeyî li gor însan û vegotinên însanan hatine pêşkêşkirin ew her tim zindî dimînin û di hemû dem û çaxan de mirov ji wan sûdê werdigre. Mirov çiqas zimanê xwe pêşbixe bi qasî wê ew pêşdikeve, ji ber ku fêrbûn û pêşxistin ziman li cem mirov di hemû aliyên din de jî pêşketinê dide avakirin. Ji ber ku mirov hebûneke civakî ye û di bin bandora civakê de ye, kêm be jî bi kirinên xwe li ser civakê xwedî bandor e. Gelê kurd bi salane ku zimanê wî hatiye qedexe kirin, kêm hatiye dîtîn û biçûk hat xistin. Lê bi saya wêjeya devkî (dengbêj û çîrokbêjan) parast û bi wan hestên xwe derman kir. Ew hêza gotinên devkî ji birîn, hêrs, bêçaretî û tengasiyên wan re bû derman.

Jiyaneke bê wêje roj bi roj tê de hestên civakê vedimirin û mirov di nava civakê de bê xem û bê hîs dibin, civak ji cewherê xwe dûr dikeve û tarûmar dibe. Wêje rastiya jiyana azad û birûmet ji mirovan re xêz dike û bi rengên herî xweşik û delal dixemilîne û cewherê mirov çiye pê dide naskirin. wêjevan civakê hişyar dike û ji bona tekûziyên mirovahiyê berhemên xweşik û bedew pêşkêş dike. Civak û gel ji gor xwedîderketina wêje û wêjevanan dikare xwe bighîne asteke mezin û bilintir. Ji ber ku tiştên neteweyekê li ser piyan dihêlin wêje û berhemên wê yên wêjeyîmne. Ew jî bi zimanê zexim û dewlemend ê wî gelî ve girêdayî ye. Lewma hemû dewletên dagirkerên nûjen êrîşên xwe yên destpêkê li dijî zimanên gelên bindest dikin. Kurdan bîrên/hişên xwe demeke dirêj bi stran, kilam, çîrok û destanên dengbêjan zindî girtin.

Şoreş jî bi xwere guhertin û veguhertinên bingehîn di nava civakê de dide avakirin û şoreş ji bona avakirina civakeke nipûnû çavkaniya hêz, bawerî û azadiyê ye. Ji ber vê Dema gotina şoreşê tê li ser zimên, yekser tê hişê mirov ku wê jinûve jiyan mîna xemla buharê bipişkive û mîna avzêmê, çem û rûbaran bê ku tu qeyd û bendan nasbike biherike. Ango şoreş tabloyeke ku tê de wênexêz hemû rengên xweşik û delal bikartîne û bi vê yekê dixwaze bala herkesî bikşîne ser kar û xebatên ku ew dide meşandin û dixwaze berhemên xwe bi rengekî herî baş bighîne gelê xwe.

Herweha ger ku Şoreş ne civakî be, mirov nikare navê şoreşê lê bike, wêje jî ger ji rasteqîna civakê dûr be û nikaribe bibe neynika civakê, wê nebe wêjeya resen û wê nikaribe bibe malê civakê tevahî. Civak bi riya çand, wêje û dîrokê teşeya xwe digre. Ji ber vê yekê şoreş bê edebiyat nabe û ji bona ku xebatên wêjeyê biserbikeve pêwîstî bi şoreşeke edebiyatê heye. Çawe ku pêdiviya civakê bi gelek şoreşan heye ji bona ku xwe bighîne azadiyê û xwe ji qeyd û bendên koletiyê rizgar bike. Di heman demê de pêwîstiya civakê bi şoreşa edebiyatê jî heye. Ji ber ku wêje giyan û hestên ci-

nivîsandin pêwîst e. Nivîskar bi herfan nêrîn, hest û xeyalên xwe bi awayek hunerî dineqişîne û digihîne xwendevanan. Lê ev nayê maneya ku edebiyat bi tenê ji berhemên nivîskî pêk tê. wêjeya Kurdî ji ber sedemên aşîkar hîn jî zêdetir devkî ye. Pêwîst e ku wêjeya nivîskî li ser hîmê wêjeya devkî were avakirin. Wê demê dewlemend, xurt û bedewtir dibe. Hinek beşên edebiyatê zêdetir bi devkî bandor dikin. Wê demê ji xwendevanan zêdetir guhdar derdikevin li pêş. Bêguman û bêşik, dengbêj û çîrokbêj xwedî û hostayên wêjeya devkî ne. Di gotinên wî/ê de fantazî û rastî, xewn û serpêhatî, bûyerên qewimî û çêkirî di nav hev de ne.“

Wêjevan ew kesên ku kilîta gencîneya ziman di destê wan de ye. Ew bi nivîs û gotinan peyîvên di xeyalên xwe de diafirîne, bi rêkûpêk û nîzamî didin berhev, dixemilînin, dinivîsînin, dibêjin û vedibêjin. Bi wan xeyal, raman, derd, kul û keserên xwe tînin ziman. Di vê hewldanê de sûdê didine derdora xwe, tûrê xwe berdidin bin bîra dilên xwe, wan bi tecrûbe, raman, hest, xeyal û hêviyên xwe yên cûrbecûr dixemilînin û pêşkêş dikin. wêjevan bi şêwazekî xweşik behsa însanan dikin, bi awayekî hunerî însan ji însanan re tarîf dikin.

Dema mijar li ser mirov û mirovahiyê be wêjevan xwe, civaka xwe, herêma xwe jî vebibêje; ev vegotin gerdûnî û ji bo herkesî ne. wêjevan pirsgirêkên hemû kesên li rûyê erdê mîna pirsgirêkên xwe dibînin û ji bo çareseriya wan hewl didin. Ev hewldana gerdûnî sînor û tixûbên di dil û mejiyên mirovan de hatine danîn serûbin dikin, nêrîn û dîtinên berfireh didin ber wan. Ew êş û janên mirov û mirovatiyê ji xwe re dikin êş û jan, ji bona çareseriya wan tevdigerin. Bi duristkirin û tekûzkirina gotin û vegotinê niyet û meqsedên mirovan zelaltir dibin, baştir û duristir tên fêmkirin. Ev jî bi bêjinga edebiyatê gengaze.

wêjevan bi nêrînek berfireh li jiyana civakan dinere û şîrove dike. Di berhemên wî de hestyariyek û dilsoziyeke mirovhezî û gerdûnî heye. Ew ji xwendevanên xwe re dibe pêşeng û hişmendar.

Edebiyat him nivîskar û wêjevanên dunyayê digihîne hev, him jî civak û neteweya wan. Piştdayîn û ragihandina wêjevnên gerdûnî dikarin aştî, azadî û hevaltiya gelan xurt bikin. Wêjevan bi feraset û hişmendiyê ve girêdayî ye. Ew bi qelema xwe dikare civaka xwe û hemû civakên dunyayê ji xirabî û gemara demê haydar bike û ji wan re riya mirovatiyê raber bike.
Mîna hemû beşên hunerê, wêje jî di nav civakê de derdikeve holê û bi civakê re xwe dikemilîne. Di navbera civakê û wêjeyê de her dem têkiliyekî dualî heye.

wêjevnên ji nava civakê derdikeve û berhemên xwe mîna konekî li ser sînga civakê divede. Berhemên wêjevnên, ango wêje ruh dide civaka ku tê de dijî, hişê/bîra wê teze û zelal dike, çêdike û derman dike. Ji bona fêmkirin û lihevkirinê zemîn peyda dike, amade û sererast dike. Li gor pêwîstiyên civakê pêşiya wan ronî dike, ji wan re dibe rêber.

Wêjeya Şoreşê



Elî Roj

Di hemû şoreşên cîhanê de wêjeya şoreşê hatiye tomarkirin û wêjevanên ku rastiya şoreşê bi zimanê xwe vegotine û bi pênûsa xwe xêzkirine, rastiyên şoreşê gihandine roja me ya îro û ji mirovahiyê re kirine mal.

Edebiyat, wêje an jî lîteratûr sê peyvên hemwate ne. Peyva edebiyatê bi Erebî ye, ya „wêje“ bi Kurdî ye, ya „lîteratûr“ jî bi Latînî ye. Edebiyat ji peyva „edeb“ê tê û wateya vê ya ferhengî „zerafet, nazikî û xweşikî“ye. Ereb bi xwe di wateya peyva edebiyatê de mîna disîplîn peyva edebê bikar tînin. Wekî ku dibêjin „el-edeb'ul Kurdî, ango edebiyata Kurdî. Pirhijmara peyva edebê edebiyat e û ji aliyê Kurd, Faris û Tirkan ve tê bikaranîn. Wekî „Edebiyata Kurdî“, „Edebiyatî Farisî“ û „Türk Edebiyatı“. Wêje ji peyva „wutin“ê tê. „Wutin“ di Kurdiya Soranî, Goranî û Zazakî de bi fonetikek nêzî hev beramberî wateya peyva „gotin“ê tê bikaranîn. Peyva lîteratûr di hemû zimanên ewrûpî de bi wateya edebiyatê ye.

Cûre bi cûre bê tarîfkirin jî, wêje ji berhemên nivîskî û devkî re tê gotin û ew jî bi ziman re zexm girêdayi ye. Wêje hêza xwe bikaranîna ziman digire û bi berhemên xwe jî ziman dikemilîne. Ji berhemên ku nivîskî û devkî yên bi hunerî bûyer, raman, hest û xeyalan bi şêweyekî bedew/estetîk pêşkêşî guhdar û xwendevanan dike re tê gotin. Ew berhem mîna helbest, çîrok, roman, destan, zargotin, stran, şano û… hwd derdikevin holê û cîhana nîgaşî ya guhdar û xwendevanan dixemilînin.

Di derheqê wêjeyê de pir tişt hatine gotin û hîn jî ew ê bêne gotin. wêje tê wateya hewldana nêrîneke berfireh û gerdûnî, bilindkirina merhamet û hezkirinê. Di vê dema nûjen de êdî nivîsandin pir hêsan e. Lewma ji bo parastina berhemek wêjeyî

www.arsivenkurdi.org

xwe bi netewa bindeşt bide qebûlkirin, ewqas di tunekirina wê de bi ser dikeve. Bi vî awayî nasnameya netewî tê rakirin û nasnameya netewa serdeşt cihê wê netewê digire. Jixwe ev babet di realîteya gelê Kurd de ya herî pêşveçûna mêtîngeriyê di nav civakê de dide xuyakirin.

Di rewşeke wiha de û di xebata li dijî mêtîngeriyê de huner biçûk nayê dîtin. Her wisa çiqas bisînor be jî, ji bo ku ji hêla hunerî ve nasnameya netewî di hinek aliyan de hebûna xwe bidomîne, ew dikare di tevgerên rizgarî -netewî de jî bibe bingehek ji bo hinek raperîn û serhildanên girîng. Di deştpêkê de bi taybetî di warê xebata çand û hunerî de, alîkariyek berbiçav dide proses û têkoşîna netewî û polîtîkî-leşkerî jî, xebata çand û hunerê bi serê xwe zêde nikare maneyekê bide tevgerê.

Li vir mirov dikare behsa nêzîkbûnên rewşenbîran an jî neteweperestên Kurd ên prîmîtîv bike ku, huner bi vî awayî rast nenirxandine. Xebateke lawaz a çandê, huner û wêjeyê li gel tevgera rizgariye netewî, bi taybetî jî li gel erkên polîtîkî-leşkerî tevlîhev kirine, heya nexweştine erkên xwe di vê hêlê de bibînin û bi xwe ji bo pêşveçûna hunerê jî hewleke wisa nedane xwe, tenê bûne sebebê tevlîheviyekê ku em wê jî dibînin.

Bi pêşveçûna têkoşîna me ya şoreşgerî him fonksîyona hunerê di nav şoreşê de hatiye vekirin û him jî çewtî û nedîtbariya nerînên şaş li ser şoreşê ji gel re hatiye pêşkêşkirin (deşîfrekirin). Çawa ku me giranî û pêdiviyek daye rola hunerê, rexneyên di cih de û bikaranîna hunerê bi awayek oportunîstî jî hatine kirin. Em çiqas rast nêzîkî hunerê bûne, îro di nav şoreşê de têtê dîtin û bi wê re jî derketiye holê. Û hunerê çiqasî bandora xwe li ser xebata polîtîkî-leşkerî hiştibe, ewqas jî huner bi xwe li ser ketiye bin bandora têkoşîna polîtîkî-leşkerî.

Di vê wateyê de bandora hunerê û fonksiyona şoreşgeriya wê, li ser bingeheke rast hatiye danîn. Ji deştpêka vê sedsalê û vir ve heya berî wê jî, pêşveçûna nasnameya netewî ku ji hêla hunerî ve dihate xweştin, tenê bi têkoşîneke polîtîkî-leşkerî hatiye pêkanîn. Lê di kêleka têkoşîna polîtîkî-leşkerî de fonksiyona hunerê ne tenê kêm bûye, beravîjiyê vê îro ev yek hîn zêdetir bûye. Şoreşa Kurdîstan'ê îro di qonaxeke herî girîng a firehbûnê re derbas dibe û hemû gel di nava vî şerî de cih digirin û ew jî bi vê şoreşê kûr dibe, hemû çîn û qadên civakê hildigire nava xwe û pêş ve diçe.

Komên gel bi muzîk, govend û wêneyan xwe bêtir divejînin û hewl didin ku formek baştir ji bo jiyanê pêk bînin. Ango di vê wateyê de, şoreşeke hunerî jî di pratîkê de têtê vejandin. Lê ev yek jî pir diyar e ku, bi wan pêşveçûnan jî em nahêlin huner bi serê xwe bimîne-pêş ve here û bi xeteke rêbaz û hunerî ya kûr pêwîstî heye. Loma ji bo ku ev kêmasiyên heyî ji holê rabikin divê eniyeke hunerê bê pêkanîn, ev yek him pêwîstiyek e, him jî dê bikaribe alîkariyek xurt bide pêşveçûna têkoşîna şoreşgerî.

yek jî, yekser bi şoreşê ve girêdayî ye, bi kiryara hilweşandin û avakirinê ve girêdayî ye û ev jî xaleke pir girîng û bingehîn e. Piştre jî ziman di pîleya duyemîn de tê. Wê pir baş bêt ku em bi zimanê Kurdî rewşa derûniya civaka Kurdî binivîsînin, ku ev yek pêk neyê jî, tu dikarî bi kîjan zimanî din bixwazî binivîsînî. Mînak; tu dikarî bi zimanê Rûsî jî derbirîna wê bikî, dema tu derbirîna realîte û civaka xwe bi vî zimanî dikî, ew dibe bûyera wergerandina realîta rewşa Kurd û ev zimanê Rusî jî, tenê dibe amêrê veguhastina zimanî. Lê niha tiştê herî bo me pêwîst, ew şiyarkirina giyana Kurd ji xewa kûr û tevizî ye...

pêwîstiya me bi fêmkirina rewşa derûnî û civakî ya vî gelî heye. Ku em vê yekê nekin jî, em nikarin wêjeyeke Kurdî biafirînin.

MÊTÎNGERÎ DİJMİNÊ HUNERÊ YE JÎ!

Mêtîngerî di dema serdariya –hakimiyeta- xwe de, ji bo pêkanîna tunekirina hunerê jî, hewlek mezin dide xwe. Bi hemû qirkirinên pêkhatî li Kurdistan'ê heya radeyeke girîng di qirkirina hunerî de jî pêk aniye. Lê ji ber ku têkiliyên hunerê bi giyanê re hene, ew di nav kategoriya ku di jiyanê de cih digire û her wisa, ji ber ku aliyên wê yên giran û manewî hene, bi qasî mercên dîtbarî nayên qirkirin-tunekirin. Ev jî taybetiyeke hunerê ye. Loma mirov dikare fêm bike ku çawa civaka Kurdî û rastiya gelê Kurd bi hunerê hebûna xwe parastine û domandine. Formên folklor û muzîka Kurdî bingeha li serpiya hiştina nasmameya gelê Kurd a netewî ye. Lê gelek çalakiyên hunerê hatine guherandin, asîmîlekirin û bi vî awayî bûye amrazek bikarbirî ji bo hunera netewa serdest.

Desthilatdariya mêtîngerî wisa jî li ser hunerê serdariya xwe pêk tîne. Ev yek jî wisa xwe diyar dike ku berî her tiştî pêşiya vejiyandina hunera gel digirin, diguherînin, ji xwe re dikin mal, dixin rewşeke wisa ku neyê naskirin. Û di pey vê re, hunera netewa xwe ya dagirker, bi hunera gelê bindest didin naskirin, qebûlkirin. Her wisa mêtînger, di hemû saziyên fermî de û bi taybetî bi alîkariya hêza dewletê hewl dide ku, desthilatdariya xwe ya hunerî bixe nav hest û giyana gelê bindest, da pê bide pejirandin ku "ew bi xwe ji netewa serdest e, wek wê ye û nasnameyek wê ya cuda tune!" Ji bo ku dagirkerî vê ramanê di serê wî de hişyar bike û zindî bihêle, serdestî û hakimiyeteke bêsînor daye meşandin.

Di vê hêlê de netewa serdest çiqas pêşveçûnan çêbike û hunera

hisên mirov xweş tên, wek huner têne nirxandin. Dibe ku jiyan bêyî wan jî bimeşe, lê ew ê jiyaneke bêrengîn be. Di her nêrînan de eseh ji hev cudakirina bedewî û kirêtiyê heye. Di hêla giyanî de jî hinek tişt bi mirov xweş tên, hinek jî ne xweş.

Tewrên rast û nerast hene. Civakek û bi wê ve girêdayî, kesek, çiqas bilind bibe û bi pêş ve here (bi taybetî dema behsa çalakiyên hunerî tê kirin), ew ê ewqasî jî di wê hêle de bibe berjewendiya pêşveçûnê. Heger yekî xwediyê giyaneke nedewlemend, di bin bandora muzîkekê, dîmenekê, an jî çalakiyên hunerî yên cur be cur de nemîne û jê fêm neke, wê demê "damarên jiyana wî mirovî hişk bûne" ji ber wê li ser fonksiyona hunerê ya civakî gotûbêj nayê kirin.

Di qonaxa pêşveçûnên civakî de, an jî di dema ku civak ji hêla naverok û ciwaniyê de, ji qonaxekê derbasî yeka din dibe, ev riya pêşveçûnê ku hatiye rûniştandin, ji bo pêşveçûnên civakî yên girîng jî di çalakiyên hunerî de têne dîtin. Qonaxên wisa berî her tiştî di hêla hunerî de bi pêş ve diçin. Û çawa ku pêşveçûnên civakî bandora xwe li ser hunerê dihêlin, huner jî rola xwe di pêşveçûnên civakî de dilîze.

Bi taybetî qonaxên şoreşî ku bi hunerê têne amadekirin, ji bo ku bigihîjin naverokeke xurt û formên bihêz, bandoreke girîng li ser wê dihêlin.

Di vê wateyê de, huner li dijî zehmetiyên jiyanê bêhnkişandinekê pêk tîne. Ango huner rayê hestkirinê dide wî mirovî yê ku giyan lê teng bûye, wî ber bi pêşveçûnê ve dibe û ew bi tiştên heyî û kevn qayil nabe. Qayîlnebûn jî mirov xurtir dike. Mirov bi vî awayî dikare şoreşa hunerî –hunera şoreşî- nas bike.

Dema mirov behsa civak û welatê Kurdistanê dike, di derbarê hunerê de dikare bibêje ku ew jî mîna civakê bi tevayî di bin mercên mêtingerî û feodal de gihîştiye rewşeke ku nikare bêhna xwe bikişîne û xwe pêş ve bibe. Vê rewşê ji xwe bandorek pir nedîtbar (negatîf) li ser hunerê jî hiştiye.

Beşa tiştê girîngtirîn li vir ew e: Her çiqas demekê gel di avakirina saziyên sergehî de, di têkiliyan û di xwe hêzkirinê de zor û cefa didît û hatibû ber tunekirinê, tenê bi hunerê – bisînor be jî- karibû xwe bidana jiyandin.

Nasnameya xwe jî tenê bi hunerê berdewam kiriye. Ev yek jî, hêza hunerê radike ber çavan. Dibe ku huner taybetiyeke civakî ya wisa ye ku, heya dawiyê li ber xwe bide û di dawiyê de jî wenda dibe.

ZİMANÊ ŞOREŞÊ: WÊJE YE

Tiştê li vir dixwazim bibêjim, tiştê ez dikim karekî wêjeyî ye, lê belê bê zimanekî wêjeyî ye. Ji bo fêmkirina wêjeya Kurdî, pêwîst e mirov di destpêkê de, avahiya civaka Kurdî fêm bike, lêkolîn bike û têbigihîje. Berî em têkevin cîhana ziman, pêwîstiya me bi fêmkirina rewşa derûnî û civakî ya vî gelî heye. Ku em vê yekê nekin jî, em nikarin wêjeyeke Kurdî biafirînin. Ev

hê jî di nava hinek civakan de bihêz in, esasê wê vê demê tîne ziman. Lihevdanên eşîran yên bê dawî, qehremantiya li hember hêrîşên ji derve tên, berxwedan û hêrîşên li hember, di dîroka her gelî de, cîhekî girîng digirin. Ji nirxên bingeha şaristaniyê, mûzîk û helbest jî, dîsa bingeha vê sepandina di dema me de ne. Çespandina (îspatkirin) van mijaran ne zor e. Weke ku awaz, stran û dîlok gihane miqam û amûrên xwe, ev hezaran sal in ku bandorê li pêvajoyên vê dawiyê dike.

Dema helbesta di BZ salên 1000an de, temsîl dike. Di vê dema dîrokê de, li Hindistanê «Vedayan», li ëran û Medya «Aveste», li Mezopotamya destana afirandinê ya Babîl «Enûma Elîş» li Kenan «Yahova, Elohîm» bi gotineke din «Tewrat» bi vegotinên nivîskî û devkî, demxeya xwe li van salan dixin. Zimanê hemûyan zimanê helbestê ye. Ev destanên damezrandina konfederasyonên qebîle, eşîran û yên xanedanan tînin holê. Em dikarin bibêjin ev destanên qehremaniyê ne. Ev vîn û daxwazên çînên bilind û kesan ku xwe nîv xweda dibînin diyar dikin.

HUNER Û WÊJE, PÊWÎSTİYÊN GİYANÎ YÊN MİROV İN!

Şoreşa ku di sergehê ((polîtîka, exlaq, kultûr) de dest pê dike, dibe bingeha guherandinan, geş dibe, bi pêş ve diçe û li ser her hêlan dibe xwedî bandor. Li vir pirsa girîng a ku pêwîst e em bersivekê jê re bibînin, ev e: fonksiyona wêjeyê çi ye? An jî bi tomerî fonksiyona huner û wêjeyê, bi taybetî jî ya romanê wek beşa wêjeyê ya herî girîng di warê şoreşê de çi ye? Pêwîst e ku em bersiva vê pirsê bidin. Bêyî hebûna huner, mirov nikare behsa hebûna civakê bike. Carna mirov bi taybetî bi nêzîkbûnên zanistî û polîtîk li hember xweristê nikaribûye tam bigihîje çareserkirinekê. Her wisa bi riya xwe têrkirina madî jî, dema ku wî nikaribûye giyana xwe têr bike, ji bo xwe bi awayekî din realîze bike an jî têr bike berê xwe daye aliyê hunerê. Jixwe huner di vê maneyê de, pêkanîna pêwîstiyên giyanî bingeh digire. Pêwendiya vê yekê bêguman bi hesîn û bîra mirov re heye. Lê mirov bi hêsanî dikare bibêje ku, huner aliyekî taybetî tîne ziman.

Daxwazên giyanî ku bi rengên curbecure xwe didin xuyandin, wek berhemên hunerî derdikevin holê û razîbûneke manewî pêk tînin. Berhemên sîstema heyî jî carna bandora xwe li ser berheman dihêlin. Her wisa jî pêwendiyên nêzîk di navbera pêşveçûna siyasî û hunerê de hene. Lê ji van hemû berheman re jî huner nayê gotin. Ji aliyekî din ve mirov dikare behsa rola hunerê li ser aboriyê û siyasetê jî bike. Ji xwe di derbarê hunerê de, nêzîkbûna her îdeolojiyê heye. Huner bi xwe pêwîstiyek e, çalak e, ku dest jê nayê berdan û bi vî awayî jî tê hezkirin û vejandin.

Mirov dikare bibêje ku jiyan, li gorî pêwîstiyên mirovan formê distîne, dengekî xweş, dîmeneke ku rind tê ber çavan, çîrokek, an jî helbestek, ku li

Di berbanga mirovatiyê de Zayîna wêje û hunerê!

Şoreşa ku di sergehê (polîtîka, exlaq, kultûr) de dest pê dike, dibe bingeha guherandinan, geş dibe, bi pêş ve diçe û li ser her hêlan dibe xwedî bandor.



Abdullah Ocalan

Çiqas ku raman û organên deng pêşve biçin jî, heta ku neyên rewşa heyîna civakî, yê bêkêr bimînin û ji prîmateke pêşveçûyî zêdetir, derbasî wî alî nabin. Derbasbûyina zimên ya ji raman û dengan, bi mîsogerî bi jiyana civakî pêşvediçe û qevastinên wesifdar pêktîne. Di vî warî de, tişta ku bûye nesîbê bavikên (klan) ku şêweya civakê yên herî teng in, Çend nîgaş (îmge) yên bisînor û anîna van ya zimên bi şêweya jest, mîmîk û işaretan e. Şêweya ziman ya pêşî bi işaretan e. Hê gelekî dûr e ku jest û mîmîk derbasî sazûmaniya deng ya di rewşa peyvan de bibe. Ev tê zanîn, çiqas ku hêz û jênegeriya jiyana civakî xwe dide çespandin û çiqas ku pratîkbûn di mejî de vedide, Ji ramanê ber bi zimên ve pêşveçûnek bilez dibe. Ev pêşveçûn di dîroka mirovatiyê de, şoreşa herî mezin û ya yekemîn e.

«Heyîna çandî» ya berhema pêşveçûnên civakî ku em dikarin bibêjin hemû tişt e, piştî çêbûnên fîzîk, rîwek û cîhana ajalan, weke çêbûneke çaremîn çiqas ku mîsogerî bi dest xist, ji bo raman û ziman mîna zemîneke daringî, dibe bingeh.

Dema berxwedana eşîran û şaristanîbûnê, dikare were nirxandin ku hişmendiya eşîrtî gelekî pêşvediçe, şertek ji yê jiyanê ew e ku her kes xwe ji eşîrê dihesibîne û «serdema destanî helbestkî» ye. Ravekirina «destan û çîrok» yên bi zimanê helbestî ku

Pêşekî

Şermola...
Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Desteya sernivîskariyê

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî, herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir. Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike.

Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat. Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

Kovar di nava xwe de mijarên wêjeyî û rewşenbîrî bi herdu zimanên Kurdî û Erebî hembêz dike û gelek beşên wê hene wekî (dosyaya hejmarê, lêkolîn, hevdîtina hejmarê, jin û rewşenbîrî, pirtûk (xwendin û weşandin, werger, huner, şano, muzîk, şêwekarî, fotografîk, çîrok, helbest, mijarên serbest, gotar û raporên wêjeyî û çandî) û her beşek ji wan têkildarî cureyeke wêjeyê destnîşankirî ye .

Di hejmara yekemîn ya kovarê de dosyaya hejmarê (wêjeya şoreşê) gengeşe dike ji ber ev mijar xwedî bandoreke mezin e û bi taybet ji ber ku em şoreşekê di her warî de li Bakur û Rojhilatê Sûryê jiyan dikin, her wisa hejmar gelek lêkolîn, mijar û berhemên wêjeyî yên cîyawaz dihewîne.

www.serxwebunakurdi.org

• **werger** .....
- Têkoşerek - Mihemed Seyîd Alrîhanî.. (Ibrahîm Xelîl) 58
- Gurekî xwevedayî-Ebbas Kiyarustemî.. (Qadir Egîd) 59

• **Huner** .....
- Şano û desthilatdarî.. (Abdulrehman Îbrahîm) 61
- Stranên kurdî-Pêşkevin/ Mihemed Şêxo 63
- Stranên kurdî-Şev çû/ Aram Tîgran 64

• **Çîrok** .....
- Şivano.. (Ciwanê Abdal) 65
- Êşa sekeratê / Werger Fehîma Deştan.. (Fexredîn Ismaîl) 68

• **Helbest** .....
- zivistana 2012 an.. (Ciwanê Qado) 71
- Gul.. (Qasimê Xelîlî) 72
- Babelîskeke xeydok.. (Fatma Sîdo) 73
- Efrîn… A dinî rojê..!!!.. (Kemal Necim) 74
- Gazin nema ji kesî dibe.. (Fîxan Hîmo) 76

• **Serbest** .....
- Xwendin hunera guhdarkirinê ye.. (Melek Demîrtaş) 77
- Gundê Dêrûna Qulinga.. (Şerîf Mihemed – Welîd Bekir) 80
- Kevintirîn cihê dîrokî li herêma Cizîrê nas bike.. (Dilyar Cezîrî) 82
- Rewşenbîrê kurd Cemal Nebez (1933 – 2018) Z .. (Desteya sernivîskariyê)....86
- Şewata dil.. (Ciwanê Dêrikê)..... 89

• **Tabloyên hunerî** 91

www.arsivakurdi.org

Naveroka Hejmarê

• **Pêşekî** .....
- Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e.. (Desteya sernivîskariyê)..... 4

• **Analîzên hizrî** .....
- Di berbanga mirovatiyê de Zayîna wêje û hunerê!.. (Abdullah Ocalan) 5

• **Dosyaya hejmarê** .....
- Wêjeya şoreşê.. (Elî Roj) 10
- Di warê jiyanê de girîngiya wêjeyê.. (Dildar Şeko) 19
- Armanca wêjeyê.. (Peyman Bêrî) 24

• **Lêkolîn** .....
- Dr. Nûreddîn Zaza- Nerînek rexnesazî.. (Xalis Misewer) 27
- Çirûskin li ser dewletên kurdî di dîroka kevnar de.. (Biradostê Mîtanî) 33
- Çîroka sê cengên giran li ser xaka kurdistanêWêjeya şoreşê.. (Abbas Ismaîl) ..41

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
- Hevpeyvîn li gel şanoger û helbestnivîs Beşîrê Mele Newaf.. (Aram Hesen) .. 47

• **Jin û çand** .....
- Jin û wêje.. (Botan Ednan Hoşê) 52

• **Pirtûkên derketî** .....
- Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskariyê) 54

www.arsivakurdi.org

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye

www.arsivakurdi.org

Rêveberîya Kovarê

Srenivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Desteya sernivîskariyê:
Aram Hesen
Ehmed Alûsiv
Ûsama Ehmed
Xebat Findî

Sernivîskarî û sererastkirina beşê Kurdî:
Aram Hesen

Derhêner:
Dîlan Ehmed

Arşîv:
Şêrîn Heso

E-mail:
shermola2018@gmail.com

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk)-hejmara weşanê (ya rojname û kovaran)-dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye Hejmara: 1 Zivistana 2019

Dosyaya hejmarê

Wêjeya Şoreşê



Hevpîvîna hejmarê ligel şanoger û helbestnivîs Beşîrê Mele Newaf e

Dr. Nûreddîn Zaza- Nerînek rexnesazî

Xwendin hunera guhdarkirinê ye

www.arsivkurdi.org